

I

# AFORÎZMAYÊN FEYLESOFAN
# GOTIBÛN KU...

## ALÎ GURDILÎ

Berg: Benjamin Yeager

***Ali Gurdilî**, civaknasekî kurd e. Di sala 1966 an de li bajarê Sêrtê, li navçeya Gurdilan/Misircê hatiye dinyayê. Piştî ku di sala 1980 an bi hemû malbata xwe re koçê bajarê Îzmîrê dibe, dikeve Zaningeha Ege, beşa civaknasiyê û piştî çend salan zaningehê diqedîne. Nêzîkî pazdeh sal in hewl dide da ku di hindek warên zanistî û felsefî de bixebite.*

*Heta niha gelek gotarên wî ên zanistî û felsefî di kovarên wek Kovara W, Tîroj, Felsefevan, Xwenas û Ajda de hatine çapkirin. Niha li Tirkiyeyê dijî, mamostetiya beşa felsefeyê dike û bavê du zaroka ye. Xwedî û berpirsiyarê malpera felsefeyê ya www.felsefevan.org ê û xwedî û edîtorê Kovara Felsefevan e.*

*Berhemên wî yên ku heta niha hatine weşandin.*

***1-** Dengê Felsefeyê - Weşanên Doz - Rêbendan 2006*

***2-** Rewîtiyeke Zanistî - Weşanên Doz - Gulan 2007*

***3-** Jiyan û Felsefeya Mensûrê Hallac 'Enel Heq'-Weşanên Evrensel. Stenbol 2015*

***4-** Destpêka Felsefeyê- Weşanên Soran. 2015*

***5-** Antolojiya Feylesofan. Alî Gurdilî. Weşanên Soran. 2015*

* ‘Ji bo ku şaristaniya me hilneweşe, divê em li ber desthilatdaran serê xwe netewînin û rê nedin vê yekê.’
**(Karl Popper)**

* ‘Heta ku mirov ji dojeha bextreşiyê derbas nebin, ew nikarin xwe bigihînin bihûşta bextewariyê.’
**(Sadiyê Şîrazî)**

* ‘Du texlîd mirov hene: mirovên ku ji bo pereyan dixebitin û mirovên ku pereyên xwe didin xebitandin.’
**(Paul Auster)**

* ‘Hebûnatî, herfek e û tu, wateya wê herfê yî.’
**(Îbnî Arabî)**

* ‘Bi jinekê re hûn dikarin sê tiştan bikin; yan hûn ê jê hez bikin, yan hûn ê ji ber rûyê wê êşê bikşînin, yan jî hûn ê wê binivîsînin.’
**(Justîne)**

* ‘Jenosîd, ne tenê kuştina mirova ye. Rapêçkirina mafên wekî ziman û kulturê jî, jenosîd e.’
**(Civaknas Dr. Ismaîl Beşikçî)**

* ‘Ji bo mirovên ku bixwazin bibînin têra xwe ronahî û ji bo mirovên ku naxwazin bibînin jî, têra xwe tarîtî heye.’
**(Blaise Pascal)**

* ‘Nezan dizê aqil e, bi dizîna fikran dijî.’
**(Mêrxas)**

* ‘Rûyê dijmin, gelek in.
Lê yek navekî wî heye, kapîtalîzm.’
**(Subcomandante Marcos)**

* ‘Hînbûniyên me, lewneke cihêreng ê koletiyê ne.’
**(Montaigne)**

* ‘Li hemberî dijminekî çek a herî baş, dîsa dijminek e.’
**(Nietzsche)**

* ‘Gelek mirov li jiyanê mêze dikin, lê nikarin jiyanê bijîn.
Tiştê ku ew dibînin, siya jiyanê ye.’
**(Emma Goldman)**

* ‘Ramana mirov,
beriya her tiştî bêrîkirina mirov a jiyanê ye.’
**(Albert Camus)**

* ‘Belê, niha piraniya mirovan di rewşeke reben de ne. Çimku, her roj di nav girseyên mezin de tenêtiya wan zêdetir dibe.’
**(Franz Kafka)**

* ‘Civakek dema ku endamê xwe yê herî bêhêz bi tenê dihêle, wê demê belavbûna wê civakê dest pê dike.’
**(Amin Maalouf)**

* ‘Ji bo kişandina êşan,
ji mirinê zêdetir pêdivî bi wêrekiyê heye.’
**(Napolyon)**

* ‘Dema ku tu ji dil biaxivî, pêdivî bi ziman tune. Bişopîne û lê çavdêr be. Bihêle bila dil, hestên te bikargerîne.’
**(Osho)**

* ‘Di veşargeha canê min de tu canek bûyî, ku ne xwîn evîna me dixuriciya şevê.’
**(Ahmed Arîf)**

* ‘Gundî û dewlemend, weke av û qetranê ne. Nikarin werin cem hevdu, herdem yek ê din diqewirîne.’
**(Maksîm Gorkî)**

* ‘Berhema herî ader ya Xwedê,
miroveke xwedînamûs e.’
**(Alexander Pope)**

* ‘Mirovên ku weke afirander têne qebûlkirin, gelek kêm in. Çend wênesaz û helbestvan. Di mîlyonekî de, mirovek. Ev nêrîneke tewşo mevşo ye. Her mirov, ji zayîna xwe ve afirander e. Heke tu zarokan bişopînî, dê tu bibînî ku hemû zarok afirander in.’
**(Osho)**

* ‘Tu dixwazî ku jiyaneka te ya hêsan hebe?
Nexwe, di nav garanê de bimîne û ji bo hezkirina garanê xwe ji bîr bike.’
**(Friedrich Nietzsche)**

* ‘Evîn, dûrahiyê napejirîne. Ger bi hezar kîometreyan jî ji me dûr be, tê û me radipêçe.’
**(Kazim Koyuncu)**

* ‘Heke tu bixwazî pêdeçûna jiyanê biguherînî, wê demê ramanên xwe biguherîne.’
**(William Shakespeare| 1564-1616)**

* ‘Di destpêkê de bala xwe nadin we û li ber çavên wan, hûn ne ti tişt in. Piştra, bi we dikenin û we dihezidin.
Di dawiyê de jî, têk diçin.’
**(Mohandas Karamçand Gandi| 1869-1948)**

* ‘Felsefe, baweriya hezkirina heqîqetê ye û hêza aqil e.’
**(Georg Wilhelm Friedrich Hegel|1770-1831)**

* ‘Ramanên te çî bin, jiyana te jî ew e.’
**(Shakespeare)**

* ‘Erdem, tekane rêya bextewariyê ye. Mirovên ku koleyên navajoya xwe ne, ew encax dikarin bigihêjine xweşiyên demdemî. Dawiya vê yekê jî, êş û kerx e.’
**(Renê Descartes| 1596-1650)**

* ‘Bextreşiya herî mezin ne ew e ku mirov neyê hezkirin, heznekirin e.’
**(Albert Camus|1913-1960)**

* ‘Huner, çîrokkirina rastiyê ye û xwediyê sê bandora ye; dilgeş, perwerde û zelal dike.’
**(Arîstoteles| B.Z.384-322)**

* ‘Heke derdekî te hebe, ji xwe re li dermanekî bigere. Heke tu nikaribî dermanê derdê xwe peyda bikî, wê demê derdê xwe ji xwe re neke derd.’
**(Gautama Buddha)**

* ‘Di jiyanê de, ji ti tiştî netirsin. Bi tenê, hewl bidin ku hûn hemû tiştî fêhm bikin.’
**(Marie Curie| 1867-1934)**

* ‘Dijminên herî mezin yên pêşveçûn û berfirehbûnê, hînbûniyên me ne.’
**(Jose Martî| 1853-1895)**

* ‘Edalet, dişibe trêneke ku herdem dereng dimîne!’
**(Yevgeni Aleksandroviç Yevtuşenko)**

* ‘Mirovên xweperest, ji ti kesan hez nakin.
Çimku, ji xwe hez nakin!’
**(Erich Fromm-psîkanalîst û civaknas| 1900-1980)**

* ‘Pêdiviya hemû mirovan, bi bîranînan heye. Çimku bi xêra wan, em xwe bêkes û bêqîmet hîs nakin.’
**(Saul Bellow| 1915-2005)**

* ‘Cihê ku edalet lê serwer be, ji çekan re cih tune!’
**(Jacques Amyot)**

* ‘Berê, haletên îşkenceyê hebûn.
Lê a niha, êdî rojname hene.’
**(Oscar Wilde| 1854-1900)**

* ‘Hêz ne ji qapasîteya fizikî,
ji îradeya ku serî natewîne tê.’
**(Mohandas Karamçand Gandi| 1869-1948)**

* ‘Hemû mirov dikarin çewtiyan bikin, lê bi tenê mirovên gewre têdigihêjine çewtiyên xwe.’
**(August von Kotzebue| 1761-1819)**

* ‘Ji rabirdûyê zêdetir, divê em li ser siberojê bifikirin. Çimku ji niha û pêve, em ê li wir bijîn.’
**(Sir Thomas Browne| 1605-1682)**

* ‘Avakirina dewletê, hewcedariyeka jiyana civakî ye û ji bo mirov zarorî ye. Mirov bi afîrina xwe, bi aqil û hêza xwe meyla wan li ser qenciyê ne. Mirov bi hêzên heywanî yên ku bi wî re ne, meyla xwe didin ser xirabiyê. Lê ji ber ku mirov mirov e, bêtir meyla wî li ser qencî û xêrê ye. Ji ber vê yekê: dewlet avakirin û bi siyasetê re bilîbûna wî ji mirobûna wî tê.’
**(Îbnî Haldûn| 1332-1406)**

* **‘**Bi tenê du tişt bêdawî ne, gerdûn û ehmeqiya mirovan. Lê, ez ji ya yekemîn hewqas jî ne piştrast im.’
**(Albert Einstein)**

* ‘Bi tenê heyîn, ji bo xwe heyîneke bivênevê ye. Çimkî, di navbera heyîn û tuneyiyê de, bi awayekî din çênabe. Yek ji wan, bi yekê din re nayê wesfandin. Heyînatî, qet nabe tuneyî. Ev tişt bêderfet û der aqil e. Weke vê yekê tiştê ku tune nin jî, nabin heyîn. Tişteke bivênevê jî, bi awayekî taybetî ne pêkan e. Lewra heke wiha be, wê demê dê hebûna xwe jî ji heyînekê cuda werbigire, dê li derveyê wî winda bibe û dê heyîna wî, bi tinebûnê were wesfandin. Belam, ev tişt jî ne pêkan e. Bi tenê heyîn heye û ev yek, bivênevê ye ku hemû tiştên din jê hene.
Ev heyîn jî, Xwedê ye. Di hemû heyînan de yên ku xwiya dike Xwedê ye û yên disalixîne jî ew e. Ji Xwedê pêve Xwedê tune û di gerdûnê de, ji bilî Xwedê, ti tişt tune.’
**(Şêx Bedredîn| 1358-1417)**

* ‘Bodek nizanin ku nîvê min, pirtir e ji yekkeriya min.’
**(Hesîodos| B.Z.Sedsala 7an)**

* ‘Ax, mîna mirovan tişteke berdemî xwedî nake.’
**(Homeros| B.Z. Sedsala 8an)**

* ‘Min xwest li ser pelan şer binivîsînim, bi miraza ku dê di payîzê de biweşin. Min xwest xezebê li ser ewran binivîsînim, bi miraza ku dê baran bibare û ewr nemînin. Min xwest ez kerxê li ser berfê binivîsînim, bi miraza ku dê roj derkeve û berfê bihelîne.
Û min xwest, dostaniyê û evînê, li ser dilên hemû zarokên berhembêz binivîsînim, bi miraza ku dê bi wan re mezin bibe û xwe li hemû dinyayê rapêçe.’
**(Yilmaz Guney)**

* ‘Tu dibêjî ez ji baranê hez dikim, dema baran dibare tu sîwana xwe vedikî. Tu dibêjî ez ji rojê hez dikim, dema roj dertê tu direvî sîberan. Dema ba radibe tu paceyên mala xwe digirî.  Ez ditirsim: Tu dibêjî <ez ji te jî hez dikim?>’
**(Shakespeare)**

* ‘Dema ez tune me, ev gul tune nin, evîn tune. Lêvên sorê eşqer tune nin, şerabên bêhnxweş tune nin. Sibeh, êvar, coşî û xem, tune nin. Bi fikirîna min re heye dinya, heke ez tune bim ew jî tune.’
**(Omer Xeyam| 1048-1131)**

* ‘Min qebûl e xemr û saqî dêr û zennar û senem. Min nebit seccade û ewrad dîgel seddaneyê. Ger hebîba min cehennem dafit û tu dane bî. Sed qesem dê biçime nêv de ez bi qesda daneyê.’
**(Siyahpûş)**

* ‘Di karekî de rêya serkeftinê; yan divê pêdiviya we pê hebe, yan jî divê hûn evîndarên wî karî bin.’
**(Vittorio Alfieri| 1749-1803)**

* ‘Zeman û sebr, du şervanên herî bihêz in.’
**(Leo Tolstoy)**

* ‘Dinya û axret, berdêlkên hevdu ne. Ji destpêka hemû tiştan re dinya û ji dawiya wan re jî, axret tê gotin. Heçku, herdu jî di vê alemê de çêdibin.’
**(Şêx Bedredîn)**

* ‘Tiştekî ku misoger e, heye. Ji rastbûna tiştekî şikkirin. Şikkirin, fikirîn e. Fikirîn jî, hebûn e. Nexwe, hebûna min bêşik e. Difikirim, nexwe ez he me. Zanayiya yekemîn, ev zanayiya saxlem e. Niha jî ez dikarim hemû zanayiyan, ji vê zanayiyê hilberînim.’
**(Descartes)**

* ‘Eger sed sal di çala de bimînim, her roj sed mar û dûpişka bibînim, zivistana li ser ava sar bimînim, havîna pezê kovî biçerînim, li hevraza berê aşa bikşînim, ne wekî carekî yekî ehmeq bibînim.’
**(Şêx Evdirehmanê Axtepî)**

* ‘Bala xwe baş bidin gotinên xwe, vediguherin ramanan. Bala xwe baş bidin ramanên xwe, vediguherin hestên we. Bala xwe baş bidin hestên xwe, vediguherin tevgerên we. Bala xwe baş bidin tevgerên xwe, vediguherin hînbûniyên we. Bala xwe baş bidin hînbûniyên xwe, vediguherin nirxên we. Bala xwe baş bidin nirxên xwe, vediguherin qerekterê we. Bala xwe baş bidin qerekterê xwe, vediguherin qedera we.’
**(Mahatma Gandhî)**

* ‘Huner, ew derew e ku em pê rastiyan dinasin.’
**(Pablo Picasso | 1881-1973)**

* ‘Heke ji destê we neyê ku hûn bibin têgihiştiyên zanayiyê, nexwe hûn jî bibin şervanên zanayiyê.’
**(Friedrich Nietzsche)**

* ‘Hay ji xwe hebe! Dema tu mezin bibî û bixwazî ku çewtiyên xwe ji holê rakî û xwe bigihînî rastiyan, şoreşa te ya yekemîn; şoreşa naxweyî ye, şoreşa hundirîn e. Belê, şereşa yekemîn û ya herî girîng ev e. Di destpêkê de divê mirov di derheqê xwe de, xwediyê ramaneke be. Heke mirov derheqê xwe de ne xwediyê ramaneke be û ji bo ramaneke din têbikoşe, ev yek tiştekî gelek xeternak e.’
**(Susanna Tamaro)**

* ‘Rêya herî baş ya pêkanîna xewnan,
hişyarbûna ji xewê ye.’
**(S. M. Power)**

* ‘Bismila, berî her tiştî ye. Bi vê yekê re heyîna yekxwedayî û pêxemberiya Muhammed tê pejirandin. Encax di her demê de, di dubarekirinê de ti feyde tune. Lewra, divê ku mirov bi tenê di gotinê de nemîne û nêrîna dilê xwe veke û pêwîst e ku fêm bike, bixwîne û têbigihêjê. Ji sibê heta êvarê di dewsa bismilakişandinê de, xebata dil û eqil, êdî bi wate ye.’
**(Mansûrê Hallacvan| 858-922)**

* ‘Efûkirin û jibîrkirin, heyfhilanîna mirovên qenc e.’
**(Friedrich Schiller)**

* ‘Felsefe çavikeke reş a ar e ku hemû tiştan reş û hêwilnak nîşan dide. Lê îman jî ew çavik e ku hemû tiştî spehî, zelal û nûranî nîşan dide.’
**(Mele Seîdê Kurdî)**

* ‘Heke tu bixwazî ku ramaneke bikujî, wê demê ramanê bi gelek peyvên ku ne pêwîst in şirove bike.’
**(F. A. Clark)**

* ‘Zêhn mîna zeviyê ye, divê were çandin û cotkirin.’
**(Marcus Tullius Cicero)**

* ‘Tiştê ku rih ji toz û tebara jiyana rojane rizgar dike, huner e.’
**(Pablo Picasso)**

* ‘Hemû tişt, diherikin. Ji ber vê yekê jî hûn nikarin du caran xwe di çemeke de bişon. Çimku ava çem diherike û dema ku hûn carekê din bikevinê, çem êdî ne ew çemê berê ye.’
**(Herakleîtos| B.Z. 535-475)**

* ‘Tiştên ku li gor aqil in, ew rasteqîn in.
Tiştên ku rasteqîn in jî, li gor aqil in.’
**(Friedrich Hegel| 1770-1831)**

* ‘Nexweşî, tenduristiyê xweş dike.
Birçîtî, têrbûnê û westîn jî, bêhnvedanê.’
**(Herakleîtos| B.Z. 535-475)**

* ‘Ji ti tiştî natirsim, ji ti tiştî! Ji bilî sînorên evîna te.’
**(Friedrich Schiller| 1759-1805)**

* ‘Evîn, delaliya rih e.’
**(Augustinus)**

* ‘Em bibêjin ku ez di kirinên xwe de serbest im. Ma ez di hilbijartinên xwe de jî serbest im gelo?’
**(Baruch Spînoza| 1632-1677)**

* ‘Karên (şolên) ku alikariya jiyaneke bêazar dikin û xweş in, ew spehî ne. Hemû karên spehî jî baş û bisûd in. Ji ber ku wiha ye, baş xizmeta armanceka kifş dike. Ti kes bi hemdê xwe yan bi dilê xwe, naxwaze ku a xirab e, bike. Lewra, ne li gorî xwezaya mirovî ye ku yên xirab ji yên baş raser bibîne. Ji başiyê cudakirina xirabiyê ya mirov jî, nîşana zanyarî û xwedîerdemiya mirovî ye. Ji xwe, zanayî erdem e û xwedîerdemî jî, zanyarî ye. Ew mirovê ku zanayiyê û riya zanistê bişopîne, dê ew mirov baş û bextewar be. Herweha, yên ku Eudamoniayê jî diafirîne, dilpakîtî (xwedîerdemtî) ye.
Li wê dera ku rêkûpêkî û guncanî heye, li wê derê baş dertê pêşiya mirovan. Lê li wê dera ku tevlîhevî heye, li wê derê jî xirab dertê pêşiya mirovan. Yên ku tiştekê dike baş, rêkûpêkî ye. Heman rewş, ji bo giyana mirovî jî, wiha ye. Giyana mirovî çiqasê bi guncan be, wê mirov jî hewqas bextewar bibe. Mirov, bi bikaranîna aqlê xwe, digihêje guncaniya giyana xwe. Ew <baş> a ku ji zanyariyê tê, mirov bi wê digihêje bextewariyê.’
**(Sokrates)**

* ‘Em hemû, ji xwezayê û di hemû tiştan de hatine afirandin. Çî helen û çî hov.’
**(Antîphon)**

* ‘Pîvana, başî û xirabiyê, feraset e. Li gor xwe tevbigere ku tu hem jî bo xwe û hem jî, bo yên din bikaribi a baş bikî. Heke tu li gor xwe tevbigerî, ev yek hem ji bo te û hem jî bo yên din, baş e.’
**(H. Bergson)**

* ‘Ez Sofîst im û mirovan perwerde dikim. Ev çend sal in ku ez di nava vê hunerê de me. Xorto! Ger tu li cem min bimînî, dê tu ê ji roja ewilî ve bigoherî û wê tu ê baştir bibî. Her roj, wê tu ê baştir bi pêşve biçî. Tiştên ku wê ez ê fêrî we bikim, ev in: Di karên malbatî û dewletê de têgihiştina hêza kargerandinê û di siyasetê de pêdiviyên bihêzbûnê. Ez ji bo yek tiştekî sozê didim ku wê ez ê, mirovên azad bikim mirovên şehraza.’
**(Protagoras| Fîlozofê Antîk Yewnanî ê Sofîst)**

* ‘Zagon û kevneşop qral in, ku bi eşqa dewletê bicîh bûne. Felsefe jî, li dijî zagon û kevneşopan, qesrek e. Xwedê, hemû kesî azad kiriye û xwezayê jî, ti tiştî ne kiriye kole.’
**(Alkîdamas| B.Z.400-320)**

* ‘Li ser babeta derketina holê û windabûnê, dîtinên heleniyan qet ne rast in. Lewra, ti nesne nayên holê û winda jî nabin. Bi tenê, yên hene digihêjin yên din û tevlî wan dibin. Ji ber vê yekê, divê ji xilasbûn û ji windabûnê re bibêjin jihevçûn.’
**(Anaksagoras| B.Z.500-428)**

* ‘Gelî mirovan! Ez wiha difikirim ku hûn ne ji rûyê zagonan, lê ji rûyê xwezayê pismamên hevnîjad in û hemwelatî ne. Lewra yên mîna hev, dişibin hevdu û ji aliyê xwezayê ve hevnîjad in. Zagon jî, bi zordariya xwe û ligel xwezayê, gelek tiştan bi zorê dide kirin.’
**(Hîppîas)**

* ‘Tu tişt tune. Heke hebe jî, meriv tênagihêjê. Heke em têbigihêjinê jî, em nikarin ji ti kesekê re bibêjin û guftegoy bikin.’
**(Gorgîas| Sofîstê Yewnanî)**

* ‘Ehlaq, yek ji wan hêjahiyên herî sereke ye.
Lê ji bo me, ne ji bo xwedê.’
**(Albert Einstein)**

* **‘**Em ketine nav diranên çerxa zayîna bêdawî û mirinê. Jiyana me ya rasteqîn li stêrka ye. Lê me, xwe bi erdê ve girêdaye. Encax bi destşûştinê, bi pakbûnê û bi jiyaneke çîlekêş, em dikarin xwe rizgar bikin û bi vê çerxê, bi coşî xwe bigihînin xwedê.’
**(Orpheus)**

* ‘Bawerî, nexwestina zanîna rastiyê ye.’
**(Friedrich Nietzsche)**

* ‘Evîn, ji bextewariya herî mezin û ji êşa herî giran, hatiye afirandin.’
**(Bailey Tzuke)**

* ‘Xorto wilo bixebite: An bi xwe çêke, an arîkariya ewan bike ko çêbikin, ava dikin. Di dinyayê de tu tişt nîne ko tekûz bit. Di her tiştî de, nemaze di karên nû destpêkirî de, pirî car, kêmanî hene. Heke te kêmanî dîtin, hema dirêjî wan meke. Lê bixebite ko tu bikevî nav wan, arîkariya daniyan bikî û wan kêmaniyan biedilînî. Hilweşandina stûnekê hêsanî ye. Huner di rastkirina stûna xwar de ye.’

**(Celadet Alî Bedir Xan)**

* ‘Ji ezmanan wekî baranê zêr bibarin, dîsa jî têra xwestekên mirovan nakin. Lê mirovên ku bizanibin têrbûn ligel zewqeke biçûk êşeka mezin jî dide meriv, ew zanyar in.’

**(Gautama Buddha| B.Z.563-483)**

* ‘Azadî, ne evîn e. Bi tenê, deriyê evînê ye.’

**(Franz Baader| 1765-1841)**

* ‘Di jiyana mirovan de bextewarî, di zanayî û têgihiştina rast de veşartî ye. Lewra, heke mirovek xwezaya xwe û neqşên ku wî dilivînin baş binase, dê çêtir tevgerên biaqil û zana nîşan bide û dê çêtir bigihêje armanca xwe ya bextewariyê.’

**(Sokrates)**

* ‘Daxwaza razana bi jinekê re, ne guneh e. Tiştê guneh, li dijî vê xwestekê stûxarkirin e.’

**(Petrus Abelardus)**

* ‘Her perçeyekê vê dinyayê, ji bo mirovên me pîroz e. Kulilkên ku li çolwaran dipişkivin, xwehên me ne. Buffalo, xezal û eyloyê mezin jî, birayên me ne. Gelo ma gir û çiya, dilopeka ava çiyayan ku ber bi xwar ve diherike û têna laşê hespeke, ma ne ji heman malbatê ne? Çermspîno! Divê hûn xwe fêrî bêhnkirina bêhna kulilkan bikin û divê hûn bikaribin bêhna baya ku ji kulilkan têhm digre, bistînin. Divê hûn wê bayê weke tişteke pîroz bibînin û biparêzin.’
**(Seattleyê Serokê Çermesoran| 1854)**

* ‘Tenêtiyeke bextewar, ji bextreşiyeke hevpar çêtir e.’
**(Charles Bukowskî)**

* ‘Rêwîtiya rasteqîn ne ew e, ku mirov bi heman çavan welatên cihêreng bibîne. Rêwîtî ew e ku mirov heman welatî, bi çavên cihêreng bibîne.’
**(Marcel Proust)**

* ‘Evîn, deryayek e û jin jî, keviya wê deryayê ne.’
**(Victor Hugo)**

* ‘Ramanên nû, herdem bi şik û nepejirandinan têne pêşwazîkirin. Çimku, ew hê belav nebûne.’
**(John Locke)**

* ‘Ez hemwelatiyekî dinyayê me.’
**(Diogenes| B.Z.412-320)**

* ‘Mirovên ku ne xwediyê ti xeyala ne,
ew nikarin xeyalên we jî bibînin.’
**(John Maxwell Coetze)**

* **‘**Mejiyê miroveke debeng; felsefeyê bi bêmanetiyê, zanistê bi vajbaweriyê û hunerê jî, bi tinazkeriyê şirove dike.’
**(Bernard Shaw)**

* ‘Mirovê bedbîn bi tenê tûnelê dibîne, xweşbîn ronahiya di dawiya tûnelê de dibîne. Belam realîst ligel tûnelê, ronahiyê û trêna ku dê were jî dibîne.’
**(J. Harris)**

* ‘Heta ku kurd, bi kurdî bixwînin û binivîsînin û mesela heta ku berhemên zanyarê xwe ê mezin, berhemên Ehmedê Xanî bixwînin, ew ji holê ranabin.’
**(Wolfgang Gunter Lerch)**

* ‘Hemû taritiyên dinyayê werin cem hevdu, dîsa jî nikarin ronahiya mûmeke vetemirînin.’
**(Robert Alden)**

* ‘Em mêhvanê vê dem û derê ne. Em hatine û em ê herin. Armanca me çavdêrîkirin, fêrbûn, têgihiştin, hezkirin û di dawiyê de, vegera mal e.’
**(Gotineke Aborjînan)**

* ‘Gewceke zana, ji gewceke nezan gewctir e.’
**(Moliere)**

* ‘Hûn yan bêhêvî ne, an jî hêvî hûn in.
Hûn yan bêçare ne, an jî çare hûn in.’
**(Behcet Necatîgil)**

* ‘Ji dijminên xwe hezbikin. Çimku bi tenê ew, kêmasiyên we rasterast ji we re dibêjin.’
**(Benjamin Franklin)**

* ‘Di bin rêveberiyeke ku bi awayekî niheq mirovan hepis dike de, cihê mirovên rastgo girtîgeh e. Îro dewlet cihekî tenê pêşniyarê mirovên qenc û rastgo dike, ku ew jî girtîgeh e. Bi vê rêbazê re dewlet, wan mirovan ji xwe dûr dike û jixwe ev mirov jî, xwe nêzîkê dewletê hîsnakin.
Mirovên wisa difikirin ku, ew mirov ji dewletê dûr in û dengê wan nema dikare dewletê bixe bin bandora xwe, ew şaş in. Çimku, ew nizanin ku rastî ji çewtiyê bihêztir e û mirovên ku zordestî lê hatiye kirin, çuqasî xwediyê qudreteka mezin in.’
**(Henry David Thoreau)**

* ‘Dema ku di derheqê babetekî de hemû pispor li hev werin, dibe ku ev lihevhatina wan fêhmkirinek çewt be.’
**(Bertrand Russell)**

* ‘Heta ku ji destê te were, bibe dostê xelkê.
Lê tî caran, teslîmî kesî nebe!’
**(Gautama Buddha)**

* ‘Mirov hemû xwazginiyê evînê ne.’
**(Ehmedê Xanî)**

* ‘Gotinên Paul yên derheqê Peter de,
ji bilî Peter rê li naskirina Paul jî vedike.’
**(Baruch Spînoza)**

* ‘Hemû zanistên ku hûn wan dixwînin û fêr dibin, afiranderê we nîşanê we didin. Ne mamosteyên xwe, fen û zanistê bişopînin.’
**(Mele Seîdê Kurdî)**

* ‘Heta ku mirovek îdeayê fêr nebe û îdeayê ji tiştên din cuda neke û nikaribe ji yekê din re qise bike û mîna lehengekê ku di şer de ye; xwe ji hemû astengiyan rizgar neke û delîlên xwe, ne li gor tiştên xwiyakirî; belam li gorî yên ku hene ramanên ronahiyê dernexe holê û bi rêyaka eqlî, ji hemû dijwariyan derbas nebe; ew ti caran nagihêje başiyê.’
**(Platon| B.Z.427–347)**

* ‘Jina bextewar ne ew e, ya ku hemû rojên salê bi bîranînên <'8-ê adar>'ekê dijî, lê ya ku di 8-ê adarê de dikare bi çend bîranînên ji rojên din têra xwe dilxweş bibe.’
**(Marîna Siyabend| Rewşenbîr û Nivîskara Kurd)**

* ‘Bi rawestina li keviya deryayê û bi temaşekirina ava wê, hûn nikarin jê derbas bibin.’
**(Rabindranath Tagore)**

* ‘Zarok, bextewariya herî xweşik ya vê dinyayê ne.’
**(Dostoyevskî)**

* ‘Hêvî, xirabiya herî dawî ye.
Lewra, îşkenceyê dirêj dike!’
**(Friedrich Nietzsche)**

* ‘Ger em ji fikirînê şerm nekin, wê demê divê em ti caran ji gotina fikrên xwe jî şerm nekin.’
**(Marcus Tullius Cicero)**

* ‘ji bo biryardayîna derheqê baş û xirab de, ji bilî xweşî û êşê, ji bo me ti pîvanên din tune nin.’
**(Epikuros)**

* ‘Zanist û huner, weke baskên çivîkeke ne. Civakên ku bikaribin wan baskan bi kar bînin, difirin û xwe azad dikin. Yên ku nikarin bifirin jî, dibin mirîşk. Civaka mirîşkî ew civak e, ku qîma xwe bi mistek êm tîne û tênagihêjê ku li paş, hêkên wê têne dizîn.’
**(Charles Darwin)**

* ‘Mirov, ji tiştên xwînşêrîn hezdikin.’
**(Arîstoteles)**

* ‘Xwesteka serweriya mirovan, herdem di bin kirasê rizgarkirina mirovan de xwe vedişêre.’
**(H. L. Mencken)**

* ‘Damezranerê dewletê, mirove herî qencîxwaz e. Çimku yasa tunebe; heywanê herî xirab, bêguman mirov in.’
**(Arîstoteles)**

* ‘Dadgeha ku zimanê min nas neke,
ez jî wê dadgehê nas nakim!’
**(Ali Fikri Işık| Rewşenbîr û Nivîskarê Kurd)**

* ‘Dema ku derewek gelek caran were dubarekirin, wê demê wekî rastiyeke xwiya dike.’
**(Osho)**

* ‘Mirovên biaqil hemû tiştên ku li ser difikirin nabêjin, lê li ser hemû tiştên ku dibêjin difikirin.’
**(Arîstoteles| B.Z.384-322)**

* ‘Mirov pîvana her tiştî ne, tiştên ku hene û yên ku tune nin. Her tişt çawa xwiya bikin, ji bo min ew tişt wiha ne. Ji te çawa xwiya bikin, ew wiha ne. Ji bo yên ku diqufile, hewa serma û ji bo ku yên naqufile jî, hewa ne serma ye.’
**(Protagoras| B.Z.485-420)**

* ‘Rêveberê aqilekî ku nikaribe destnîşan bike
û pêşniyazan bide, gellek in.’
**(Mêrxas)**

* ‘Horî, qesr, çem, dar, mêwe; hemû di xewnan de têtin cîh, ne ku di sehekan de. Cin jî wiha ne û navê wan îspata vê yekê ye. Çimkî, xwe ji sehekan veşartine.
Yên wan dibînin, dibêjin me wan bi çavan dîtiye. Heçkû, ew ne bi çavan lê bi saya xewnan têne dîtin. Lewra, ew ne rasteqîn in.’
**(Ji Berhema Varîdatê a Şêx Bedredîn| 1358–1417)**

* ‘Giyan ji ber ku dişibe heyînên zindebar, ew nemir e. Sebebê vê yekê, ji livdariya giyan dertê. Lewra, hemû heyînên xwedayî, di livdariyeke bêrawest de ne. Heyv, roj, stêrk û hemû ezman.’
**(Alkmeonê Krotonî | B.Z. Sala 500an)**

* ‘Ji bo ku hûn bizanibin ka mirov çi difikirin; ji gotinên wan zêdetir, bala xwe bidin tevgerên wan.’
**(Rene Descartes)**

* ‘Madem ku ev dewlemendî hemû yên te ne, ma tu çima wan bi xwe re nabî dinyeya din?’
**(Franklin)**

* ‘Xemgînî, derman e.’
**(William Cowper)**

* ‘Tekane tiştê ku dê tu caran nemire, raman e.’
**(Meredith)**

* ‘Hêvî, nanê feqîra ye.’
**(Thales)**

* ‘Çivîk, bi çaqên xwe û mirov jî,
bi zimanê xwe, xwe didin dest.’
**(Thomas Fuller)**

* ‘Komar ji dewlemendiyê,
dîktatorî jî ji feqîriyê hildiweşin.’
**(Montesquieu)**

* ‘Baweriya vala, dînê bêaqila ye.’
**(Burke)**

* ‘Li welatekî ku mafdar mehkûm dibin,
cihê hemû rastiyan girtîgeh e.’
**(Thoreau)**

* ‘Pêdiviya mafdariyê, xweseriyeka mirovên ji rêzê ye.’
**(Albert Camus)**

* ‘Bendamahî, dojeh e.’
**(Shakespeare)**

* ‘Mirovên ku ramanên xwe nabêjin, ew kole ne.’
**(Euripides)**

* ‘Roja ku azadî were, wê rojê mirin qedexe ye!’
**(Cemal Sureya)**

* ‘Heta tu nikaribî bi xwe re biaxifî, bi ti kesan re sohbetê neke. Goh, nadin te!’
**(Mêrxas)**

* ‘Ji bo parastina ramanên xwe, divê tu dest bi şerê xwe bikî. Heke ramanên te têk jî biçin, divê rastgotiya te serkeftinê bîqîre.’
**(Friedrich Nietzsche)**

* ‘Mirovên kêm dizanin û kêm difikirin, pirr diaxivin.’
**(Friedrich Nietzsche)**

* ‘Meriv dikare li hemberî hemû êşan, li ber xwe bide. Bes ku nanekî meriv ê xwarinê hebe.’
**(Miguel de Cervantes)**

* ‘Riya herî ewle, hêsan û kurt ya jiyaneke xwedînamûs, weke xwe xwiyakirin e.’
**(Sokrates)**

* ‘Heke tu cihêreng bî, mehkûmê tenêtiyê dibî.’
**(Aldous Huxley)**

* ‘Hêzdariya herî mezin ew e ku meriv,
bi sînorên hêza xwe bizanibe.’
**(Stefan Zweig)**

* ‘Heta ku mirov bizanibin bimirin, azadî ji holê ranabe. Di jiyanê de tiştê ku herî zêde dikare min bextreş bike, hînbûniya min ya lûksê ye.’
**(Charlie Chaplin)**

* ‘Li komareka ku tu kes nikaribe xeber bide, ma meriv dikare bibêje ku serbestî lê heye?’
**(Montesquieu)**

* ‘Dema ku tu çûyî ber deriyekî û te dît ku nifta derî hatiye guhêrandin, hema hêdika ji ber wî deriyî dûr bibe.’
**(Mêrxas)**

* ‘Zarokatî, xewa mantiqê ye.’
**(Rousseau)**

* ‘Miroveke aqilmend, bi ti kesan re nakeve pêşbirkê. Lewma jî, ti kes nikare li hemberî wî/wê bi ser bikeve.’
**(Lao – Tzu)**

* ‘Hinek mirov, bi temamiya gerdûnê dizanin.
Lê mixabin, bi xwe nizanin.’
**(La Fontaine)**

* ‘Xwezî dema borî, ya siberojê ye.’
**(Cuneyt Ozdemir)**

* ‘Têgihiştina mirov ya bi nezaniya xwe,
gavavêtina yekemîn ya zanyariyê ye.’
**(Disraeli)**

* ‘Zanayî, diya hezkirin û zêhnê ye.’
**(Hare)**

* ‘Heke hûn bixwazin ku hemû kes bi awayekî baş behsa we bikin, ji kerema xwe re pesnê xwe nedin.’
**(Pascal)**

* ‘Sê rojname, min ji sed senceqan zêdetir ditirsînin.’
**(Napoleon)**

* ‘Mal û milkên bavê mirov, zû diqedin.’
**(Gotineke Gelêrî)**

* ‘Di cîhanê de tiştê herî dijwar, xwezanîna mirov e.’
**(Thales)**

* ‘Bi rastî jî, em nizanin em ê bibin çi?
Lê em dizanin ku em çi ne?’
**(Shakespeare)**

* ‘Di cîhanê de du rêyên serkeftinê hene; bikaranîna aqilê xwe, yan jî bikaranîna bêaqiliya mirovan.’
**(La Bruyere)**

* ‘Kevirên biyaniyan, tu carî nagihêjine min. Bi tenê, gula dostan min birîndar dike.’
**(Pîr Sultan Abdal)**

* ‘Bala xwe baş bidin kîsoyan.
Ew encax dema ku serê xwe ji qalikên xwe derdixin û xwe dixin bin barê rîskekî, dikarin bi pêş ve herin.’
**(James B. Conont)**

* ‘Heta ku rastî sola xwe dixe lingên xwe,
derew li hemû dinyayê digere.’
**(Mark Twain)**

* ‘Hemû mirov, heman peyvan bi kar tînin.
Lê, ji hevdu fam nakin.’
**(Octavio Paz)**

* ‘Hemû reng, bi heman lezê qirêj dibûn.
Spî, di pêşiya hemûyan de hat.’
**(Ozdemir Asaf)**

* ‘Ez li siberojê nafikirim, çimku ew ji nîşka ve tê.’
**(Albert Einstein)**

* ‘Kesên ku bi zimanê xwe baş nizanibin,
nikarin zimanekî din jî fêr bibin.’
**(Bernard Shaw)**

* ‘Evîn çîroka herî kevnare ye, lê her dem nipînû dimîne.’
**(H. Heine)**

* ‘Em her roj, diguherîn.
Gelo raman û berhemên me, çawa wekî xwe dimînin?’
**(Thomas Carlyle)**

* ‘Çavê evînê, kor e.’
**(Propertius)**

* ‘Dest nedin hêviya mirovan,
dibe ku ew bi tenê xwediyê wê hêviyê bin?’
**(Victor Hugo)**

* ‘Yên ku lehiyên mezin tînin holê, robarên biçûk in.’
**(Shakespeare)**

* ‘Em nikarin siyaset û ehlaqê, ji hevdu cihê bikin. Mirovên ku wan ji hevdu cihê dikin, ew ji herduyan jî tiştekî fam nakin.’
**(John Morley)**

* ‘Mirovên ku ji bextewariya mirovên din xwe bextewar hîs dikin, ew mirovên herî bextewar in.’
**(Goethe)**

* ‘Dema axaftina xwe bizanibe û şîretan nede qralan. Şîretdayîna qralan, xetera herî mezin e.’
**(Herrick)**

* ‘Ne encaman, divê em destpêkê biguherînin.’
**(Alaîn)**

* ‘Dawiya hemû tiştên ku dest pê kirine, tê.’
**(Seneca)**

* ‘Evîn, bextewariyeke bêdawî ye.’
**(George Sand)**

* ‘Mirovên aqilmend beyî ku qirênê bikin, bi ser dikevin. Yên nezan jî, ji bo ku bi ser bikevin qirênê dikin.’
**(Zhuge Liang)**

* ‘Herî zêde, ji xerabiyên ku tu yê bi xwe bikî bitirse!’
**(Pestallozi)**

* ‘Hatina evînê, çûna aqil e.’
**(Antoine Bret)**

* ‘Pirsa dizîkarî an nedizîkariya miroveke,
ji hevalên wê/wî nayê pirsîn.’
**(C. Marlowe)**

* ‘Mirovek dema ku serxweş dibe, yan dibe evîndar an jî li cem xwe, tiştekî veşartî nahêle.’
**(Antiphanes)**

* ‘Heke mirovek xerabiyeke bi te bike, ji bîr bike. Lê heke te xerabiyeke bi yekê kir, ti caran ji bîr neke.’
**(Halil Cibran|1883-1931)**

* ‘Birçîtî, ji şûr jî tûjtir e!’
**(Fletcher)**

* ‘Bingeha pirraniya çewtiyên mezin, şanazî ye.’
**(John Ruskin)**

* ‘Quretî û qelsî, birayên cêwî ne.’
**(Lowell)**

* ‘Di ciwanî û delaliyê de, li aqil negere!’
**(Homeros)**

* ‘Gelî mirovên ku min mehkûmê mirine kirin! Ez dixwazim ji we re behsa siberojê bikim. Lewra, wê di nêzîk de ez ê bimirim. Dema demjmêra mirina mirovan tê, ji wan re hêza gotina siberojê tê bexşkirin. Ji we merkujan re, ez dixwazim vê yekê bibêjim: Piştî mirina min, cezayekê girantir li benda we ye.
Heke hûn bawer dikin ku bi riya kuştinê, hûn ê rê li gotina xirabiyên xwe bigrin, hûn gelekî dixapin. Ev tevgera we, rêbazeke bêşeref e. Riya herî hêsan û ader ne xirabnîşandana mirova ye, xwerastkirin e.’
**(Axaftina Dawî ya Sokrates)**

* ‘Tiştên ku herî zêde zû ziwa dibin, rondik in.’
**(Cicero)**

* ‘Çav ji xwe û guh jî, ji xelkê bawer dikin.’
**(Gotineke Germenan)**

* ‘Di jiyanê de, ciwanî carekê tê serê mirovan.’
**(Longfellow)**

* ‘Hemû cîhan kavil jî bibe,
dê siberoj dîsa jî li cihê xwe raweste.’
**(Bovee)**

* ‘Zargotina kurdî, kaniya edebiyata kurdî ye.’
**(Qanaté Kurdo|1909-1985)**

* ‘Ji şîretan, bi tenê mirovên aqilmend sûd werdigirin.’
**(Syrus)**

* ‘Mirov dikarin ji çewtiyên xwe, gelek tiştan fêr bibin.’
**(Freude)**

* ‘Ji mirovekê re ti caran nebêje here şer, yan jî bizewice.’
**(Gotineke Îspanyolî)**

* ‘Qerfên tûj jî, wekî kêrên tûj;
gelek caran tiliyên xwediyê xwe dibirin.’
**(Arrowsmith)**

* ‘Li hemberî qedera zordest,
serkeftina me ya herî mezin bextewarî ye.’
**(Albert Camus| 1913-1960)**

* ‘Bextewarî, ji bo veguhastinê hatiye afirandin.’
**(Corneille)**

* ‘Her kes, hesinkarê bextewariya xwe ye.’
**(Gotineke Germenan)**

* ‘Xwîna xwînrijan, paqij namîne!’
**(Baraccio)**

* ‘Hemû kes behsa bextewariyê dikin, lê kêm kes pê dizanin.’
**(Madame Roland)**

* ‘Bûyerên xirab, ji sedemên xirab der diçin.’
**(Aristophanes)**

* ‘Ji min re behsa bextewariyeke bikin,
ku ne bi êşê hatibe bi dest xistin?’
**(Margeret Oliphant)**

* ‘Moda tiştekî wisa ar, xirab û jêneger e ku em bêgav dimînin û mehê carekê, wê diguherînin.’
**(Oscar Wilde)**

* ‘Nivîskarî, di roja xwe ya herî baş de jî tenêtî ye.’
**(Hemingway)**

* ‘Jin, weke siya meriv in. Heke hûn bidin dû wan, dê birevin. Birevin, dê ew ê bidin dû we.’
**(Nicolas Chamfort)**

* ‘Xemgîniya jinan, weke bahoza havînê ye.
Dijwar e, lê kêm didome.’
**(Joanna Baillie)**

* ‘Evîna jinan, li ser avê hatiye nivîsandin û baweriyên wan jî, li ser qûmê hatine xêzkirin.’
**(Aytoun)**

* ‘Tevgerîna xwedînamûs, siyaseta herî baş e.’
**(Cervantes)**

* ‘Meriv dikare bi hêsanî xwe berde nav xirabiyan, lê nikare wisa bi hêsanî ji nav wan derkeve.’
**(Mme De Maintenon)**

* ‘Dêşîra huneran, azadî ye.
Heke ew baş nemijin, mezin nabin.’
**(Friedrich Schiller|1759-1805)**

* ‘Du çav, têra mirovên hunermend nakin.’
**(Alphonse de Lamartine)**

* ‘Partiyên siyasî, ramanên birêkûpêk in.’
**(Benjamin Disraeli)**

* ‘Heke hûn bixwazin bizanibin ka pere çiqas biqîymet in, ji xelkê deyn bixwazin.’
**(Franklin D. Roosevelt| 1882-1945)**

* ‘Civaka siyasî ya hemdem, makîneya neşadiyê ye.’
**(Albert Camus)**

* ‘Her partiya siyasî,
di dema daqurtandina derewên xwe de dimre.’
**(John Arbuthnot)**

* ‘Şer, dest ji welatên ku cih tê de girtiye bernade.’
**(Burke)**

* ‘Xirabî, dikare bi ser bikeve.
Belam, ti caran dê raser nebe!’
**(Joseph Roux)**

* ‘Ez ramanên te napejirînim, belam heta ez bimrim ez ê piştgiriya mafê te ê gotinê bikim.’
**(Voltaire)**

* ‘Bi piraxaftinê re, raman dimirin.’
**(Halil Cibran)**

* ‘Mafê hemû mirovan heye, ku ramanên xwe bi awayekî serbest bibêjin û mafê hemû gohdaran jî heye, ku li dij derkevin.’
**(Samuel Johson)**

* ‘Bandêra herî îdeal,
ew bandêr e ku mirov tê de bextewar dijîn.’
**(Albert Camus)**

* ‘Axaftin, rêya fêrbûnê vedike. Lê dibistana dehayê, tenêtî ye.’
**(Edward Gibbon)**

* ‘Mêvan, mêvanan û mazûvan jî, hemûyan naxwaz in.’
**(Gotineke Gelêrî)**

* ‘Mirov dikarin bêheval bijîn, lê nikarin bêcîran bijîn.’
**(Thomas Fuller)**

* ‘Herî zêde yên ku xwe dixapînin, em in.’
**(Robert Fulke Greville)**

* ‘Mêrê ku hemû tiştan ji jina xwe re dibêje,
ew bi tiştekî nizane.’
**(Thomas Fuller)**

* ‘Tiştên ku dinyayê dikargerînin pênûs, hibir û kaxêz in.’
**(James Howell)**

* ‘Pênûs, ji şûr bihêztir e.’
**(Edward Lytton)**

* ‘Sûcê jinan ê herî mezin ew e ku dixwazin bişibin mêran.’
**(Joseph de Maistre)**

* ‘Piraniya jinan, weke wêneyên xwe ne ciwan in.’
**(Max Beerbohm)**

* ‘Heke hûn rê bidin ku aqilê we serwerê we be, wê demê hûn qral in. Na heke we xwe bi destê laşê xwe ve berdabe, wê demê jî hûn kole ne.’
**(Marcus Porcius Cato)**

* ‘Mirovên ku bi şer nizanin, ew ji aştiyê jî fam nakin.’
**(Gotineke Japonan)**

* ‘Mirovên ku nafikirin, hişkebawer in.
Mirovên ku nikarin bifikirin, gewc in û yên ku girîngiyê nadin fikrên xwe, ew jî kole ne.’
**(William Drummond)**

* ‘Bextewariya jiyanê, girêdayê çawaniya ramana ye.
Ji ber vê yekê, bala xwe baş bidê da ku ramanên dijberê dilsafiyê, mejiyê te mijûl nekin.’
**(Marcus Aurelius)**

* ‘Li ser hemû tiştan bifikirin. Lê ne li gor gotegotan; di rastiya xwe de ew çawa bin, wan wiha bifikirin.’
**(George Bernard Shaw)**

* ‘Hûn dikarin alikariya mirovekê bikin, da ku ew zaningehê qezenc bike. Lê hûn nikarin fikirînê fêrî ti kesî bikin.’
**(Henry Frod)**

* ‘Dijminê hunerê, nezanî ye.’
**(Ben Jonson| 1572-1637)**

* ‘Mirovên ku dizanin raman dinyayê diguherîne, bêguman ew mirovên têgihiştî û zana ne.’
**(R. Waldo Emerson)**

* ‘Di dema şer de, dengê zagonan dernakeve.’
**(Marcus Tullius Cicero| B.Z.106-43)**

* ‘Çirûskeke biçûk, dibe sebebê agirên mezin.’
**(Dante Alighieri| 1265-1321)**

* ‘Hemû mirovên dildar, helbestvan in.’
**(Platon| Eflatûn)**

* ‘Ji bo mirovekê xebata herî girîng ew e,
ku li giyana xwe miqate be.’
**(Sokrates| B.Z.469- 399)**

* ‘Hûn nikarin birêveçûna rast, fêrî kevjaleke bikin.’
**(Aristophanes)**

* Heke tu sindanek bî, baş raweste. Na heke tu çakûcek bî, derba xwe di dema rast de lê bide.’
**(George Herbert)**

* ‘Tunebûn, heyîneke mezin e xoşewîstê min,
bes ku were têgihiştin.’
**(Friedrich Wilhelm Nietzsche| 1844-1900)**

* ‘Zewac, wekî kelehekî ye. Yên li derve ne, dixwazin bikevin hûndir û yên ku di hûndir de ne jî, dixwazin birevin derve.’
**(Gotineke Çîniyan)**

* ‘Tiştê herî hêsan, xapandina miroveke xwedînamûs e.’
**(La Fontaine)**

* ‘Telîsa vala, nikare ripîrast raweste.’
**(Benjamin Franklin)**

* ‘Dest ji wan pirsên vala û beradayî yên ku di derheqê destpêk û dawiyê de ne, berdin. Ew pirs, pirsên bêçareser in. Wê ez ê Dharmayê fêrî we bikim. Ji ber ku ev heye, ew/yê din çêdibe. Ji çêbûna wê, ev dertê holê. Heke ew tunebe, ev çênabe. Bi xilasbûna/dawîbûna wê re, ev jî xilas/dawî dibe. Yên Dharmayê dipejirîne, qanûna zayîna hevgirêdayînê jî dipejirîne.’
**(Gautama Buddha| Dialogue or Buddaha)**

* ‘Qûran û felsefe, heman rastiyê vedibêjin û di navbera wan de tu nakokî tune nin.
Sebebê yekemîn yê hemû heyînan xwedayê bêdestpêk û bêdawî ye. Hemû tişt bi îradeya wî çêbûne û wê bi îradeya wî, carekê din ji jolê rabin.’
**(El Kindî| 801-873)**

* ‘Ji ber ku derêaqil e, ez bawer dikim.’
(Credo Quia Absurdum Est.)
**(Tertullianus)**

* ‘Aqil, çavkaniya hemû livbaziya ye. Aqilên sivik, li hawirdor belav dibin û yên giran jî diçin navendê. Ev yek jî, dibe sebebê vegerê. Ev yek lewnek e û him ji bo mirovan û him jî, ji bo heywanan baş e. Ji ber ku mirov xwediyê desta ye, ew raser e.’
**(Anaksagoras)**

* ‘Çar hêman û bingehên ehlaqê hene: hilbijartina rast, sebirkirin, hayjixwebûn û parvekirina bi edalet. Pêkhatina van çar hêman û bingehan jî, rê li erdemîtiyê vedike.’
**(Zenon)**

* ‘Mirov, ji zayîna xwe ve xweperest in û ji bo wan tiştê herî girîng, hesta xweparastinê ye. Pîvana başî û xirabiyê jî, berjewendiyên mirov bi xwe ne.’
**(Thomas Hobbes)**

* ‘Hemû saziyên tehdekar û zordest, di serî de jî dewlet divê ji holê werin rakirin.’
**(Proudhon)**

* ‘Armanca tevgerên ehlaqî, gihêjtin û afirandina mirovên raser e. Divê nirxên ku niha hene ji holê werin rakirin, yan jî ji nû ve werin sererastkirin. Aqil na, lê îrade girîng û raser e. Hêzdarî baş û bêhêzî jî, xirab e. Mirovê raser, remza îradeya hêzdar e.’
**(Nietzsche)**

* ‘Harî ketiye serê hemû dahiyan.’
**(Arîstoteles)**

* ‘Hemû tişt, di halê herk û bûyînekê de ne û bêrawest diguherin.’
**(Herakleîtos)**

* ‘Hê di ber qalû belayê belkî ev alem nebû. Çerx û dewran, dewrî gerdûn, kumbedî mîna nebû. Husnê heq bû îstîwaî lami'a hebû. Erş û kursî hêj di mexfî bûn di kenza qudretê. Husn û hub zatê qedîm in lê cuda bûn ew yek.’
**(Mewlana Melayê Cizîrî| 1567-1640)**

* ‘Meriv encax bi aqilê çalak dikare xwe bigihîne zanayiya başiyê û gihêjtina asta aqilê çalak, baş e. Mirovê baş yan jî bextewar, sirf ji bo wê başiya ku ji bo xwe tê xwestin dijî û vê yekê bi berdewamî didomîne, ye.’
**(Farabî)**

* ‘Heke tu nikaribî hêla bayê biguherînî,
wê demê xêliyên xwe li gor bayê vebike.’
**(Xsentos)**

* ‘Bextewarî, tişteke hûndirî ne. Bextewarî jî ya rih e, bextreşî jî. Rih, rawestgeha bextewarî û bextreşiyê ye. Ne hemû kêfan, lê divê mirov yên li gorî ehlaqê delal in hilbijêrin. Mirov, ji bo ku bikaribin fêhmkoriya xwe biveşêrin, xwe kirine peykerekê çarenûsiyê. Lewra çarenûsî, pirr kêm bi hizirdariyê re şer dike.’
**(Demokrîtos)**

* ‘Di gerdûnê de çawa ku başî û bextewarî heye, wisa jî xirabî heye. Heta ku ji destên meriv bê, divê meriv ji vê dinyayê dûr bibe û bi zanayî û bi erdema xwe, xwe nêzîkê cîhana îdeayan bike. Pêzanîna zanayiya îdeaya başiyê, bi zanîna zagona ehlaqê pêk tê. Ev zagon jî, tiştên divê em nekin û tiştên ku divê em wan pêk bînin, nîşanê me dide.’
**(Platon| Eflatûn)**

* ‘Serkeftina herî mezin ya ku li dinyayê hatiye dîtin, di destpêkê de xeyalek bû. Darçinara herî mezin, tovek û çivîka herî mezin jî, di hêkekê de veşartî bû.’
**(Woody Allen)**

* ‘Bi fikrên mirovên din, xwe li zanyariyê girê nede. Di dewsa vê yekê de, li ser hesabê xwe hema dînîtiyê bike çêtir e.’
**(Friedrich Nietzsche)**

* ‘Mirovên ku dikarin xirabiyê bikin, lê nakin û hemû imrê xwe ji bo pêkhatina rastiyê derbas dikin, ew hêjayê pesinandinê ne.’
**(Platon| B.Z. 427-347)**

* ‘Tu dê jiyaneke sade bijî, sade. Wekî ku dê rojekê dawî li jiyana te were, wisa sade. Bi çay, simîd û penîr re.’
**(Nazim Hikmet Ran)**

* ‘Mirov, ji tiştên xwînşîrîn hez dikin.’
**(Arîsto| B.Z. 384-322)**

* ‘Bi guran re hevaltiyê bike,
lê bila bivir jî di destê te de be.’
**(Gotineke Ûrisan)**

* ‘Welateke ku edalet lê tunebe, weke dinyayeke bêtav e.’
**(Gotineke Gelêrî)**

* ‘Her tişt, girêdayê nêrîna we ye.’
**(Jimmy Powers)**

* ‘Beq wisa dizanin ku asîman, qasî devê bîrê ye.’
**(Gotineke Çîniyan)**

* ‘Tiştên em dibêjin baş in, ji bo gel di zewqê de û ji bo kesên rewşenbîr jî, di ramanê de ne.’
**(Platon| B.Z. 427-347)**

* ‘Dayîna cewher û hilika tiştekî, şirovekirineka sebebên wî tiştî ye. Dema ku em sebebê tişteke fambikin, wê demê ji desta yekemîn zanayiyên me yên rast çêdibin. Dayîna sebebê tiştekê jî, ji hêmana pêşîn dest pê dike û îspatkirina cewher û hilika wî tiştî jî diguncîne. Ji xwe zanist jî, bi kêrî vê yekê tê.’
**(Arîstoteles| B.Z. 384-322)**

* ‘Ti kes bi zanetî gunehan nake. Ji ber vê yekê jî, ji bo ku mirov bikaribin bibin xwedîerdem, pêdivî bi tenê bi zanayiyê heye.’
**(Sokrates| B.Z. 469- 399)**

* ‘Giyan, mîna çav e. Dema wan bireserên ku bi rastî û ronahiyê dibiriqin dibîne, têdigihêje wan û wan fam dike. Lewra, wê demê bi aqil hatiye ronahîkirin. Belam, di şevereşa ku bûyîn û alozî têde desthilatdar e, bi tenê xwediyê baweriyekî ye. Li wê derê dinihêre û disekine. Carina dibe xwediyê wê baweriyê, carina jî dibe xwediyê baweriyeke din. Tu dibê qey, ne xwediyê aqil e.’
**(Platon| B.Z. 427-347)**

* ‘Zilamê bêşuxul, ji xwe vala rûdinê. Zilamê ku ne li gor zîrekî û hunera xwe tê şuxulandin jî, ew jî vala ye.’
**(Sokrates| B.Z. 469- 399)**

* ‘Hêstirên çavan, gotinên bêdeng in
û êşên me vedibêjin.’
**(Voltaire)**

* ‘Aqûbeta mirovên ku bi zaliman re dostaniyê dikin, berbat e.’
**(Gotineke Gelêrî)**

* ‘Evîna rasteqîn, ti caran ne yekaheng e.’
**(Gotineke Gelêrî)**

* ‘Nesîbê roviyeke ku nêçîrê dike,
ji nesîbê şêreke ku radize zêdetir e.’
**(Gotineke Gelêrî)**

* ‘Ya girîng ne dûrahî ye, gavavêtina yekemîn e.’
**(Madame du Deffand)**

* ‘Ger hûn li ser siberoja xwe nefikirin,
dê ti caran siberojeka we tunebe.’
**(Henry Ford)**

* ‘Jiyana mirov, xeyala mirov e.’
**(André Gide)**

* ‘Bêdengî, wehîyeke mezin e.’
**(Lao – Tse)**

* ‘Ger tu bixwazî ku bila tirêjên rojê xwe bigihînin te,
wê demê xwe nede ber siyê.’
**(Konfiçyûs)**

* ‘Mirovên ku nizanibin li vê dinyayê bijîn,
li bihûştê jî nikarin bijîn.’
**(Bektaşî)**

* ‘Li wê dera ku rih bi destan re hevkariyê neke,
hunerweriyek dernakeve holê.’
**(Leonardo Da Vinci)**

* ‘Bi bivir, nede dû mêşa li ser eniya dostên xwe.’
**(Gotineke Çiniyan)**

* ‘Azadî, Wekhevî, Biratî  -  Liberte, Egalite, Froternite.’
**(Şoreşa Fransî)**

* ‘Mirina împaratorekî, divê ku li ser lingan be.’
**(Vespasien | Împaratorê Romayê)**

* ‘Heke tu bixwazî bibî xwediyê çavên delal, bi qencî li mirovan meze bike. Heke tu bixwazî bibî xwediyê poreka delal, bihêle bila zarok destên xwe di nav pora te de bigerînin. Heke tu bixwazî bibî xwediyê laşekê zirav û kubar, xwarina xwe bi mirovên birçî re parve bike. Heke tu bixwazî bibî xwediyê lêvên delal, gotinên xweşik bibêje.’
**(Audrey Hepburn | 1929-1993)**

* ‘Dilsozî û jidilî, bila prensîpên we yên sereke bin.’
**(Konfiçyûs)**

* ‘Brûtûs, ma tu jî? - Et tu, Brute?’
**(Julius Caesar | Sezar)**

* ‘Dinya dîsa jî dizivire! / Epur si Muowe!’
**(Galileo Galilei|1564-1642)**

* ‘Mirove ku di dawiyê de dikene, baş dikene.’
**(Jean - Pierre Claris de Florian)**

* ‘Fikirîn, karekî zor e. Dibe ku ji ber vê yekê, kêm kes difikirin.’
**(Henry Ford)**

* ‘Di çavên ramanê de, ez li hêza xwe rast hatim.’
**(Euripides)**

* ‘Bav û kalê hemû tevgeran, raman e.’
**(Emerson)**

* ‘Bêhna kulîlkeke çi be, şexsiyeta mirovekê jî ew e.’
**(C. W. Shwab)**

* ‘Bi awayekî bêgav, her kes lehengê çîroka xwe ye.’
**(John Barth)**

* ‘Dema hûn ji xwe bawer bikin, dê xelk jî ji we bawer bikin.’
**(Tacitus)**

* ‘Mirov divê ne ji bo armancên pratîk, lêbelê ji bo armancên teorîk li bersiva pirsên xwe bigerin. Ango zanayî, ji bo zanayiyê. Lê mixabin, ji ber ku di nav kurdan de xwendin kêm e, meyl û bala me jî ne li ser felsefeyê û ramana teorîk e. Kê dizane, belkî wextekê me ê vala tune ji bo felsefeyê?’
**(Ali Gurdilî)**

* ‘Bawerî, hêza jiyanê ye.’
**(Lev Tolstoy)**

* ‘Heke di navbera doh û îro de şerek dest pê bike,
dê em ê sibê wenda bikin.’
**(Winston Churchill)**

* ‘Ji bo rabirdûyê rêzdarî, ji bo siberojê jî xebat.’
**(Gotineke Amerîkayiyan)**

* ‘Xweşdîtin, ji xwediyê xwe re çavkaniya jiyanê ye.’
**(Hz. Silêman)**

‘Meriv, ji kesên ditirse hez nake.’
**Arîstoteles**

* ‘Tiştê ku wesfê rastiyê dide tiştên nas û hêza zanînê dide zanyaran, ez ê wê bi îdeaya baş binav bikim. Û hûn dê wisa lê bifikirin, ku ew sebebê zanistê ye.’
**(Platon| B.Z. 427-347)**

* ‘Di jiyana sosyal de hesta herî sûdewar
û gewre, tolerans e.’
**(E. Monnarson)**

* ‘Ji ber ku ez dizanim ez bi tiştekî nizanim, ez ji mirovên din baqiltir im. Em çiqasî zana bin, dê em ê hewçend jî azad bijîn. Hêşînahî, kêmasiyên axê û zimanê şîrîn jî, kêmasiyên mirov vedişêre.’
**(Sokrates| B.Z.469-399)**

* ‘Li cem mirovekê nezan weke pirtûkeke, bêdeng be.’
**(Mewlana Celaledînê Rumî)**

* ‘Jiyan, romana xwedê ye. Dev jê berde, bila binivîsîne.’
**(Isaac Bashevis Singer| 1902-1991)**

* ‘Mirovên ku kêm difikirin, pirr diaxivin.’
**(Gotineke Swisreyiyan)**

* ‘Bêdengiya pisîkê, heta dîtina mişkê ye.’
**(Gotineke Gelêrî)**

* ‘Riweka sebrê tehl e, lê mêweya wê şîrîn e.’
**(Gotineke Germenan)**

* ‘Ew dera ku lê hezkirin hebe, li wê derê tişteke bêîmkan tune.’
**(Gotineke Çermesoran)**

* ‘Yên ku di dilê mirovan de dijîn, ew nemir in.’
**(Thomas Campbell)**

* ‘Neteweyên ku destûrmendên xwe yên xirab, yên ku edaletê binpê dikin ceza nekin, ew ê bi awayekî bêgav hilweşin.’
**(Hz. Muhammed)**

* ‘Sê derdên min hene ku nayên gotin;
yek cihêtî, yek feqîrî û yek jî mirin e.’
**(Karacaoglan)**

* ‘Dema ku dil dipeyîve ziman ne hewce ye, lê mêze bike û bişopîne. Dev jê berde, bila dil bikargerîne.’
**(Osho)**

* ‘Bikaranîna rûpoşan barekî giran e, hem ji bo mirovên ku bikartînin û hem jî, ji bo mirovên ku dixwazin fam bikin.’
**(Dostoyevskî)**

* ‘Ne tirsonek û ne jî agirpare, dê em ê bi tenê wêrek bin.’
**(Arîstoteles| B.Z. 384-322)**

* ‘Divê fîlozof dewletê bixin destê xwe û bibin desthilatdar. Heta ku fîlozof nebin rêveber derdên mirovan naqedin.’
**(Platon| Eflatûn)**

* ‘Heke ez herdem bextewar bim,
ma ez ê wê demê xeyala çi bikim?’
**(Dostoyevskî)**

* ‘Yan rêyeke bibîne, yan rêyeke veke,
yan jî xwe ji ber rê bide alî.’
**(Konfîçyûs)**

* ‘Azadî, ne diyariya medeniyetê ye.
Dema ku medeniyet tunebû, azadiya mirovan zêdetir bû.’
**(Sigmund Freud)**

* ‘Bi wendakirina mafê xwe yê cihêrengbûnê re, em îmtiyaza xwe ya azadiyê jî wenda dikin.’
**(Charles Evans Hughes| 1862-1948)**

* ‘Sê celeb bextiyarî hene. Ya pêşîn, jiyana ku tê de micêz û daxwazên me hene, ye. Ya duyemîn jiyana ku em tê de hemwelatiyeke azad û xwedîberpirsiyar in, e. Ya sêyemîn jî, jiyana ku em tê de dibin lêkolîner û fîlozof e. Şert û mercên bextiyariyê jî, bi hevrebûna van her sê celeban re çêdibe.’
**(Arîstoteles| B.Z. 384-322)**

* ‘Ola fermî ya Tirkiyeyê, durûtî ye.’
**(Murathan Mungan)**

* ‘Hemû mirovên ku êş bûye para wan,
ew êdî ne weke mirovên berê ne.’
**(Cesare Pavese)**

* ‘Mirovên ku ramanên xwe naguherînin, mirî û dîn in.’
**(T. Lowell)**

* ‘Dinya a xwiyakirî, bila bibe zîndana şikeftê û ew agirê ku şikeftê ronahî dike jî, bila bibe ronahiya rojê, ku ew jî li ser rûyê erdê dixe. Ew kaş a ku diçe jor û ew delaliyên ku li jorê têne temaşe kirin jî, di nav dinya a ramanan de, bila bibin hilkişîna giyanê. Mirov, bi hêsanî dikare wî bibîne. Ji bo dîtina wî, divê mirov bizanibe ku li vê dinyayê hemû başî û delalî jê têtin. Fêhmkirina vê yekê, pêwîst e. Li dinya xwiyakirî yên ku ronahiyê diafirîne jî ew e. Mirov encax, piştî dîtina wî dikare di jiyana xwe ya hûndirî û ya derveyî de, aqilmendane tevbigere.’
**(Platon| B.Z. 427-347)**

* ‘Jiyan, mamosteyeke zalim e. Di destpêkê de mirovan ezmûn dike û piştra jî, dersê wan dide wan.’
**(Andre Gide)**

* ‘Meriv ne tenê di dema têkçûnê de,
lê di dema bextewariyê de jî, li dostan digere.’
**(Arîstoteles| B.Z. 384-322)**

* ‘Edalet, pêkanîna karê mirov e. Ji bo pêkanîna edaletê jî, divê mirov karekî amizger pêk bîne û mafê hemû mirovan, bêkêmasî bide wan. Heke mirov bi xwe nizanibe, an xwe nasneke; ango biyaniyê xwe be, gelo wê ew mirov çawa bizanibe ku kîjan kar ji bo wî baş e? Wê çawa karê xwe bêkêmasî pêk bîne? Mirovek heta ku negihêje zanayiya giştî, wê çawa mafê wanên din bide wan? Û wê çawa li ser koma edaleta giştî, tevînekekê (lêzêdekirinekê) lê zêde bike?’
**(Sokrates| B.Z. 469- 399)**

* ‘Wextê çûyîna min hat û bihorî jî. Rêwing, divê di riya xwe de bin. Ez diçim mirinê, lê hûn li jiyanê ne. Xwedê dizane ka kîjan baş e? Lê heke mirov bibêje, 'gelî mirovan bisekinin û li benda bangawaziya Xwedê bin. Çawa dora min hat, dê dora we jî were û heta wê demê jî, jiyana xwe bidomînin' ev gotin, gotinek aqilane û di cîh de ye.’
**(Sokrates| B.Z. 469- 399)**

* ‘Di babeta hilberandina zanayiyê de rêya tekane, ezmûn e. Derheqê xwedê de jî, riya bidestxistina zanayiyan heke yek pirtûka pîroz be, ya din jî vekolandina xwezayê ye. Çimku xweza peyker, sî û dengvedana xwedê ye.’
**(Tommaso Campanella)**

* ‘Heke hedefek tune be, ma tîrvan bi kêrî çi tê?’
**(Deng Ming | Dao)**

* ‘Jîrîtiya mirovan ne ji bersivan, ji pirsan xwe dide der.’
**(Albert Einstein)**

*’Daxwaza laş ya ji bo pêdiviya xwarinê, çavkaniya dilêşiyeke bêdawî ye. Ev daxwaz, li pêşiya lêgerîna heyîna rasteqîn jî, astengek e. Her cûre evîn, daxwaz û tirs; hestên berdemî yên vala ne û bodekiyan dixine dilê me. Herweha, hêza me ya fikirînê jî ji me dûr dixin.
Şer, pevçûn û pevketin, ji kû dizên gelo?
Ji bo pêkanîna daxwaz û xwestekên laş, ji peran tê hezkirin û ji ber van astengiyan, ji bo lêgerîna felsefeyê, demeke me a vala, namîne. Ya herî dawî û xirab jî ew e, ku wextên me yên vala hebin jî, laş dev ji me bernade û qet, me rihet nahêle. Herweha, di lêkolînên me de jî diltengî û serêşiyê dide me û rê, li tevlîheviyan vedike. Em, şaş dibin û rastiyan nabînin. Dema ku em bixwazin bigihêjin zanayiya tiştên rast, berê her tiştî divê em xwe ji daxwazên laş, rizgar bikin. Tîn, divê ji ber xwe ve û ji dilê xwe, têbigihêje hemû tiştan. Hasilê; wateya vê yekê ew e, ku em ê ancax piştî mirinê bigihêjin wê zanayiya ku em dixwazin û jê hez dikin. Lewra, dema ku tîn bi laş re ye û nikaribe bigihêje zanayiyê, wê demê ev tişt encax piştî mirinê gengaz xwiya dike. Herweha, dema ku em ji bodekî û harbûnên laş xwe rizgar bikin, wê demê em ê çêtir fam bikin ku pakijî û zelalî ka çi ye? Wê demê em ê şewqa ronahiyê ku ew jî ji bilî şewqa rastiyê ne tu tişt e, li her derê bibînin û wê em ê pê bizanibin. Zelalî, xilasbûna tîn ya ji laş pêve, çi ye gelo? Ji vê rizgarî û jihevçûnê re, mirin tê gotin. Bi tenê fîlozofên rasteqîn, herdem li mirinê digerin.
**(Platon| B.Z. 427-347)**

* ‘Heke tu bizanibî ji kû derê hatiyî, wê demê tu xwe jî ji bîr nakî. Heke tu bizanibî tu li kû derêyî, wê demê tu yê bi hêla rêya xwe jî bizanibî.’
**(Eddi Anter| Înkar)**

* ‘Çi dibe bila bibe, bizewicin. Heke jina xwe baş be, ji xwe hûn ê bextewar bijîn. Na heke ne baş be, wê demê jî hûn ê bibin feylesof.’
**(Sokrates)**

* ‘Heke armanceka we tunebe,
hûn ê xwe çawa bigihînin ê?’
**(Edward de Bono)**

* ‘Sê rêyên gihêjtina bextewariyê hene;
bi awayekî rast zanîna rastiyê, xwestina rastiyê û devjêberdana xwestekên me yên ku ne pêkan in.’
**(Rene Descartes| 1596-1650)**

* ‘Divê mirov guhên xwe nedin hemû tiştan, divê ew guhên xwe bidine logosê û ji logosê fambikin. Ew mirovên ku ji logosê fam bikin û li aliyê logosê bin, ew mirovên pispor û raser in. Mirov encax bi aqilê gelemper, mezin û gerdûnî dikarin derkevin qata raser û pisporiyê. Herweha, divê mirov xwe bigihînin wî aqilê tevgişt û qanûnên guhêrînê jî fêr bibin. Dê wê demê, mirov jiyana xwe baştir bidomînin. Herweha, divê mirov qanûnên guhêrînê jî bipejirînin û li hemberî wan ranebin. Lewra ew qanûn, logos e.’
**(Herakleîtos| B.Z. 530-475)**

* ‘Em di navbera du bûyeran de ku li pey hev têtin, girêdaniyeke sedemîtiyê ava dikin. Her sibê roj dertê û êvaran jî, diçe ava. Herweha piştî rojê jî, şev tê. Ev yek wiha dike ku em di navbera wan de têkîliyeka sedemîtiyê ava dikin. Lê bingeha sedemîtiya di vir de, bi temamî psîkolojîk e, ji azmayişên me tê û tiştekî ku dotira rojê jî, vê bûyerê sewgiran/garantî bike jî tune.’
**(David Hume| 1711-1776)**

* ‘Bi ehmeqan re nekeve nîqaşê, da ku dema te vala derbas nebe. Çimku li gor baweriya wan yan tu niheq î, yan jî ew heqdar in.’
**(Dale Carreige)**

* ‘Mirovên ku bêrawest li benda pesinandina ne, ew reben in û bextewariya xwe jî, bi destê mirovên din ve berdane.’
**(Jerr Goldsmith)**

* ‘Mirov, ne li dijê we ne. Bi tenê, ew aligirên xwe ne û hew.’
**(Gerald Fowler)**

* ‘Bextewarî, xwepakijkirina rih û ber bi aqil ve, qesidîna mirov e.’
**(Îbnî Sîna)**

* ‘Dema mirov bi çavên xelkê li bextewariyê mêze bike, çi êşeke mezin e newsa?’
**(William Shakespeare)**

* ‘Xwedê ji ber ku hezkar, dildar û evîndar e, gerdûnê afirandiye. Mirovên ku ji mirovan hez nekin, ew nikarin xwe bigihînin Xwedê.’
**(Yunus Emre)**

* ‘Jiyan ne romanek e, zêdetir dişibe kurteçîrokekê. Ji ber vê yekê ne dirêjahî, spehitiya wê girîng e.’
**(Montaigne)**

* ‘Xebatên ku em wan ji bo xwe pêk tînin, ew bi me re dimirin. Lê xebatên ku em wan ji bo mirovên din û piraniya cîhanê pêk tînin, ew xebatên zindebar in.’
**(Dan Brawn)**

* ‘Ziravbihistyariya di gotinan de baweriyê, ya di ramanan de kûrahiyê û ya di hestan de jî, hezkirinê diafirîne.’
**(Lao Tzu)**

* ‘Her pirsgirêka ku di jiyana me de dertê pêşiya me, di hindûrê xwe de diyariyeke vedişêre.’
**(Richard Bach)**

* ‘Nîşana jîrbûnê ne zanayi ye, hêza xeyalê ye.’
**(Einstein)**

* ‘Heke tu bixwazî bi ruhê mirovekê bizanibî,
xeyalên wî/wê jê bipirse.’
**(William James)**

* ‘Tu çiqas bixwînî bixwîne,
heta ku tu weke zanyareke tevnegerî tu nezan î.’
**(Sadiyê Şîrazî)**

* ‘Ji bo mirovan pirs û lêgerîna bersivan, du mijarên jêneger in.’
**(Kant)**

* ‘Dilê nezanan di devê wan de,
devê zanayan jî di dilê wan de ye.’
**(Hz. Elî)**

* ‘Sê tişt hene ku nayên veşartin: Dû, evîn û feqîrî.’
**(Gotineke Ereban)**

* ‘Ferqa di navbera evîna yekemîn û ya dawî de ev e: mirov wiha difikirin ku evina wan a yekemîn ya dawî ye û ya dawî jî, a yekemîn e.’
**(Victor Hugo| 1802-1885)**

* ‘Pêşî, xwe rast bike. Piştre jî mirovekê ku bi saya felsefeyê baş bûye nîşanî xelkê bide. Di nav xelkê de jî bi kesayetiya xwe ya baş, wan rohnî bike. Heke ev yek pêk neyên tu çiqasî pirtûkan binivîsînî binivîsîne, tu ne mirovekê têgihîştî yî.’
**(Epîktetos)**

* ‘Dewlet rêxistina çînên serdest ya pestdan û zorê ye, bi darê zorê tê damezirandin.’
**(V. Ilyiç Lenîn| Dewlet û Şoreş)**

* ‘Her ew ku aşiq e ji can natirse. Aşiq ji zencîr û zîndan natirse. Dilê aşiq weke gurê birçî ye. Ku ew ji heyheya şivan natirse.’
**(Baba Tahirê Hemedanî| 935-1010)**

* ‘Çî ecêb e newsa? Mirov, pirî caran tiştên ku pêdiviya wan pê heye didine xelkê. Mesela, wekî şîretan.’
**(Oscar Wilde| 1854-1900)**

* ‘Evîn, çîroka temamiya jiyana jinekê ye.
Lê ji bo mêran, bi tenê serpêhatiyek e.’
**(Madama de Stae| 1766-1817)**

* ‘Xwedê, li destên têr û tije nanêre. Li destên pakij dinêre.’
**(Publilius Syrus)**

* ‘Felsefe dînitî ye. Li dinyayê çiqas guherîn bûne bi saya serê dînitî û dînan bûye. Felsefe, awir û noqtayî nazara mirov diguherîne, rastî û esliyeta bûyeran diyar dike, dihêle ku mirov şîroveyên xwe yên li ser mirov, jiyan, heywan, hebûn û nebûnê di ber çavê xwe de derbas bike. Heke mirov bikeve navê û jê bitahmije, felsefe jiyan bi xwe ye; yan na, felsefe gotinên pesta û teqlo û beqlo ne.’
**(B. Xelîl Sirûcî)**

* ‘Hez ji yên ku hatine afirandin bike,
ji ber sedema afiraner.’
**(Yunus Emre)**

* ‘Yan weke xwe xwiya bike,
yan jî tu çawa xwiya dikî, wiha be.’
**(Mewlana)**

* ‘Fîlozofan heta niha, dinyayê bi tenê şirove kirine.
Lê pirsgirêk, guhêrandina wê ye.’
**(Karl Marks)**

* ‘Di vê dinyaya beradayî de, bextewariyeke mitleq tune. Her bextewarî di naveroka xwe de jehriyeke dihewîne, an jî bi jehriyeke ku ji derve hatiye tê jehrîkirin.’
**(Anton Çehov| 1860-1904)**

* ‘Divê dewlet bi vê yekê bizanibe; niheqiyeka ku li kurdekê tê kirin wisa dike ku bi sedan mirov ji dewletê nefretê dikin.’
**(Şerafettin Elçi| 1938-2012)**

* ‘Çima em ê li hev neyên û di nav aştiyê de nejîn? Em hemû, li heman stêrkan temaşe dikin, li ser heman rojgerê bi rê ve diçin û di bin heman ezmanê de dijîn.’
**(Aunius Aurelius Simachus)**

* ‘Dema ez tune me, ev gul tune nin, evîn tune. Lêvên sorê eşqer tune nin, şerabên bêhnxweş tune nin. Sibeh, êvar, coşî û xem, tune nin. Bi fikirîna min re heye dinya, ez tune bim ew jî tune.’
**(Omer Xeyam| 1048-1131)**

* ‘Hemî mirov gotina evîn û evîndariya xwe dikin, lê evîna her kesî û kesê yeke bi serê xwe ye.’
**(Shahînê Bekirê Soreklî)**

* ‘Bi tenê made, bi awayekî rasteqîn heye. Gerdûn, ji bilî madeyê ku di nav tevger û guherînê de ye; ne ti tişt e. Made, ji maweyên/pêvajoyên bihevketin û nakokiyan derbas dibe û heyînan tîne holê. Pêşveçûn û berfirehbûna madeyê jî, li gorî hinek zagonên dîyalektîkî dimeşe. Ev zagon, hem zagonên heyînê û hem jî zagonên ramanê ne.’
**(Karl Marks)**

* ‘Ramanên te çi bin, jiyana te jî ew e.’
**(Shakespeare)**

* ‘Nietzsche ramanên wiha pêşkêş dike ku ev ramanên wî di pratîkê de hem xizmeta koleyan û hem jî xizmeta efendî û desthilatdaran dikin. Lêbelê, ji wan ramanan bi tenê efendî sûd werdigrin û meriv dikarê bibêje ku bi tenê bi kêrî wan te.’
**(Georg Lukacs| Fîlozofê Macarî)**

* ‘Vejiyîn, weke dengê guleyeke zû derbas dibe. Gelek dijwar e, ku mirov bikaribe guleyê li hewayê û evînê jî, di dilde bihêle.’
**(Murathan Mungan)**

* ‘Mirovên xirab, tu carî ji xwe heznakin. Mirovên qenc jî, bi awayekî ader dê herdem ji xwe hezbikin.’
**(Arîstoteles)**

* ‘Li hemberî hêjahiyên mîna wekî pîvan, mêrxasî û mezinahiyê, pêwîst e ku yên baş û yên ku ji zayîna xwe ve xirab in, ji hevdu werin cudakirin. Nexwe, mirov û dewlet jî, dema ku li van hêjahiyan bigerin, wê mîna koran xwe bi destê pîçan, dostên xirab û desthilatdarên dewletê yên xirab ve berdin.’
**(Platon| B.Z.427-347)**

* ‘Ji zarokatiya xwe ve em gotinên pêşiyan, yên ku li ser rastiyê û bextemamiyê ne, dizanin. Ev gotinên pêşiyan, mîna dê û bavan, mejiyên me dihecînin û em, fêrî guhdarî û rûmetgirtina wan dibin. Lê, gotinên wan yên ku ne di cîh de ne jî hene, yên ku zewqê didin meriv, yên ku li gorî dilê me ne, yên balkêş! Yên ku hinek jî xwedîaqil bin, guh nadin wan. Mirov, divê guh nedin kesên seypesan; divê ku guh bidin yên ku dişibin dê û bavê meriv.’
**(Platon| B.Z.427-347)**

* ‘Avakirina dewletê, hewcedariyeka jiyana civakî ye û ji bo mirov zarorî ye. Mirov bi afîrina xwe, bi aqil û hêza xwe meyla wan li ser qenciyê ne. Mirov bi hêzên heywanî yên ku bi wî re ne, meyla xwe didin ser xirabiyê. Lê ji ber ku mirov mirov e, bêtir meyla wî li ser qencî û xêrê ye. Ji ber vê yekê: dewlet avakirin û bi siyasetê re bilîbûna wî ji mirobûna wî tê.’
**(Îbnî Haldûn| 1332-1406)**

* ‘Bi awayekî baş, li mîrata bav û kalên xwe xwedî derkevin. Nexwe, ew ê tu carî nebe yên we.’
**(Goethe| 1749-1832)**

* ‘Mirovên ku bi felsefeyê mijûl bibin, pêwîst e ku nekullin. Ango, divê ku di karekî de xebatkar û di ya din de, ne zexel bin. Mirovên wisa hene ku hez ji jîmnastîkê, nêçîrê û her curên xebatê hez dikin. Lê, ji axaftinê û lêkolînê hez nakin û ji karên mejiyê xwe direvin. Ew ê berawajiya vê yekê jî, kullek werin hesibandin.
Mirovên ku dê em ê wan li hemberê rastiyê kullek bihesibînin, ew bi zanetî derewan nakin û vê yekê, xerab dibînin. Ne ji xwe re û ji hinekên din re vê yekê rind nabînin. Belam, dema ku ji nezaniyê derewan bikin jî, dengê xwe qet dernaxin û vê yekê, dipejirînin. Ji nezaniyê naqerixin û mîna berazên di hariyê de, xwe digevizînin û di nav nezaniya xwe de bextewar dijîn.’
**(Platon| B.Z.427-347)**

* ‘Ne aqilekî raser, ne hêza xeyalê û ne jî, herdu bi hevre besî derketina holê ya dahîyekê ne. Hezkirin, hezkirin, hezkirin. Ev yek, dahîtî bi xwe ye.’
**(Wolfgang Amadeus Mozart| 1756-1791)**

* ‘Mirov, ji hevîrê serdema ku têde dijîn çêdibin. Ji nav wan, gelek kêm mirov dikarin xwe ji ramanên serdema xwe yên serwer rizgar bikin û raserî wan bibin.’
**(François Marie Arouet| Voltaire)**

* ‘Beyî bikaranîna jêbirê,
ji hunera resmandina resman re jiyan tê gotin.’
**(J. Caristian)**

* ‘Ji ezmanan weke baranê zêr bibarin, dîsa jî têra xwestekên mirovan nakin. Lê mirovên ku bizanibin têrbûn digel zewqeka biçûk êşeka mezin dide meriv, ew mirovên zanyar in.’
**(Gautama Buddha | B.Z. 563-483)**

* ‘Qeder ne temamiya rêya me, bi tenê çatarêyekê dide me. Rêgeh diyar e, lê hemû fetlonek û terkerê, hilbijartina rêwîng e. Nexwe, tu ne serwerê jiyanêyî û ne jî, bêçare yî.’
**(Elif Şafak)**

* ‘Hay ji xwe hebe. Dema tu mezin bibî û bixwazî ku çewtiyên xwe ji holê rakî û xwe bigihînî rastiyan, şoreşa yekemîn şoreşa navxweyî ye, şoreşa hundirîn e. Belê, şereşa yekemîn û ya herî girîng jî ev e. Di destpêkê de divê meriv derheqê xwe de, xwediyê ramaneke be. Heke meriv derheqê xwe de ne xwediyê ramaneke be û ji bo ramaneke din têbikoşe, ev yek tiştekî gellek xeternak e.’
**(Susanna Tamaro)**

* ‘Ez ne ji veşartina rastiyan hezdikim û jî ji gotina rastiyan ditirsim. Ez li her derê beşdarê şerê ku di navbera ronahî û tariyê de heye, bûm. Ji ber vê yekê, ez li her derê tehde û zordestiyan li min kirin. Ji bilî zordestiya akademîsyênên fermî ku wekî bavê cehaletê ne, ez rastê zordestî û tehdeyên pirraniyê yên serhişk jî hatim.’
**(Giordano Bruno)**

* ‘Mirovên rastgo, herdem zaro dimînin.’
**(Sokrates)**

* ‘Bi dildariyeke mezin û kûr, hezbike.
Dibe ku dilê te bimîne, lê ji bilî vê yekê rêyeka ku mirov bikaribe jiyaneke têr û tije bijî, tune.’
**(Erich Fromm | 1900-1980)**

* ‘Ziman çekek çanda netewî, yê xurt e. Mirov bi zimanekî, ji saya zimanê netewî hevûdu têdigihijin. Ji vê sedemê dagirkerên ku di dîrokê de xwestine neteweyeke ji holê rakin, berî hemû tiştan bi darê zorê pejirandina zimanê xwe girtine pêş.’
**(G. Politzer | 1903-1942)**

* ‘Zewqên dewlemendiyê,
bi hêsîrên belengazan têne kirîn.’
**(T. Fuller 1608-1661)**

* ‘Heke girîna meriv ji dil be,
wê demê divê meriv jê şerm neke.’
**(Can Yucel)**

* ‘Ez dibêjim, ku ez sofîst im û mirovan perwerde dikim. Gelek sal in ku ez di nav hunerê de me. Xorto! Heke tu bi a min bikî û bi min re rabî û rûnî, dê tu ê çêtir fêr bibî. Wê rojên te jî, wiha biborin. Yên ku wê ez ê fêrî te bikim ev in: Di kar û barê malbat û dewletê de têgihiştin. Ango, zanîna îderekirina malbatê û ji bo zanîna siyasetê, perwerdekirin. Tiştê herî giranbiha jî ev e ku dê ez ê wê bidim te: Ez sozê didim te ku wê ez ê te mîna mêran bikim hemwelatiyekî zana.’
**(Protagoras | B.Z.485-420)**

* ‘Mirovên ku ditirsin têbigihêjine tehma jiyanê, ehmeq in.’
**(Albert Camus)**

* ‘Ar e, ku meriv bixwaze xwe delal nîşan bide. Baş e ku meriv xwenşêrîn be, lê xwesteka xwînşêrîniyê ar e. Serkeftina di vî warî de, dûrûtî ye û mirov, bi awayekî xwezayî delal in.’
**(Osho)**

* ‘Sî, hebûna xwe deyndarê ronahiyê ye.
Çimku, ronahî tunebe, ew jî tune.’
**(John Gay)**

* ‘Zêhneka bêazwer, mîna çivîkeke bêbask e.’
**(Salvador Dalî)**

* ‘Mirov di temamiya jiyana xwe de, hemû çewtiyên xwe dicivînin û bi navê qederê cinawireke diafirînin.’
**(John Oliver Hobbes)**

* ‘Hûn dizanin çima gelek dostanî û zewac, piştî demeke têk diçin? Ji hev û du, heznakin û nakevin nav danûstandinên rast û dirist.
Di dewsa vê yekê de jî, li dijê tenêtiyê hevdu weke mertalekî bikartînin. Lewma jî, biser nakevin.’
**(Irvin D. Yalom)**

* ‘Ji bo destpêkirinê û bextewariyê, tu carî ne dereng e.’
**(Jane Fonda)**

* ‘Mêrê ku dersê ehlaqê dide mirovan, pirî caran dûrû ye. Jina ku dersê ehlaqê dide mirovan jî, herdem ar e.’
**(Oscar Wilde)**

* ‘Heke te tiştekî baş fêhm nekiribe, tu nikarî wî tiştî baş bibêjî.’
**(Albert Einstein)**

* ‘Li wê dera ku çewtî hebe, dê herdem xapandin jî hebe.’
**(Platon)**

* ‘Ger hûn bixwazin xirabiyeke mezin bi yekê re bikin, wê demê wî (wê) hêvîdar bikin û piştra jî, dev jê berdin herin.’
**(Elif Şafak)**

* ‘Hezkirin, ne lêgerîna evînê ye. Di zemaneke nediyar de û ji nişka ve, ‘xwedîtina’ di miroveke de ye.’
**(Fyodor Dostoyevskî)**

‘Hevaleke jidil û dilsoz, bedelê deh hezar pismama ye.’
**(Euripides)**

‘Mêrekî baş û jinekê baş, ne bi hevdu re ne. Çimku jin, dibine evîndarê mêrên xirab û derdên xwe jî, ji mêrên baş re dibêjin.’
**(Victor Hugo)**

* ‘Evîneke bextewar tune.’
**(Aragon)**

* ‘Kurd, zarokên îslamê yên sêwî ne.’
**(Alî Şerîatî)**

* ‘Çavkaniya medeniyeta yewnanî,
medeniyeta kurda ye.’
**(Ali Şerîatî)**

* ‘Li welatên ku kapîtalîzm lê serwer e,
li wir bila tu kes behsa hebûna edaletê neke.’
**(Bertolt Brecht)**

* ‘Mirovên ku têr nabin, ew feqîr in. Mirovên ku qîma xwe bi îmkanên xwe tînin, ew dewlemend in.
Mirovên ku yên di destê xwe de parve dikin jî, dewlemendtirîn mirov in.’
**(Allen)**

* ‘Mirov, ne xwediyê wê serbestiyê ne ku zimanê xwe yê dayikê hilbijêrin. Lê li hemberî zimanê xwe yê dayikê, berpirsiyar in.’
**(Mehmed Uzun)**

* ‘Ger hûn bi siyasetê re mijûl nebin, wê demê hûnê ji layê mirovên ji we ehmeqtir ve werin birêvebirin. Ev yek jî, dê bibe cezayê we.’
**(Platon | Eflatûn)**

* ‘Rastî, herdem hindikahî ye.’
**(Soren Kierkegaard)**

* ‘Li tu der û demê, ji ti tiştên ku mantiqa we qebûl neke bawer nekin. Hizkî bila wî tiştî min gotibe.’
**(Gautama Buddha)**

* ‘Ji bo şer herdem pereyên wan hene,
lê nikarin birçiyan têr bikin.’
**(Amaru Shakur)**

* ‘Pere dikare hemû deriyan veke, lê nikare wan bigre.’
**(Gotineke Yewnaniyan)**

* ‘Xirîstiyan ew kole ne ku ji bo veşartina neşadiya xwe, dinyayeke din afirandine. Ji bo ku nikarin beşdarê nirxên rasteqîn; nirxên efendiyên xwe, nirxên hêzdaran bibin, nirxên qelp afirandine.’
**(Friedrich Nietzsche)**

* ‘Ez ji bo mirovên baş digirîm,
bi xiraban dikenim û gunehê min, bi nezanan tê.’
**(Mêrxas)**

* ‘Mirovekê bêaqil, ne efû dike û ne jî, jibîr dike. Nefbiçûk, pêşî efû dike û piştra jî, ji bîr dike. Mirovekê zana jî; efû dike, lê ti caran ji bîr nake.’
**(Thomas S. Szasz)**

* ‘Diyariya herî hêja ya jiyanê, hevaltî ye.’
**(Voltaire)**

* ‘Evîn, dişibe dozekî û cefa jî, şahîdên wê dozê ne. Ger şahîdên te tunebin, tu ê çawa dozê qezenc bikî?’
**(Mewlana)**

* ‘Çavkaniya esaletê ne zayîn e, tevger in.’
**(Platon| Eflatûn)**

* ‘Tiştê ku pêdiviya me pê heye, ne qehreman in. Civakek wisa ji me re divê ku pêdiviya me, bila êdî bi qehremanan nemîne.’
**(Bertolt Brecht)**

* ‘Heke hûn lawekî perwerde bikin, hûn ê zilamekî perwerde bikin. Lêbelê heke hûn jinekê perwerde bikin, hûn ê nifşekî perwerde bikin.’
**(Brigham Young)**

* ‘Ger dilê we hezkirinê hilneberîne, hûn ne kedkareke baş in.’
**(Karl Marks)**

* ‘Newroza min, dê li dara sêpê were pîrozkirin.’
**(Mensûrê Hallac)**

* ‘Bala xwe baş bide gotinên şîrîn yên dijminên xwe, bila te nexapînin. Di nava hingiv de, dibe ku jehrî jî hebe.’
**(Sadiyê Şîrazî|Ji Berhama Bostan)**

* ‘Ber bi evînê ve nefire, dê baskên te bişewitin.’
**(Sadiyê Şîrazî)**

* ‘Ger tu ber bi evînê ve nefirî, bask bi kêrî çi têtin?’
**(Mewlana)**

* ‘Ji bo mirovahiyê diyariya herî mezin, keyfxeşî ye.’
**(Mark Twain)**

* ‘Ramanên xav, encax ji aliyê aqil ve dikarin werin pehtin.’
**(Firdewsî)**

* ‘Zaningeha herî mezin,
koleksiyoneke baş ya pirtûka ye.’
**(Charles Jones)**

* ‘Zanîn, dîtina siberojê ye û dîtina siberojê jî, hêzdarî ye.’
**(Auguste Comte)**

* ‘Nivîsandin, cureyeke tolhildanê ye û mirov bi vê reyê,
tola xwe ji jiyana ku ne jiyaye hildide.’
**(Orhan Pamuk)**

* ‘Wêrek bin û biaqil tevbigerin. Ji niha ve dest pê bikin. Mirovên ku dem û roja dê bijîn dehf bidin aliyekî, ew dişibine gundiyên ku li benda ziwabûna çem in. Lê, çem diherike û heta dawiyê diherike.’
**(Quintus Horatius Flaccus)**

* ‘Ji bilî zincîrên xwe,
tiştekî ku dê proleterya wenda bike tune.’
**(Karl Marx)**

* ‘Em ê felsefeyê bikin tiştekî xeternak, zanayiya felsefî biguherînin û em ê felsefeyeka ku ji bo jiyanê xeternak e, fêrî her kesî bikin: Ji vê yekê baştir em çawa dikarin xizmeta jiyanê bikin? Bedelê ramaneke ji bo mirovahiyê çiqasî mezin be, hewqas hêja ye ew raman. Ji bo fikrên wekî <Xwedê>, <Welat>, <Azadî> xwe qorî dike û ji vê yekê natirse û heke hemû dîrok ji bilî dûxaneka ku xwe li van gorîkirinan rapêçaye, ne tu tişt be; li hemberî wan ramanan raseriya felsefeyê jî, encax bi bedeleke mezintir dikare were peyîtandin.’
**(Nietzsche)**

* ‘Mirin, ji bo me ne tu tişt e.’
**Epîkuros| B.Z.341-270**

* ‘Mirov ji ber xwezaya xwe, heywanek sîyasî ye.’
**(Arîstoteles)**

* ‘Felsefe, bi meraqê dest pê dike.’
**(Platon – Eflatûn)**

* ‘Heke hûn bi şîreta min bikin; bila di ramanên we de ji Sokrates zêdetir, heqîqet hebe.’
**(Sokrates)**

* ‘Di xwezayê de, tişteke bêwate yan jî bêfeyde tune.’
**(John Locke)**

* ‘Ez hemwelatiyekî dinyayê me.’
**(Diogenes| B.Z. 412-320)**

* ‘Li dinyayê tiştê ku herî baş hatiye parvekirin, aqlê selîm e. Çimku, her kes wiha dizane ku para wî/wê mezin e.’
**(Rene Descartes)**

* ‘Ferd li ser xwe, li ser laşê xwe û li ser eqlê xwe, hiqûmran e.’
**(John Stuart Mill)**

* ‘Xurafe, agir berdidine dinyayê û felsefe jî,
wî agirî ditemirîne.’
**(Voltaîre)**

* ‘Yên ku dawîndar in,
ew ne xwediyê hebûneke rasteqîn in.’
**(Friedrich Hegel | 1770-1831)**

* ‘Ez, awireke zindî me.’
**(Johann Gottlieb Fichte)**

* ‘Lewre, ji bo yên ku têne zayînê mirin û ji bo yên ku dimirin jî nûzayîn, tiştekî misoger e.’
**(Bhagavad Gita| Pirtûka Pîroz)**

* ‘Ev dinya, ji bilî pêşnûmeyeka min ne tu tişt e.’
**(Arthur Schopenhauer)**

* ‘Rih, neynika gerdûna mayende ye.’
**(Gottfried W. Leibniz)**

* ‘Felsefe fikirîna li ser daneyên zanistî ye, ku bingeha wan jî ezmûn û çavdêrî ne.’
**(F. Bacon)**

* ‘Felsefe, zanîna Xwedê ye.
Felsefeya rasteqîn û ola rasteqîn jî, mînanî hev in.’
**(Augustînos)**

* ‘Em ketine nav diranên çerxa zayîna bêdawî û mirinê. Jiyana me ya rasteqîn li stêrka ye. Lê me, xwe bi erdê ve girê daye. Encax bi destşûştinê, bi pakbûnê û bi jiyaneke çîlekêş em dikarin xwe rizgar bikin û bi vê çerxê, bi coşî xwe bigihînin xwedê.’
**(Orpheus)**

* ‘Ji bo zanyariyê, wextekê betal/vala pêwîst e. Wextên vala jî, li cem wan kesên ku ji bo jiyana xwe ya rojane dixebitin, peyda nabe. Lê ew kesên ku xwediyê derfetên cuda ne, yan ew ên ku debara xwe bi alikariya dewletê pêk tînin, ew xwediyê wextên vala ne.
Mirovên bêperwerde û nezan û yên ku hemû imrê xwe di riya zanayiyê de derbas dikin, nikarin dewletê bi rê ve bibin. Yên yekemîn, ji ber ku ne xwediyê mengîyekî ne, yên duyemîn jî, ji ber ku naxwazin xwe têkilî karê dewletê bikin; ew nikarin dewletê bi rê ve bibin. Lewra ew wiha bawer dikin ku, ew bi xwe gihêjtine mengiya xwe a herî bextewar.’
**(Platon| Eflatûn)**

* ‘Beza li pey felsefeyê, fêrbûna mirinê ye.’
**(Karl Jaspers)**

* ‘Di afirandina mêran de evîn tunebû,
jinan wan fêrî evînê kirin.’
**(Geraldy)**

* ‘Mêr pirî caran, lê kêm hez dikin.
Jin jî, carekê lê pirr hez dikin.’
**(Basta)**

* ‘Evîn, deryayek e û jin jî, keviya wê deryayê ne.’
**(Victor Hugo)**

* ‘Evîn, ji bextewariya herî mezin
û ji êşa herî giran, hatiye afirandin.’
**(Bailey Tzuke)**

* ‘Mirov ji heyînên din, bi têgihiştinê cewaz in. Heyînên din heke bibihisin jî, ew tênagihêjin.’
**(Alkmeonê Krotonî| B.Z. sala 500 an)**

* ‘Netirse ji mirinê, şewq nemir e. Mirin dê bibe çiyê te? Lewra, rihê te pîroz e.’
**(Yunus Emre)**

* ‘Azadiya mirov, girêdayî helwesta mirov e.’
**(Sartre)**

* ‘Tiştên ku li gor aqil in, ew rasteqîn in.
Tiştên ku rasteqîn in jî, li gor aqil in.’
**(Friedrich Hegel| 1770-1831)**

* ‘Nexweşî, tenduristiyê xweş dike.
Birçîtî, têrbûnê û westîn jî, bêhnvedanê.’
**(Herakleîtos| B.Z. 535-475)**

* ‘Rênîşandarê miroveke kor; heke kor be,
dawiya wî/wê hevrezan e.’
**(Roger Willams)**

* ‘Gelî mirovan! Ez wiha difikirim ku hûn ne ji rûyê zagonan, lê ji rûyê xwezayê pismamên hevnîjad in û hemwelatî ne. Lewra yên mîna hev, dişibin hevdu û ji aliyê xwezayê ve hevnîjad in. Zagon jî, bi zordariya xwe û ligel xwezayê, gelek tiştan bi zorê dide kirin.’
**(Hîppîas)**

* ‘Roja xwe ya îro bijî, dibe ku sibê tu ê dereng bimînî.’
**(Martial)**

* ‘Hindek dîk,
wisa bawer dikin ku roj ji bo banga wan hiltê.’
**(Ledric Dumond)**

* ‘Qenciyeka bobilatan ew e,
ku rê li naskirina dostên rasteqîn vedike.’
**(H. Balzac)**

* ‘Di pirsgirêka kurd de, nifûs û ax gelekî destnîşankar in. Çimku dema em dibêjin Kurdistan, em behsa derekî dikin ku ew lê pirranî ne. Hûn dikarin bibêjin ku pênc milyon kurd jî li Stenbolê dijîn. Li Stenbolê heşt milyon jî kurd bijîn, ew der nabe Kurdistan.  Lê li Colemêrgê qet kurd nejîn jî, ew der Kurdistan e. Çimku di esasê xwe de meseleya kurd, meseleyeka axê ye.’
**(Civaknas Dr. Îsmail Beşikçî)**

* ‘Hûn feqîriyeka ku bikaribin bibin alîkar dixwazin, em jî feqîriyeka ku ji holê rabûye dixwazin.’
**(Victor Hugo)**

* ‘Tiştek dema ku ji aliyê mirovan ve tê tunekirin, jê re Vandalîzm tê gotin. Lê dema ku mirov tiştekî ku xwezayê ew afirandiye ji holê radikin, jê re jî  dibêjin pêşketin.’
**(Ed Begley Jr)**

* ‘Mirov dîsa wekî ku di rabirdûyê de hatiye dîtin, du celeb in. Kole û mirovên azad. Çi dibe bila bibe; hizkî bila destûrmendê dewletê be, hizkî bila bazirgan be, karbidest yan jî akademîsyen be, heke ew mirov di rojekê de demake mezin ji bo xwe derbas neke, ew mirov kole ye.’
**(Nietzsche)**

* ‘Li pey mirovên ku we dibişirînin herin,
çimku bi tenê bişiranek dikare rojeke tarî rohnî bike.’
**(Molière)**

* ‘Bextewarî, her dem nêzîkê me ye. Pirî caran bo zeftkirina wê, em destên xwe dirêj bikin bes e.’
**(George Sand)**

* ‘Heke maleka we a bexçedar û pirtûkxaneyeka we hebe, nexwe her tiştê we heye.’
**(Cicero)**

* ‘Hebûnîtî, herfek e û tu, wateya wê herfê yî.’
**(Îbnî Arabî)**

* ‘Marên ku çermê xwe neguherînin dimirin, weke mejiyên ku naxwazin ti caran ramanên xwe biguherînin.’
**(Nietzsche)**

* ‘Ji bo berfirehbûna aqilê zarokekê hezkirina dê, qasî vîtamîn û proteînan ku rê li berfirehbûna fizîkî vedikin, girîng e.’
**(John Bowlby)**

* ‘Di civakê de ji bo pirraniya mirovan wateya perwerdehiyê, weke mezinên ji rêzê mezinkirina zaroka ye. Ji bo pêkhatina vê yekê jî, di warê perwerdehiyê de rêbazên cihêreng têne bikaranîn.’
**(Jean Piaget)**

* ‘Heke ez bizanibim ku ez ê malbatê baş bikim, ez bawer im ku ez ê bikaribim dinyayê jî baş bikim.’
**(Virginia Satir)**

* ‘Heta ku mirov ji dojeha bextreşiyê derbas nebe, nikare xwe bigihîne bihûşta bextewariyê.’
**(Sadiyê Şîrazî)**

* ‘Mirovek, divê hewl nede wê yekê ku ji kompleksên xwe xelas bibe. Beravajiya vê yekê, divê mirov ji kompleksên xwe hez bikin û wan bikin perçeyeke nasnameya xwe. Çimku kompleks, pêkarek gelek girîng e û jiyana mirovan berhêlî dike.’
**(Sigmund Freud)**

* ‘Di rastiya xwe de, bûyer û mirov, me xemgîn nakin. Em wiha bawer dikin, ku ew dikarin me xemgîn bikin. Lewma jî, em xemgîn dibin.’
**(Albert Ellis)**

* ‘Di jiyana xwe de ti caran bi temamî ji miroveke bawer neke, jê ne ewle be. Lewra ti kes, wê bi temamî xwebûna xwe nîşanî te nede.’
**(Pablo Neruda)**

* ‘Heke we dilê xwe li paş xwe hiştibe,
teqez dê hûnê vegerin.’
**(Marc Levy)**

* ‘Tu di riya xwe de bimeşe, hema çi dibêjin bila bibêjin.’
**(Horace Mann)**

* ‘Gumanberî, destpêka zanyariyê ye.’
**(Arîstoteles)**

* ‘Heta ku demokrasiya rasteqîn ava nebe,
aştiya mayende pêk nayê.’
**(Mehmet Altan)**

* ‘Ji min dipirsin, dibêjin pirtûka herî mezin a ku heta niha te xwendiye, kîjan e?
Bersiva min eşkere ye: Diya min.’
**(Abraham Lincoln)**

* ‘Jiyan, dê herdem riya xwe bibîne.’
**(Carl Sagan)**

* ‘Edaleta herî bêhempa, wujdan e.’
**(Victor Hugo)**

* ‘Her ku pîr dibim, ez kêmtir bala xwe didime gotinên xelkê. Ez bi tenê, êdî li tevgerên wan temaşe dikim.’
**(Andrew Carnegie)**

* ‘Carinan ez rastê mirovên wisa ecêb yên xwedî dîplome têtim û ji xwe re wiha dibêjim: nezaniyeke wiha, encax bi perwerdehiyê dikare pêk were.’
**(Vedat Turkalî)**

* ‘Gavavêtineke nû û gotina peyveke nû,
herdem mirovan ditirsîne.’
**(Dostoyevskî)**

* ‘Cihê ku bêedaletî lê serwer be, berxwedan erka me ye.’
**(Yvonne Ridley)**

* ‘Mirovê qenc, ne ew mirov e ku gotinên qenc dibêje. Mirovê qenc, dema dibêje dike û tiştên ku nikaribe bike jî, nabêje.’
**(Konfûçyûs)**

* ‘Tenêtî, aramiyek e û di rewşa tenêtiyê de mirov wiha difikirin ku dê carekê din dilê wan nemînin û dê xemgîn nebin. Tekane tiştê ku vê rewşê reş dike jî, hesta têkçûnê ye.’
**(Descartes)**

* ‘Ji bo jiyanê me pîlanan pêşnûma dikir, Lê me ji bîra dikir ku pîlanên qederê jî hene.’
**(Fyodor Dostoyevskî)**

* ‘Rojeke bêken, ew roj e ku beredayî hatiye xerckirin.’
**(Charlie Chaplin)**

* ‘Faşîzmê, çawa dest pê dikir?
Helbet ne bi avêtina çend narincokan, yan jî bi terora ku li ser tê nivîsandin û xêzkirin. Faşîzm, bi têkiliya di navbera du mirovan de dest pê dike.’
**(Ingeborg Bachmann)**

* ‘Bêguman,
divê hûn matematîk û mûzîkê fêrî zarokên xwe bikin.’
**(Platon)**

* ‘Qomedî, xilas bû...’
**(Ludwig van Beethoven| Gotina wî a dawî)**

* ‘Mirovên ku karê destan dikin, ew karkir in. Mirovên ku hem bi dest û hem jî bi mejiyê xwe dixebitin, ew hoste ne. Mirovên ku bi dest, mejî û bi dilê xwe dixebitin, ew jî zeneetkar in.’
**(Goethe)**

* ‘Heke em bixwazin xeteka sitûr bikşînin navbera miroveke dîn û aqilmend, ev yek ne pêkan e. Em hemû jî, carinan weke dînan tevdigerin. Çimku mirovên ku em bikaribin bibêjin ew bi temamî normal in, gelekî kêm in.’
**(Dostoyevskî)**

* ‘Mêr, ji ber ku westiya ye dizewice. Jin, ji ber meraqa xwe. Di dawiyê de, xeyalên herduyan jî têk diçin.’
**(Oscar Wilde)**

* ‘Hûn dizanin fotograf çima ne huner e?
Çimku, perçeyek ji heqîqetê diguncîne ji lewma. Ji ber ku heqîqet heye, fotograf jî heye.’
**(Ara Guler)**

* ‘Divê meriv binase, têbigihêjê û bilive. Dinya me ne ji bo xewn û xeyala ye, ji bo veguhastina şeklekî nû ye.’
**(Baruch Spinoza)**

* ‘Miroveke ku di bist saliya xwe de bedew, di sih saliya xwe hêzdar, di çil saliya xwe de dewlemend û di pêncî saliya xwe de ne aqilmend be, ew ti caran nikare bibe miroveke bedew, hêzdar, dewlemend û aqilmend.’
**(George Herbert)**

* ‘Rastî li cem zanyaran, zanyar jî bi felsefeyê dijîn.’
**(Mêrxas)**

* ‘Mirov dema ne dadwer be û rabe xwe wiha nîşan bide, bêedaletiya herî mezin, ev e.’
**(Platon | Dewlet)**

* ‘Mirovên ku stranên welatekî çêdikin,
ji zagonçêkiran bihêztir in.’
**(Victor Jara)**

* ‘Mirov dema ku ji dilê xwe tiştekî bide ew nabe tiştekî biçûk an mezin, dibe tiştekî rasteqîn.’
**(Rainer Maria Rilke)**

* ‘Heke hûn êşa birînekê hîs nekin,
hûn nikarin wê birînê baş bikin.’
**(S. R. Smalley)**

* ‘Bi xwe re rûbirû bibe, netirse.
Dibe ku tu ê, ji mirovê bibînî hez bikî.’
**(Eddi Anter)**

* ‘Li wê dera ku leqleqe pir in, zana bi tenê difikirin.’
**(Mêrxas)**

* ‘Piraniya mirovan, ne ji bo famkirinê guhdar in. Ji bo ku bikaribin bersivên xwe bidin guhdar in.’
**(Stephen Covey)**

* ‘Em rastiyan ne tenê bi sebeban, bi dil jî dizanin.’
**(Blaise Pascal)**

* ‘Têgihiştin û dîtin, ne heman tişt in.
Têgihiştin, guherîn e.’
**(J. Krishnamurt)**

* ‘Kê ji te zêdetir te xapand?’
**(B. Franklin)**

* ‘Bi rastî pirr tiştên min tune nin ku ez bikaribim bidime te. Çaya min heye heke tu vexwî, ez he me heke tu hez bikî, rê heye heke tu herî?’
**(Aşik Veyselî)**

* ‘Qalîte, erdemek e.’
**(Lao Tzu)**

* ‘Baweriya xwe ya ji bo mirovahiyê, ti caran wenda neke. Mirovahî, zeryayek e. Ma ji ber çend dilopên pîs, zerya qet dilewite?’
**(Mahatma Gandhî)**

* ‘Dibe ku hemû mirov ne baş bin, lê li cem hemû mirovan başî heye. Lewma jî ti kesî, wiha bi hêsanî mehkeme nekin. Çimku, her xoşewîstek xwediyê rabirdûyeke ye û siberojeke hemû gunehkaran jî heye.’
**(Oscar Wilde)**

* ‘Ma tu dixwazî ku bibî feylesof?
Xwe ji tinaziyan re amade bike! Û bawer bike ku dê xelk wiha bibêjin: <Ev zilam, di şevekê de çawa bû feylesof, ev metirsiya wî ji kû tê?’ Lê guhên xwe nede van gotinan. Baweriya xwe bi tiştên xweşik û baş bîne, tiştên ku tu ji wan bawer dikî. Jibîr neke, mirovên ku tinazên xwe bi te dikin, dê rojekê te bihezidin. Heke tu guhên xwe bidî tinazên wan, wê demê dê zêdetir tinazên xwe bi te bikin. Heke ji bo xelk te biecibînin tu xwe bi tiştên rûkalkî girê bidî, bizanibe ku dê qîmeta te kêmtir bibe. Ji bo vê çendê, herdem divê feylesofî besî te be. Heke tu bixwazî ku xelk feylesofiya te bibînin, bibe wekî xwe û qîmetê bide vê yekê. Ev yek, dê besî te be.’
**(Epîktetos| Raman û Guftegoy)**

* ‘Perçeyên ku qerektereke baş pêk tînin,
rehm û dilsozî ne.’
**(Carl Hilty)**

* ‘Çavên mirovan hevokên wiha dipeyîvin,
ku ziman nikare wan vebêje.’
**(Eşîra Crowanên Çermesoran)**

* ‘Heke serbestî mafê me yê çewtiyê jî neguncîne,
ne hêjaye ti tiştî.’
**(Mahatma Gandhî)**

* ‘Heke di rih û laş de rihetî tunebe,
doşekeka rihet bi kêrî çi tê?’
**(Montaigne)**

* ‘Mirovên ku ji zarokan hezdikin, ji jiyanê jî hezdikin.’
**(Dostoyevskî)**

* ‘Beyî ku mirov bifikirin, fêrbûn ziyana kedê ye. Beyî fêrbûnê fikirîn jî, xeterek mezin e.’
**(Konfiçyûs)**

* ‘Xwedîrehm be.
Pirraniya mirovan, tekoşîneke zor didin.’
**(Platon| Eflatûn)**

* ‘Heta ku meriv azad nebe, bextewar jî nabe.’
**(Dante)**

* ‘Mirov dema ku hez dike,
li hemberî êşan nikare xwe biparêze.’
**(Sigmund Freud)**

* ‘Hemû xirabiyên ku li dinyayê hene,
herdem ji nezaniyê çêdibin.’
**(Albert Camus)**

* ‘Hezkirin, mirovan dike yek û xweperestî jî,
tenêtiyê tîne.’
**(Schiller)**

* ‘Heta ku tu bi xwe re li hev neyî,
dê tu yê ji ti tiştan qayîl nebî.’
**(Doris Mortman)**

* ‘Tu çiqasî zû bibezî bibeze,
tu nikarî ji wujdana xwe birevî.’
**(Papillon)**

* ‘Heta çil salan temenê mirov pirtûkek e,
salên mayî jî, rexneya wê ye.’
**(Schopenhauer)**

* ‘Heta ku hûn bi destê xwe nedin,
kesek nikare we bêrûmet bike.’
**(Mahatma Gandhî)**

* ‘Ji bo têgihiştina keyfxweşiya jiyanê, hewce nake ku mirov li benda dema amizgar be. Hema têbigihêjin keyfa dema ku hûn dijîn, bes e.’
**(Goethe)**

* ‘Ger mirov ne xwediyê wê hêzê be,
dilsozî ji bo mirov barekî giran e.’
**(Spartacus)**

* ‘Bila dilê mirov qenc be, bila mirov ne tekûz be.’
**(Jackson Brown)**

* ‘Heke hêza min têrê bikira, min ê hemû tenq, tiving û çekên ku hene bihelandina û min ê wan bikira tembûr, cergebez û zirne.’
**(Aram Tîgran)**

* ‘Dinya, li gor nêrîna mirova ye. Du mirovên ku ji heman paceyê mêze dikin, yek hariyê û ê din jî stêrkan dibîne.’
**(F. Langbridge)**

* ‘Ji bo zehmetiyên pirtexiîd yên jiyanê, sê tişt hatine diyarîkirin: hêvî, xew û ken.’
**(Immanuel Kant)**

* ‘Ji dengê dilê xwe netirsin, guhê xwe bidinê. Ew ê gelek deriyên nû yên ku haya we ji wan tune, nîşanî we bide.’
**(J. Campbell)**

* ‘Azadiya ku em lê digerin û dixwazin, ne mafê bindestkirina mirovên din e. Em mafê xwe yê vejiyînê dixwazin, em mafê xwe yê fikirînê dixwazin û helbet, em dixwazin ku bi dilê xwe tevbigerin. Bes ku bila tevgerên me, rê li daxwazên mirovên din negrin.’
**(Bertrand Russel)**

* ‘Mirovê qenc azad e, hizkî bila kole be û mirovê xirab jî kole ye; dibe çi bila bibe, hizkî bila qral be.’
**(Xoşewîst Augustinus | Ji Dewleta Xwedê)**

* ‘Di civaka hemdem de, niha jiyana sosyal xirab e. Belam, mirov ji aliyê afirandinê ve ne xirab in û xirab nayên dinyayê. Çimku çavkaniya xirabiyan, zagon û kevneşop in.’
**(Victor Hugo)**

* ‘Di demokrasiyan de parlemento, wekî axura ne. Yên di hindûrû de pihînan didin, lêbelê yên li derve zîtikan dixwin.’
**(Platon)**

* ‘Dema ku wext tê, tu tiştên xwe yên kevin diavêjî. Ê baş e, tu çima dev ji ramanên xwe yên kevin bernadî?’
**(Platon| Eflatûn)**

* ‘Tirs, rihê te û guman jî, aqilê te didize.’
**(Mêrxas)**

* ‘Mirovên bextewar, hemû razayî ne niha.
Silav, ji yên ne bextewar re.’
**(Charles Bukowskî)**

* ‘Ji bo giyaneke zanyar; guhek kûr, zimanekî biedeb û aqilekî ku radestê edaletê bûye pêwîst e.’
**(Mêrxas)**

* ‘Hemû mirov diqehirin, aciz dibin û qarewarê dikin. Bihayê hemû tiştan, her diçe biha dibe. Mirov, zêdetir bêqîmet dibin û deng ji kesî dernayê.’
**(Maksîm Gorkî)**

* ‘Heke pereyên mirov hebin, mirov ne mecbûr e ku bixebite. Bi vî awayî, mirov demê dikire û dikare wê dema xwe bi bextewarî derbas bike. Ango, pere dikare bextewariyê bikire.’
**(Albert Camus)**

* ‘Beriya her tiştî divê em qenc bin,
piştra em ê bextewar jî bibin.’
**(Rousseau)**

* ‘Ne pêtên êgir, ne ba û bahoz, ne zayîn û ne jî mirin dikare qenciyên we, bide jibîrkirin.’
**(Gautama Buddha)**

* ‘Hêza me ya fikirînê çuqasî zêde bibe, hewqas jî mirovên azad zêde dibin. Mirovên nezan û ji rêze, di navbera mirovan de ti cihêrengiyan nabînin.’
**(Blaise Pascal)**

* ‘Zagonên ku mirov wan çêdikin û zagonên xwezayê, çiqasî li hev werin û nêzîkê hevdu bibin, dê jiyan jî hewqasî xweşik bibe.’
**(Voltaîre)**

* ‘Mirovên herî belengaz ew in ku ji bilî peran,
ne xwediyê tiştekî ne.’
**(Schopenhauer)**

* ‘Ramanên ku di dilên nefsbiçûk de dijîn,
ramanên gewre ne.’
**(Montaigne)**

* ‘Mirov, di her temenê xwe de weke zaroka ye. Ji bo ku serê xwe lê deyne, herdem li balîveke ji evînê digere.’
**(Rochefoucauld)**

* ‘Ji bo jiyanekê baş û xweş bilezîne û bi vê yekê bizanibe ku her roja nû, bi serê xwe jî jiyanek e.’
**(Seneca)**

* ‘Jiyaneke ku em jê hezdikin,
wêrekiya me ya herî mezin e.’
**(Leo Buscaglia)**

* ‘Pirraniya mirovan, azadiyê naxwazin.
Çimku, azadî berbirsiyariyê tîne û pirraniya mirovan, ji berpirsiyariyê ditirsin.’
**(Sigmund Freud)**

* ‘Mirovên ku dengê muzîkê naçe wan û ew wî dengî seh nakin, wisa zen dikin ku yên direqisin dîn in.’
**(Nietzsche)**

* ‘Her awir çavdêriyekî, her çavdêrî ramanekî û her ramanek jî, girêdanî û têkîliyeke diafirîne.’
**(Goethe)**

* ‘Herdem çi hebin wan bibîne, nelezîne.
Fêhmkirina çewt, ji tênegihêjtinê xerabtir e.’
**(Osho)**

* ‘Tiştê ku mirovan diwestîne ne jiyan e, rûpoşên wê ne.’
**(Shakespeare)**

* ‘Kişik, cureyek jiyan e û jiyan jî, cureyek kişik e.’
**(Gotineke Hînduyan)**

* ‘Jiyan, amûreke bêhemta ya mûzîkê ye.
Divê tu xwe fêrî wê haletê bikî.’
**(Osho)**

* ‘Bi hêza xwe, xwe qûre neke û nihekiyê li xelkê neke. Ji bîr neke, dibe ku hêza te rojekê bibe bela serê te.’
**(Gotineke Hîndûyan)**

* ‘Dostanî berpirsiyariyeke şîrîn e
û ti caran ne fersendek e.’
**(Halil Cibran)**

* ‘Jinên kurdan, rûyê xwe venaşêrin. Di nav girseyan de, herdem bi mêran re ne. Di civînan de, herdem gotinên xwe dibêjin. Jina kurd, herdem li xwe dinêre û dixwaze ku were ecibandin û xwedîerdem e.
Zina û hinek tevgerên xirab ku li Rojhilatê zêde têne dîtin, di nav kurdan de tune nin. Bi awayekî teqez, mirov dikare bibêje ku jina kurd xwedîşexsiyeteke ye. Dema ku jinek bi delalî û jîrîtiya xwe were naskirin, lawên wê bi navê wê têne nasîn.’
**(Bazil Nikitin| Ji lêkolîneke Sosyolojîk)**

* ‘Divê ku tu bi temamî li hebûna xwe xwedî derkevî. Divê tu aliyên xwe yên baş û xirab bipejirînî. Bi hêsanî mirov nikare wiha di derbekî de ji hemû tiştan rizgar bibe. Bi tenê mirov dikare bibêje ku mirov hêdî hêdî hemû tiştan dipejirîne.’
**(Osho)**

* ‘Ya rast, tu tişt ne xirab yan jî ne baş in.
Her tişt, girêdayê hizra me ye.’
**(Shakespeare)**

‘Û ji mirinê ditirse, ji ber ku nizane bijî.’
**(Shakespeare)**

* ‘Dil bi tiştekî dizane, ku haya aqil qet jê tune.’
**(Blaise Pascal)**

* ‘Keneka xweşik, weke tîrêja rojê ye, ku ji nîşkave xwe berdide nava malê.’
**(Lev Nikolayeviç Tolstoy)**

* ‘Bi sedan xewn û xeyalên mirov hene û mirov, her roj li ser wan difikire. Dibe ku ji wan yek jî, neyê cih. Lê ji bîra neke, tu yê rojekê rasteqîniyeke bijî ku di tu xewnan de nahewe.’
**(Paul Auster)**

* ‘Hûn çiqasî bi dilsozyeke mezin guh bidin dengê dilê xwe, hûn ê dengên li derve hewqasî baş seh bikin.’
**(Dag Hammarskjold)**

* ‘Di navbera du dizan de, em dixwazin ku xwe îfade bikin: Xemgîniyên me yên rabirdûyê û tirsên me yên siberojê.’
**(George Bernard Shaw)**

**Bûyer:** Mirîşkek, li ser rê derbasê aliyê din dibû.
**Pirs:** Mirîşk, çima derbasê aliyê din dibe?
**Bersivên çend feylesofan...**
**Rene Descartes** : Bes dixwaze ku derbasê aliyê din bibe.
**Platon** : Ji bo pakiya xwe. Rasteqînî, li aliyê din e.
**Aristoteles:** Bi awayeke xwezayî, dixwaze ku here aliyê din. Ev yek, di xwezaya wê de heye.
**Karl Marx** : Ji hêla dîrokî ve, ev yek rewşeke bivênevê ye.
**Hipokrates** : Ew ji ber ava pankreasa xwe wiha tevdigere.
**Martin Luther**: Ez cîhaneke wiha xeyal dikim ku di vê cîhanê de mirîşk, wê bikaribin bi azadî tevbigerin.
**Sigmund Freud**: Meyl û bala we, li ser mirîşkê ye û ev yek jî nîşan dide ku hûn, ji hêla hesta zayenî ve ji xwe ne ewle ne.
**Buddha**: Pirsiyarkirin, inkara xwezaya wê ya mirîşkî ye.
**Galilei:** Heçku mirîşk, ji aliyekî derbasê aliyê din dibe.
**Einstein**: Awa û terzê livdariya mirîşkê, bi temamî girêdayê referansên we ye.

* ‘Mirov bi tenê,
pirsên ku dikarin bersiva wan bidin dibihisin.’
**(Nietzsche)**

* ‘Tiştê ku girîng e, ne vejiyîn e û qet, ne serkeftin e jî. Tiştê girîng ew e, ku mirov bikaribe weke mirov bimîne.’
**(George Orwell)**

* ‘Helwesta li hemberî bûyeran, ji bûyeran girîngtir e.’
**(A. W. Hare)**

* ‘Kurdî, ne ji bo kurdan,
lê ji bo tirkan dikare bibe dersê hilbijartî.’
**(Civaknas Dr. Ismail Beşikçî)**

* ‘Tiştê ku alikariya mirovan dike, ne rasthatînî ye.
Xîret û sebat in.’
**(Samuel Smiles)**

* ‘Ronahiyê, di dilê xwe de bihewîne. Wê demê, di tariyê de jî tu dikarî bi hêsanî rêya xwe bibînî.’
**(W. Blake)**

* ‘Dostê herî baş, dîsa em bi xwe ne.’
**(Charles Dickens)**

Mirovên xwedîerdem, neh ramanên wan hene.
Dema mêze dikin, difikirin ku zelal bibînin.
Dema ku guhdar in, difikirin ku baş seh bikin.
Ji hêla xweyakirinê ve, difikirin ku xwînşîrîn bin.
Di tevgerên xwe de, bi rêzdarî tevdigerin.
Di axaftinên xwe de, difikirin ku rastgo bin.
Di karên xwe de, difikirin ku jêhatî bin.
Dema ku biguman in, li ser pirsên xwe difikirin.
Dema aciz dibin, li ser pirsgirêkan difikirin.
Dema ku kar dikin, li edaletê difikirin.
**(Konfiçyûs)**

* ‘Efûkirin bêhna binevşê ye, xwe berdide binê pehniyan.’
**(Mark Twain)**

* ‘Ji bo mirove ku hez nake morî bar e, ji bo hezkaran fîl mîro ne. Mirov dikare çiyayan jî bide pişta xwe, dema ku bawer bike û bibe evîndar.’
**(Şemsê Tebrizî)**

‘Xapandina herî xirab, xwexapandin e.’
**(Platon| Eflatûn)**

* ‘Dawiya şeva herî tarî jî tê û roj, dîsa hiltê.’
**(Victor Hugo)**

* ‘Beriya ku tu çûyî, li ser çûyîna xwe bifikire.
Çimku, dîtina te ya dema vegerê û dema ya çûyînê, dê ti caran ne mîna hevbin.’
**(Aragon)**

* ‘Jin tenê namîne, tenêtiyê hildibijêre.’
**(Turgut Uyar)**

* ‘Bextewariya jiyanê, girêdayî aramiya hişê we ye.’
**(Marcus Tullius Cicero)**

* ‘Hinek mirov, jiyana xwe bi destê xwe ava dikin. Hinek jî, li benda dana jiyanê ne. Ferqa di navbera herduyan de, yek jiyana xwe têr û tije dijî û yê din jî, bi tenê hebûnatiyek e.’
**(M. Gerber)**

* ‘Ez êdî, xwe ji bo naskirina mirovan nawestînim. Çawa be ew bi kirinên xwe, xwe didin nasandin.’
**(Paul Auster)**

* ‘Pirpirok, bi mehan najîn. Bi tenê demê dijîn û têra xwe, wextê wan jî heye.’
**(Rabindranath Tagore)**

* ‘Ji bo min, tekan e desthilatdarek heye û ez ê li ber ranebim, ku ew jî biryara aqilê min û fermana wujdana min e.’
**(William Godwin)**

* ‘Ger tu bixwazî bibî heywanek, helbet tu dikarî bibî heywan. Ji bo vê yekê hema pişta xwe bide êşên mirovahiyê û wan qet nebîne, seh neke. Bes hay ji postê xwe hebe, dê ev yek bes be.’
**(Karl Marx)**

* ‘Jin, weke ku dê ti caran neçe hez dike. Lê dema ku biryara çûyînê dide jî, weke ku qet hez nekiriye diçe.’
**(J. Christophe)**

* ‘Tirkiye êdî nikare wekî berê bimîne, divê xwe biguherîne. Divê xwe bigihîne hiqûq û demokrasiya cîhanê. Ji bilî vê yekê, rêyeke din tune.’
**(Ahmet Altan)**

* ‘Zagon, wekheviyeke bêhemta didine me. Razana li binê piran, li kolanan parsekî û dizîna nan; çawa ji feqîran re qedexe be, wisa ji dewlemendan re jî qedexe ye.’
**(Anatole Franse)**

* ‘Di destpêkê de, divê tu bi rê û rêzikên leyîstikê baş bizanibî û piştre hewl bidiyê ku ji xelkê baştir bileyîzî.’
**(Albert Einstein)**

* ‘Dema ez ji diya xwe bûm, ez reş bûm,
Dema mezin dibûm reş,
Dema min li rojê dinhêrt ez reş bûm,
Dema ditirsiyam reş,
Dema nexweş bûm reş,
Dema dimirim hê jî reş im...
Û tu zarokê tenspî,
Dema tu ji diya xwe re bûyî helesor,
Dema mezin dibî spî,
Dema li rojê mêze dikî sor,
Dema dicemidî mor,
Dema ditirsî zer,
Dema nexweş dikevî kesk,
Dema mirinê jî tu gewr î.
Û niha tu ji min re dibêjî rengîn.’
(Helbesta zarokeke reşik ê Afrîqayî ku di sala 2005 an de wekî <Helbesta Herî Baş Ya Cîhanê> hatiye hilbijartin.)

* ‘Em pir zêde difikirin, lê gellek kêm hîsdikin.’
**(Charlie Chaplin| The Great Dictator)**

* ‘Şertê pêşîn ê medeniyetê, edalet e. Bihêlin bila edalet were cih, dixwaze bila qiyamet rabe.’
**(Sigmund Freud)**

* ‘Heta ku tu rêya xwe neguherînî,
çiqasî hêdî herî here ne girîng e.
**(Konfiçyûs)**

* ‘Heke tu di depresyonê de bî, ev yek tê wê wateyê ku tu di rabirdûyê de dijî. Heke fikarên te hebin, tu di siberojê de dijî. Heke tu ji xwe ne aciz bî û bi xwe re aşt bî, wê demê jî tu di dema niha de dijî.’
**(Lao Tzu)**

‘Xweskam dilê min bidîtana,
ez bibêjim dê bawer bikin gelo?’
**(Franz Kafka)**

* ‘Nezaket zimanekî wiha ye,
ku kerr jî seh dikin û kor jî dibînin.’
**(Mark Twain)**

* ‘Derew xweş in, her kes derewan dike. Çimku, derew mirovan nêzîkê rastiyê dike. Lê, tiştê xirab ew e ku mirov ji derewên xwe bawer dikin.’
**(Dostoyevskî)**

* ‘Ji ber ti tiştan şaş nebe, heqîqet û mirov jî, durû ne.’
**(Amin Maalouf)**

* ‘Ji bo ku hûn bizanibin sebr çi ye, divê hûn li birêveçûna zarokeke ku nû bi çapulkan ketiye binêherin. Zarok, terayê erde dibe, tera dibe radibe, tera dibe dîsa radibe û hewl dide ku bi rê ve here. Hêdî hêdî, di dawiyê de fêr dibe û rojek tê, êdî nema terayê erdê dibe. Ger sebra mirovên temenmezin jî weke sebra  zarokan hebûya, dikaribûn di gelek mijaran de bi ser biketana.’
**(Erich Fromm| Hunera Hezkirinê)**

* ‘Tekane hêza ku dijmin pê nikare, dilsozî ye.’
**(Mêrxas)**

* ‘Divê hûn sê tiştan baş fêrbibin: nefsbiçûkî, sebr û dilovanî. Çimku xezîneya we ya herî mezin, ev sê tişt in.’
**(Lao Tzu| Dazanînên Nenas)**

* ‘Dema ku mirovek ji ber derd û êşa xwe dîn dibe, tu kes êşa wî nabîne. Bes, dînîtiya wî dibînin.’
**(Murat Menteş)**

* ‘Hûn bêaqiliya mirovên bêaqil, nikarin bi wan bidin pejirandin. Çimku, ji bo vê yekê jî pêdiviya wan bi aqil heye.’
**(J. Taylor)**

* ‘Çivîk dimre, tu firînê bîne bîra xwe.’
**(Furug Ferruhzad)**

* ‘Rastiyeke biçûk, ji dereweke mezin çêtir e.’
**(Leonardo Da Vincî)**

* ‘Kesê ku baweriya xwe bi xwe neyne,
herdem derewan dike.’
**(Nietzsche)**

* ‘Heywan qasî pêdiviya xwe,
mirov ji pêdiviya xwe zêdetir zalim e.’
(Mêrxas)

* ‘Mirovên ku xwediyê fikrên biçûk in, bi hêsanî mirovên li hawirdora xwe sûcdar dikin û ji vê yekê jî, zewq distînin.’
**(La Rochefacuald)**

* ‘Ma hesp ji ber ku nikare stranan bistre, bextreş e? Na, heke nikaribe bibeze bextreş dibe. Kûçik, ji ber ku nikare bifire ma bextreş e? Na, heke baş bêhn neke bextreş e. Mirov, ji ber ku nikare bi destan şêran bixeniqîne ma bextreş e? Na, ew ne ji bo vê yekê hatiye afirandin. Lê dema ku ew başî, pakijî, dilsozî û edaletê ji bîra bike, wê demê ew ixanetê li rihê xwe dike û hemû nirxên xwe wenda dike.’
**(Epîktetos | Guftegoy û Raman)**

* ‘Çavtêrî dewlemendiyeke xwezayî,
lûks jî feqîriyeke çêkirî ye.’
**(Sokrates)**

* ‘Edalet, beriya her tiştî divê ku pêşî ji dewletê were.
Çimku hîqûq, bandêra civakî ya dewletê ye.’
**(Arîstoteles)**

* ‘Di hezkirinê de wekî rojê, di dostanî û biratiyê de wekî çemekî, di veşartina çewtiyan de wekî şevê, di nefbiçûkiyê de wekî axê, di rikê de wekî miriyan be û tu her çi be yan weke xwe xwiya bike, an jî tu çawa xwiya dikî wiha be.’
**(Mewlana Celaledînê Rumî)**

* ‘Ezmûna resen, piştî rastiyê dest pê dike.’
**(Mêrxas)**

* ‘Dema ku pilingek bixwaze miroveke bikûje, navê vê yekê dibe hovîtî. Lê dema ku mirovek dixwaze ku pilingeke bikûje, navê vê yekê jî dibe spor. Ferqa di navbera sûc û edaletê jî, mîna vê yekê ye.’
**(George Bernard Shaw)**

* ‘Mirov herdem, bobilatên ku têne serê wan dihejmêrin û dihesibînin, ne keyfxweşî û dilşadiyên xwe. Heke keyfxweşî û dilşadiyên xwe jimartibana, wê fêhm bikirana ku jiyanê têra xwe bextewariyê jî daye wan.’
**(Dostoyevskî)**

* ‘Mirovên ku li serê tiliyên xwe radiwestin, nikarin li ser lingan bimînin. Mirovên ku bi quretî birêve diçin, nikarin dûr herin. Mirovên ku xwe li pêş dibînin, bala kesî nakşînin. Mirovên ku xwe mafdar derdixin, kes guhê xwe nadê wan. Mirovên ku pesnê xwe bidin, teqdîrê nastînin. Mirovên ku pesnê serkeftina xwe bidin, dawiya xwe amade dikin.’
**(Lao Tzu| Dazanînên Nenas)**

* ‘Lê çavdêr be, bêdeng be, kêm darizîne û gelekî bipirse.’
**(Platon)**

* ‘Hemû mirov biaqil in, hinek ji destpêkê ve wiha ne û hinek jî, piştra baqil dibin.’
**(Voltaîre)**

* ‘Heke ba rabe dev jê berde bila dara biyê bifikire,
tiştek bi dara çinarê nabe.’
**(Dostoyevskî)**

* ‘Evîn, hewldana afirandina ronahiyê ye.’
**(Mehmed Uzun)**

* ‘Xwepêşandarek ku di nav ramanên xwe de asê maye heta ku xwe ji wê westariyê rizgar neke, ti caran nikare bextewar bibe.’
**(Franz Kafka)**

* ‘Heke tu herdem bibêjî ku ez ê sibê çêbikim,
dê ew sibe ti caran neyê.’
**(Herakleîtos)**

* ‘Li dereka ku ti kes nikaribe bibêje ev reş e yan ev spî ye, li wê derê ronahî ditemire û azadî jî dibe êsîriyeke xwestekar.’
**(Albert Camus| Mirovê Serhildêr)**

* ‘Li pey xeyalên xwe bibeze, helbet dê rojekê biwestin.’
**(Paul Auster)**

* ‘Mirove zanyar, tiştekî wenda nake. Çimku hemû tiştê ku ew xwediyê wan e, li cem xwe digerîne.’
**(Seneca)**

* ‘Her ku nifûsa dinyayê zêde dibe,
hejmara mirovan jî kêm dibe.’
**(Chuck Palahniuk)**

* ‘Hinek mirov, bextewar û hinek jî, ne bextewar in. Yên mayî jî, ew bextreş in ku xwe bextewar nîşan didin.’
**(Oscar Wilde)**

* ‘Ez nizanim ev çi hiqmet e,
yên ku têne vê dinyayê jî digirîn û yên ku diçin jî.’
**(Seyraniyê Evîndar|Aşiq Seyranî)**

* ‘Heke tu bixwazî werî hezkirin,
divê pêşî tu xwe fêrî hezkirinê bikî.’
**(Nietzsche )**

* ‘Mirovên wêrek û xisletdar,
her dem weke zindiyên hêwilnak têne dîtin.’
**(Hermann Hesse)**

* ‘Ya rast, dê hemû kes te biêşînin.
Tu jî, miroveke wiha bibîne ku bila hêjayê wê êşe be.’
**(Bob Marley)**

* ‘Mirov her ku ji xwezayê dûr dibe, bêrehm dibe.’
**(Eşîra Cherokî)**

* ‘Piştî te, ez ê bitenê bimînim. Ya rast ez ji tenêtiyê natirsim. Lê heke ez bixwazim ku bi destê te bigirim?’
**(Can Yucel)**

* ‘Heke te ji dil hezkir, bila dûrahî te çavtirsonekî nekin. Jibîr neke, li cem hev in jî, ji hevdu dûr in hinek kes.’
**(Adam Fawer)**

* ‘Erdemitiyê, fêrî zarokên xwe bikin. Tiştê ku dê mirovan bextewar bike ne pere ne, erdem e.’
**(Ludwig van Beethoven)**

* ‘Em hemû, bargirên şermên xwe ne. Lewma jî, em nikarin kêmasiyên xelkê şermezar bikin.’
**(Sadiyê Şîrazî| Gulîstan)**

* ‘Di destpêkê de, min ji mirovan bawer dikir û ez ji wan, ewle bûm. Piştra jî, min biryar da ku ez careke din çewtiyeke wisa nekim.’
**(Ezel Roz Manaz)**

* ‘Ez destpêkeke nû naxwazim,
dawiyeke bextewar dixwazim.’
**(Chuck Palahniuk)**

* ‘Hemû kes dizanin ku tu ji derve ve çawa dixweyî, lê kêm kes dizanin ka bi rastî jî tu çawa yî.’
**(Machiavellî)**

* ‘Herdem weke xwe xwiya bike, bizanibe ku ev yek riya herî ewle û kurt, ya jiyaneke xwedînamûs e.’
**(Sokrates)**

* ‘Dîrok, her dem xwe dubare dike. Trajediya yekemîn, piştra jî wekî pêkenînê.’
**(Karl Marx)**

* ‘Ez îşev, dikarim helbesta herî dilbiêş binivîsînim. Min jê hezkiribû û wê jî, carinan ji min hezkiribû.’
**(Pablo Neruda)**

* ‘Mirovên ku perwerde bûne û yên ku perwerde nebûne; weke mirovên zindî û yên mirî, ji hevdu cuda ne.’
**(Arîstoteles)**

* ‘Heta ku ez fêrbûm wekî Rafael biresmînim çar salên min derbas bûn. Lê ji bo ku ez bikaribim weke zarokeke biresmînim, min temamiya imrê xwe derbas kir.’
**(Pablo Picasso)**

* ‘Hêza xwe pûç nekin, hemû bibin yek û alikariya hilweşandina vê bandêra nexweşok û xirabûyî bikin.’
**(Emma Goldman)**

* ‘Jiyan dişibe dika şanoyê,
mirovên herî xerab li cihên herî baş rûdinên.’
**(Arîstofanes)**

* ‘Ji ber tevgereke xwe ya çewt yan jî ji ber gotineke xerab, mirov dikare ji xwe aciz bibe û biqehire. Belam, ji ber hestên xwe yên ku em hîs dikin, em nikarin ji xwe aciz bibin û biqehirin. Lewra, hêzeka me ya ku bikaribe serweriya hestên me bike tune.’
**(Mîlan Kundera| Nasname)**

* ‘Zana xeber nadin, yên xeber didin jî nezan in.’
**(Lao Tzu)**

* ‘Tu kes, ne hêjaye rondikên çavên te ne.
Ger wiha bûya, ew ne dibûn sebebê girîna te.’
**(Gabriel Garcia Marquez)**

‘Dermanê herî baş, bextewarî ye.’
**(Marquez)**

* ‘Sê xezîneyên min hene û wekî çavên xwe ez li wan dinehêrim. Ya yekemîn, hezkirin e. Ya duyemîn, qenaetkarî û ya sêyemîn jî, nefsbiçûkî ye.’
**(Lao Tzu)**

* ‘Heke te ji jîrîtiya miroveke hezkir, bejn û bala wî/wê meraq neke û di bin bandora bejn û bala miroveke ku nikare jîrîtiya xwe bikar bîne de jî nemîne.’
**(Hegel)**

* ‘Mirov çuqasî mezin bibe, divê hewqas jî nefsbiçûk be.’
**(Cicero)**

* ‘Ez nizanim li dawiya vê zeryaya bi ba û bahoz, cîhaneke çawa heye? Lê ez dizanim dûr be jî, peraveke din ya her zeryayê heye. Û ez jî, ji xwe bawer im ku ez ê xwe bigihînime wê derê.’
**(Cesare Pavese)**

* ‘Û di dawiyê de, mirov ji dilxwaziyên xwe hez dike.
Ne ji dilxwestinên xwe.’
**(Nietzsche)**

* ‘Mirovên ku herdem ditirsin, ew ti caran azad nabin.’
**(Horatîus)**

* ‘Pirraniya stranên me, li ser baranê ne. Lewra, baran li cem me kêm dibare û em gelekî bêriya baranê dikin.
Çermespîno, min bala xwe dayê ku stranên we jî bi pirranî li ser eşq û evînê ne.’
**(Zanyarekî Çermesoran)**

* ‘Jiyan, tişteke tevahî ye. Tengahî, êş, azar, dilşewatî, şadî, ramanên pûç, lêxwedîderketin, hesûdî, hezkirin û jana tenêtiyê, jiyan bi xwe ne. Ji bo ku em bikaribin mirinê fam bikin, divê em tevahiya jiyanê fam bikin.
Nabe ku em bi tenê ji perçeyeke jiyanê fam bikin û çavên xwe ji perçeyên din re bigrin. Dema em têbigihêjine kûrahiya jiyanê, em ê wê demê mirinê jî fam bikin. Lewre, herdu ji hev ne cuda ne.’
**(Jiddu Krishnamurtî)**

* ‘Gotûbêjeke şîrîn, ji xwarina herî xweş jî xweştir e.’
**(Gogol| Ruhên Mirî)**

* ‘Heke dinyayeke xweş û geş a ku meriv bikaribe lê bijî tunebe, xanîyekî me ê xweş û delal hebe dê bi kêrî çi were?’
**(Henry David Thoreau)**

* ‘Zemanê berê ji bo ku bikaribin li dijî welatekî şer bikin, li leşkeran digeriyan. Di zemanê me de jî, li welatan digerin da ku leşkerên wan bikaribin şer bikin.’
**(Montesquieu)**

* ‘Bi awayeke baş derbaskirina demên vala,
berpirsiyareke mezin e.’
**(George William Russel)**

* ‘Zagoneke gerdûnî heye û ev zagon, zagona edaletê ye. Edalet, bingeha esasî û resen a hiqûqa neteweyekê ye.’
**(Alexis de Tocqueville)**

* ‘Divê ku sê tişt, li cem miroveke têgihiştî hebin. Ew jî hêza ramanê, hêza îradeyê û hêza dil in.’
**Ludwig Andreas Feuerbach**

* ‘Bihêlin, bila sibêroj rastiyan bibêje û hemû mirovan bila li gor berhem û serkeftinên wan binîrxîne. Bila roja me ya îroyîn ya wan be, lêbelê siberoja ku min ji bo wê kedeka mezin daye ya min e.’
**(Nikola Tesla)**

* ‘Tiştê ku pêdiviya me pê hebû, bi tenê evîn bû.’
**(Bob Marley)**

* ‘Mirovê ku sûcekî efû dike, ew esîl e. Encax, mirovê ku bikaribe lêborîna xwe bixwaze ew esîltir e.’
**(Alphonse Daudet)**

* ‘Lehengên min,
ew mirov in ku xeyalên xwe ti caran ne firotin e.’
**(Natalia Oreiro)**

* ‘Mirovên ku we nasnakin û wisa bêşert û merc we diecibînin, bi heman awayî dikarin ji we nefretê jî bikin.’
**(Marilyn Monroe)**

* ‘Ji layê yek miroveke ve, şirovekirina temamiya xwezayê gelekî zor e û heta mirov dikare bibêje ku ev yek, ji bo serdemeke ve jî gelek zor e.’
**(Newton)**

* ‘Demokrasiya ku azadî lê tunebe, despotîzm e û azadiya bê demokrasî jî, ji bilî xeyalê ne ti tişt e.’
**(Octavio Paz)**

* ‘Trajediya herî mezin ya jiyanê ew e, ku em zû pîr dibin. Lêbelê, hişê me bi derengî tê serê me.’
**(Benjamin Franklin)**

* ‘Mirov ti caran, nikare bi temamî hemû tiştan fêr bibe.’
**(Hermann Hesse)**

* ‘Ji bo alimeke mirin destpêk e,
ji bo nezaneke jî dawî ye.’
**Mêrxas**

* ‘Erê, tiştên ku jiyanê xweş û geş dikin wisa bi hêsanî peyda nabin. Lê ya rast, hewqas jî ne biha ne:
hogirî, serbestî, fikirîn.’
**(Epîkuros | Raman)**

* ‘Bextewariya qelp, mirovan bêrehm û qure dike. Lê ev yek, ji bo yên din tiştekî nabêje. Bextewariya rasteqîn jî, mirovan dilsoz, nefsbiçûk û ziravbihistyar dike û ev yek, di nav mirovan de xweş belav jî dibe.’
**(Montesquîeu)**

* ‘Ez deyndarê wan mirova me ku her dem ji min re digotin <nexêr>, di jiyanê de ji bo xwe min çi kiribe, min bi saya serê wan kiriye.’
**(Albert Einstein)**

* ‘Êşên min, çavkaniya hêzdariya rihê min in.’
**(Rene Descartes)**

* ‘Ji bo bextewariya xwe,
divê em bextewariya hemû mirovan biparêzin.’
**(Bertrand Russell)**

* ‘Divê hûn rêveberiyeka ku bêedalet e, bi edaletê hilweşînin û bi destên bêxwîn, derkevin pêşiya girseyan.’
**(Mahatma Gandhî)**

* ‘Heke hûn nikaribin hezbikin yan jî hûn ne xwediyê ti hestên evînî bin, hûn çi bikin bikin; hizkî li pey pirraniya xwedayan herin, beşdarê pirraniya xwepêşandanên civakî bibin, alîkariya belengazan bikin, beşdarê siyasetê bibin, pirtûkan binivîsînin, hûn dîsa jî miroveke mirî ne. Heke evîn tune be, pirsgirêkên we herdem dê zêdetir bibin. Lê heke evîn hebe, hûn dikarin her tiştî bikin û wê demê hûnê bikaribin pirsgirêkên xwe çareser bikin. Çimku evîn, cewherê dilpakiyê ye.’
**(Jiddu Krishnamurti)**

* ‘Mirovên baş ew mirov in, ku em ji kena wan hezdikin.’
**(Dostoyevskî)**

* ‘Ji zagonan zêdetir, mezintir û firehtir, tiştekî ku rê li niheqiyên mezin vedike çi heye gelo?’
**(Montaigne)**

* ‘Kapîtalîzm, çeteya fermî ya karbidesta ye.’
**(Al Capone)**

* ‘Rewşa mirovî ya tenêtiyê, ez im.’
**(Nietzsche)**

* ‘Îhtîşama ku bi xêra dewlemendî û delaliyê tê bidestxistin, berdemî ye û bi rihetî dikare ji holê rabe. Belam erdem, serwetek bêhempa ye û zindebar e.’
**(Sallust)**

* ‘Hemû şerên cîhanê, ji aliyê dizên tirsonek ve têne destpêkandin ku ew bi xwe ji şer direvin û xortên xwe, ber bi qada şer ve dahf didin.’
**(Emma Goldman)**

* ‘Peyva evînê, di naveroka xwe de du wateyên cuda dihewîne, ku ne tenê cuda ne, heta ku mirov dikare bibêje ku dijber in jî. Yek tê wateya têkiliyê û ya din jî, di wateya çêbûnê de ye. Dema ku evîn dikeve rewşa têkiliyê, ew êdî êsîrtî ye. Çimku di vê rewşê de, mirov li benda hindek tişta ne û daxwazên wan hene. Xeyalên herdu aliyan jî têk diçin û herdu alî jî hewl didin ku serwerê têkiliyê bin. Ev yek, êdî rewşeke xeternak e û têkiliyeke ne dirust e.
Belam evîna ku weke çêbûnê ye, ew cihêreng e. Wateya wê bi vegotineke sade, hezkirin e. Di vê yekê de, ti têkiliyeke dernaxê holê. Evîn, weke bêhna kûlîlkekê ye. Ew naxwaze ku tu tevgerên xwe bidewsînî, veşêrî yan jî tevgerên ji rêzê nîşan bidî. Ew ti tiştî ji te naxwaze, ew bi tenê parve dike. Dema ku parve dike jî, ne li benda ti tiştî ye, ne li benda xelat û diyariya ye. Çimku xelat, parvekirin bi xwe ye.’
**(Osho)**

* ‘Mirovên ku alîkariya mirovên din dikin û feydedar in, ew mirovên herî bêhempa ne.’
**(Sophokles)**

* ‘Çavkaniya evînê başî ye, ya dabeşbûnê derhişî û ya bilindbûnê jî, mantiq e.’
**(Mêrxas)**

* ‘Li jiyana xwe, xwedî derkevin.
Ma ji bilî wê, çiyê we heye?’
**(Henry James)**

* ‘Bextewarî, xwedîtiya başiyê ye. Baş, ew tişt e ku hemû kes wê dixwazin. Baş a herî bilind, ji tevlîheviya zanayî û kêfê pêk tê ku tevlîhevî jî, li gorî pîvana a spehî û rastiyê çêdibe. Erdem; aheng, rastî û rêkûpêkiya rih e. Xirabî jî, xirabûna vê rêkûpêkî û ahengê ye. Mirov çiqasê xwedîerdem be, hewqas azad e. Lewra, rihê miroveke wiha; ji aliyê aqlê xwe ve tê kargerandin. Ji ber ku aqlê wî serwer e ew miroveke xwedîerdem e, bextewar e, xwedîpîvan û dilaram e. Ew mirovê ku êsîrê bengîniya xwe ye jî bedbext, beredayî û ne aram e.’
**(Platon| Eflatûn)**

* ‘Ya girîng ew e ku mirov,
xeletiyên xwe bibîne û wan sererast bike.’
**(Mehmûd Xoce| Pola Hababamê)**

* ‘Hinek mirov hewl didin da ku bikaribin jinan fam bikin. Hinek jî zêdetir bala we didin mijarên hêsantir, wekî dozîneya rolativîteyê.’
**(Albert Einsteîn)**

* ‘Jiyan, di navbera vê dinyayê û di ya din de ne tenê pirek e, ew bi serê xwe jî hêjahiyek e.’
**(Francesco Petrarca)**

* ‘Xwe fêrî vê rastiyê bikin: Evîna we çiqasî mezin be, dê êşa we jî hewqasî mezin be.’
**(Spînoza| Etica)**

* ‘Bi tenê, dijminên mirovan têne bîra wan. Belam, tiştê ecêb ew e ku dostên xwe her dem ji bîra dikin.’
**(Anton Çehov)**

* ‘Qedexekirin û tabû çiqasî zêde bibin, dê xelk jî hewqas feqîr bibin. Çiqasî çekên hêzdar zêde bibin, wê tevlîhevî jî hewqasî zêde bibe. Çiqasî asta zanînê zêde bibe, wê tiştên balkêş jî hewqas zêde bibin. Zagon çiqasî zêde bibin, dê hejmara dizan jî hewqas zêde bibe.’
**(Lao Tzu| Dazanîn)**

* ‘Derewên herî mezin,
pirî caran bi dengnekirinê têne gotin.’
**(Robert Louis Stevenson)**

* ‘Nezanî, herdem heman tiştî dubare dike; tiştekê ku pê nizanibe, dibejê ku ew tişt tewşikî ye.’
**(Tolstoy| Şer û Aştî)**

* ‘Misogeriya tekane, di zanayiya erdemê de ye. Mirov, dikare erdemê fêr bibe. Ji ber nezaniyê, mirov xerab in. Erdem jî, xwenasîna mirov e.’
**(Sokrates)**

* ‘Têgihiştin, destpêka hezkirinê ye.’
**(Baruch Spînoza)**

* ‘Ez ji mirovên tirsnezan hez dikim.
Lê ne bes e ku mirov hostayê şûr be. Divê mirov bi hêla derbeya xwe jî bizanibe.’
**(Nietzsche)**

* ‘Êş, perçeyeke jiyanê û mezinbûnê ye. Û ji bîra nekin, dema ku meseleyek êşê bide we, bizanibin di rihê we de tiştek hatiye dewsandin. Bihêlin bila êşa we, we biêşîne. Bila êşa we, we baş biêşîne ku birîna we bi temamî vebe. Heke birîna we carekê bi temamî vebe, wê demê dê baş bibe. Na heke hûn ji êşa xwe birevin, wê demê êşa we dev ji we bernade û herdem, dê we biêşîne.’
**(Osho| Li Ser Êşê)**

* ‘Mirov, dişibin dilopên baranê. Hinek, li ser hariyê dibarin û hinek jî, xwe berdidin ser rûpelên gulan.’
**(Mewlana Celaledînê Rumî)**

* ‘Tu nikaribî bifirî, bibeze. Ger tu nikaribi bibezî, bi rê ve here. Ger tu nikaribî bireve herî, xwe kaş bike. Tu çi bikî bike, lê divê ku tu bi pêş ve heri.’
**(Martin Luther King)**

* ‘Ger tu rabî û bibêjî ku <*ez bi serê xwe tenê ma dikarim çi biguherînim?*> bi vê yekê bizanibe ku ev helwesta te çewtiyeke mezin e.’
**(Edmund Burke)**

* ‘Divê ku em bi guman, dest bi baweriyeke bikin.’
**(Stanislaus Joyce)**

* ‘Ji ber gunehên xwe, mirov nayên cezakirin. Belam, ji aliyê gunehên xwe ve têne cezakirin.’
**(Thomas Hubbard)**

* ‘Li giyana xwe, miqate bin û bala xwe, baş bidinê. Ji bo vê yekê, ti caran ne zû û ne jî, dereng e.’
**(Epikuros)**

* ‘Di naveroka hemû tiştan de delalî heye,
lê hemû kes wê nabînin.’
**(Konfiçyûs)**

* ‘Em gelek zû çewtiyên xelkê dibînin.
Belam dema ku dor tê çewtiyên xwe, em kor dibin.’
**(Galenos)**

* ‘Ez ti rastiyan, ji xwe venaşêrim û çavên xwe ji bo wan nagirim. Bi vê yekê, ez dilşad im. Ma ez ê çima çewtiyên xwe biçûk bibînim?’
**(Seneca)**

‘Derew karekî zêhnî ye, rastgotî jî wêrekî.
Heke zêhna te têra derewan neke, tu jî wêrekiya xwe nîşan bide û rastgo be.’
**(Vîctor Hugo)**

* ‘Mirov dema ku ji karekî hez bike û wî karî bike, qet naweste û vejena mirov jî xelas nabe.’
**(J. W. von Goethe)**

* ‘Cil û berg çawa ku mirovan ji sermayê diparêzin, sebir jî me ji heqaretan diparêze. Her ku serma zêdetir dibe em xwe zêdetir li cilên xwe radipêçin, da ku serma zererê nede me.  Di rojên reş û teng de baş sebir bike, da ku nikaribin dilê te biêşînin.’
**(Leonardo Da Vincî)**

* ‘Mirovên ku li ser siberoja xwe nefikirin û siberoja xwe plan nekin, herdem dibin perçeyeke planên xelkê.’
**(Philip A. Robbins)**

* ‘Çewtî, ne xerab in, rastnekirina wan jî ne xerab e.
Tiştê xerab, veşartina wan e.’
**(Bertolt Brecht)**

* ‘Mirovbûna xwe herdem bînin bîra xwe, hûn tiştên mayî ji bîra bikin jî tişt nabe.’
**(Manîfestoya Russell–Einstein| 1955)**

* ‘Mirovên ku bi xêra dewlemendiyê çavên wan vedibin, dişibine meymûnan. Weke meymûnan xwediyê marîfeta ne. Di derbekî de, dertêne serê daran û mirov, dibe heyranê wan. Belam dema ku dertêne serê daran, êdî bi tenê livokên wan yên şermalûdî xwiya dikin.’
**(Honore De Balzac)**

* ‘Xeyal û rasteqînî, di pêşbirkekê de ne. Xeyal herdem li pêş in, lê di dawiyê de rasteqînî bi ser dikevin.’
**(Oscar Wilde)**

* ‘Ji rabirdûyê, ders werbigre û roja xwe ya îroyîn bijî.
Ji bo siberoja xwe jî, hêvîdar be. Tiştê girîng herdem lêgerîn e, ne rawestin e.’
**(Albert Einsteîn)**

* ‘Encax bi rêya revê, meriv dikare evînê têk bibe.’
**(Fenelon)**

* ‘Bi hezkirinê re, jiyana meriv jî dest pê dike.’
**(Shakespeare)**

* ‘Bi tenê, mirovên ku xwediyê kulturekê ne ji fêrbûnê hez dikin û mirovên nezan jî, hewl didin da ku dersan bidine me.’
**(Edouard Le Berquier)**

* ‘Heta ku mirov azad nebe, bextewar jî nabe.’
**(Dante Alighieri)**

* ‘Delalî li xweşê mirovên diçe, jîrîtî, keyfa mirovan tîne û ziravbihistyarî jî, coşiyê dide mirovan.
Belam, tiştê ku mirovan nêzîkê hevdu dike û hevkariyê diafirîne jî, qencî ye.’
**(La Rochefaucauld)**

* ‘Ji ber tirsa berpirsiyariyê, ji fikirînê û ji ber tirsa rexneyê jî, ji axaftinê netirsin.’
**(W. Shakespeare)**

* ‘Bilindahiya dîwar ne ji ber jîrîtiya hosteyê dîwar e, ji ber nezaniya koleyê ku li ber siya dîwar radizê ye.’
**(Mêrxas)**

* ‘Mirovên ku hatine perwerdekirin, beriya her tiştî qiymetê didin edaletê. Mirovên perwerdebûyî di dema bêadaletiyê de, heke bi wêrekî tevbigerin dibin mirovên serhildêr. Lê mirovên ji rêzê di dema bêdaltiyê de, dema ku bi wêrekî tevdigerin dibin rêbir.’
(**Konfiçyûs)**

* ‘Ger tu ne wêrek bî, pirs neke.’
**(Mêrxas)**

* ‘Em dewleta xwe, ji bo bextewariya pirraniyê ava dikin. Nexwe, armanca me ne ew e ku em çîneka civakê ji ya din bextewartir bikin.’
**(Platon| Dewlet)**

* ‘Di zagonên edaletê de jî,
bêguman hêleka bêadalet heye.’
**(Montaigne)**

* ‘Şert û mercên jiyanê, bi tenê bi vedîtinên zanistî baştir nabe. Ev yek, zêdetir girêdayê pêkhatina bandêreke jiyanê a ehlaqî ye.’
**(Albert Einsteîn)**

* ‘Çareserî ne êrîş e, hembezkirin e.’
**(Osho)**

* ‘Mirovan,
êşên giran dîtin û ji bêgaviyê, kenê îcad kirin.’
**(Nietzsche)**

* ‘Mirov, hema wisa bêrawest behsa bextreşiya xwe dikin. Heta carinan wan dinepixînin û dixemilînin jî. Gelek caran, wan xirabtir nîşan didin. Çima gelo? Çimku tiştekî ku ê wenda bikin tune. Lê mirov, gelek zû hînê tiştên naskirî dibin û naxwazin ku ji wan veqetin. Tekane tiştê ku pê dizanin bextreşî ye, ev yek jiyana wan bi xwe ye. Tiştekî ku dê wenda bikin tune, lê ji wendakirinê jî ditirsin.’
**(Osho)**

* ‘Platon di dewleta xwe de, ji mirovên ehmeq û yên ku xwediyê giyaneke lawaz in re nîqaşê qedexe kiriye. Miroveke ku hê nizane dê çawa bi rê ve here, dê çawa bi we re derkeve lêgerîna rastiyan?
Ma wateyeka vê yekê heye gelo?’
**(Montaigne| Ceriban)**

* ‘Bi çavên birçî li dilşadiyê negere,
belam ji dilşadiyê jî netirse.’
**Lao Tzu| Dazanînên Nenas**

* ‘Hemû tişt, heta niha hatine gotin.
Lê ji ber ku tu kesî guhê xwe nedane wan, dive carekê din ji nû ve werin gotin.’
**(Andre Gide)**

* ‘Li cem mirovan hêjahî û wateya erdemîtiyê, ji av û agir mezintir e. Min bi çavên serê xwe dîtiye ku mirov ji ber birêveçûna ser avê û agir mirine, lê min ne dîtiye ku yek ji ber erdemê miriye.’
**(Konfîçyûs| Raman)**

* ‘Azadî, weke avê qîmetdar û jêneger e û heke tu bala xwe baş nediyê, dê biheriqe here.’
**(Octavio Paz)**

* ‘Bextewariyê ne li dereka din, di dilê xwe de bigerin. Çavkaniya aramî û bextewariyê ne li derve ye,
di dilê me de ye.’
**(Lev Tolstoy)**

* ‘Dema ku ez zaro bûm, ez ji serê tirban gelekî ditirsiyam û min vê yekê, rojekê ji diya xwe re go.
Diya min jî her dem digo, ‘lawo ne ji miriyan; lê ji zindiyan bitirse.’ Niha ez baş têdigihêjimê ku diya min, weke her car rast digo.’
**(Cemal Sureya)**

* ‘Ti caran ji bo xemgîniya mirovan, xwe xemgîn neke!
Ji bîr neke, heke tu bikaribî li dijî êşan rawestî, ew jî dikarin rawestin.’
**(Bob Marley)**

* ‘Tiştê ku bi navê sebebê vejiyînê tê nasîn, di heman demê de sebebekî pirr xweşik yê mirinê ye jî.’
**(Albert Camus)**

* ‘Yekî ji min pirsî: 'Tu zilamekî aqilmend î, ma çima tu ne dewlemend î?' Min jî go: 'Tu jî dewlemend î, lê tu çima ne aqilmend î?'
**(Jacque Fresco)**

* ‘Jin, ji bo evînê ji her tiştî re amade ye. Ji bihevşabûnê re jî. Mêr jî ji bo bihevşabûnê, amade ye ku her tiştî feda bike. Heta hezkirinê jî.’
**(Paulo Coelho)**

* ‘Evîneke kevin, bi tenê bîranînek e. Evîneke ku hê ne hatiye jiyîn, bi tenê daxwaz û xewnek e. Lê em dikarin evîneke ku rasteqîn e, îro û a niha bijîn.’
**(Gandhî)**

* ‘Gotinên mirov, divê wekî dilopên baranê bin û wisa hêdî hêdî xwe berdin guhên xelkê. Gotin divê mirovan nexeyîdînin, dilop dilop vebêjin û bi ziravbihistyarî hezbikin.’
**(Mewlana Celaledînê Rûmî)**

* ‘Hinek têkçûn, carinan rêyên nû ji mirovan re vedikin û hinek serkeftin jî, carinan rê li ber mirovan digirin.’
**(Pascal Bruckner)**

* ‘Ez naxwazim ku zarok bigirîn.
Bila ewr bigirîn, Lê bila zarok negirîn,
Û bila yek ji wan jî bêkes û sêwî jî nemîne.’
**(Ataol Behramoglu)**

* ‘Di dilekî de heke pêbawerî hebe,
wê di wî dilî de evîn û dilsafî jî hebe.’
**(H. Balzac)**

* ‘Felsefe, zanyariya hêman û sedemên pêşîn e.’
**(Arîstoteles)**

* ‘Zêr, bi agir û mirov jî, bi zehmetiyan têne ceribandin.’
**(Seneca)**

* ‘Carinan hêvî û carinan jî hinek tiştên ku em ji wan hêvîdar in, me dixapînin. Jiyan, bi destekî dide me û bi destê din jî distîne.’
**(Arthur Schopenhauer)**

* ‘Laşê jinekê bike du perçe,
nîvê wê dayîk e û nîvê din jî, zarok e.’
**(Cemal Sureya)**

* ‘Ger tu mirovan darizînî,
ji bo hezkirinê dê wextê te nemîne.’
**(Jesus Christ|Hz. Îsa)**

* ‘Tiştê herî xirab ya ku dikare were serê neteweyekê bêdengiya felsefî, zanistî û edebî ye.’
**(Mehmed Uzun)**

* ‘Heta ku mirov bedbext nebin,
bedbextiya xelkê fam nakin.’
**(Dostoyevskî)**

* ‘Ya hebîbî, ya muradî ya meta qelbî- murîd
Key xilas ez dozexê hicrê to yabem ahi çun
Her nefes dared sela û ne'reyê hel min mezîd’
**(Melayê Cizîrî)**

* ‘Mirov dema ku hişyar in, di nav cîhaneke hevpar de ne. Lê di xew de, hemû mirov cîhana xwe ya taybetî dijîn.’
**(Plutharkos| Piştî Zayînê 46–125)**

* ‘Sebebê piraniya pevçûn, pêşdarazî û dijminatiyan, ziman e. Tu tu be, herdem hay ji zimanê xwe hebe.’
**(Şems-î Tebrîzî)**

* ‘Rastî, ez ne mirovekî çêrok im.
Lê periyên min yên îlhamê, qehpik in.’
**(Can Yucel)**

* ‘Tu carî, ji miroveke ku ne li ser sozê xwe ye,
bawer neke.’
**(W. Shakespeare)**

* ‘Di welatê koran de, yekî bi yekçavî dibe qral.’
**(Desiderius Erasmus)**

* ‘Li cîhanê mirove herî xeternak,
ehmeqeke xwedîarmanc e.’
**(Ji fîlmê A Time to Kill| 1996)**

* ‘Çi were serê te bila were, qet reşbîn nebe. Hemû derî û derge werin girtin jî ‘Ew’ şiverêyeke vedike.’
**(Şemsê Tebrizî)**

* ‘Li welatekî ku tu kes nikaribe bibêje ev reş e an jî ev spî ye, li wî welatî ronahî vedimire û azadî jî dibe êsîriyek dilxwaz.’
**(Albert Camus| Mirove Serhildêr)**

* ‘Heke hûn mirovekê ji hêla ehlaqî ve perwerde nekin û bi tenê bala xwe bidine perwerdeya zêhnî, dê ew mirov bibe bela serê civakê.’
**(Theodore Roosevelt)**

* ‘Çewtî ji bo mirova ye, lê divê jêbira te beriya pênusa te xilas nebe. Ger rewş wiha be, wê demê ev yek tê wê wateyê ku çewtiyên te pirr in.’
**(John Jenkins)**

* ‘Ne dîn, ne jî kor im.
Ne kerr ne jî lal im.
Bextewar im û tu tiştî ji te naxwazim ey felek.
Bila nan erzan be,
Û bila bedelê jiyana mirovan jî wusa ne erzan be, bes e.’
**(Resul Hamzatov)**

* ‘Jiyan, ne doza evînê ye û ne jî doza nan e. Jiyan, berxedana mirovahiyê û mirovnayînê ye.’
**(Che Guevara)**

* ‘Erê me fam kir;
tiştê ku birînê baş dike ne zeman e, evîn e.’
**(Can Yucel)**

* ‘Mirovên ku diçin,
Jiyan carekê din wan bi paş ve venagerîne,
Û dema ku te wenda kiriye jî nade te.
Yan tu ê hemû tiştan di dema xwe de bijî,
Yan jî tu ê negirî.’
**(Tolstoy)**

* ‘Heke rojekê te berê xwe da peravê
Û te xwe di bêserûbinaya heşinahiyê ji bîr kir,
Mirovên ku li dijî pêlên behrê rawestiya ne bîne bîra xwe.
Silavê li wan bike bi hestyarî,
Lewra wan li dijê ba û bahozan li ber xwe dabûn.
Di şerekî bêeman de,
Û beriya ku di kûrahiya bêserûbiniya hêşinahiyê de wenda bibin, ji dûr ve bendera keştiyan nîşanî te dan.’
**(Pierre Jeanne de Beranger)**

* ‘Kesên ku gotinên wan tunebin,
yan diqîrin yan jî hêrs dibin.’
**(Konfiçyûs)**

* ‘Ma ji bo ku tu rast tevbigerî, pêdiviya te bi tirsê heye? Ma ji bo ku tu xwe baş hîs bikî, pêdiviya te bi tehdîtan heye? Ma divê ku tu ji cezakirinê bitirsî?’
**(Nietzsche)**

* ‘Zarokên ku mirî hatine dinyayê!
Zarokên hemû bajarên mirî, yên ku her sibeh beriya ku bizanibin bi kû ve diçin; diçin ser kar,
Yên ku êvaran beriya ku bizanibin ji kû dertên; ji kargehan dertên,
Jiyaneke ku jê heznakin dijîn, karekî ku jê heznakin dikin,
Bi mirovên ku ji wan hez nakin re dijîn,
Yên ku ji ber gerembola jiyanê tu tiştî hîs nakin,
Yên ku di mala xwe de weke ku di gorê de ne radikevin,
Yên ku şevên xwe bi laşeke biyanî re derbas dikin!
Yê ku ji bo we; vê jiyana mirî amade kiriye, çîna serwer e.
Û heta ku hûn destûrê bidine wan, dê ev yek bidome.’
**(Maksim Gorkî)**

* ‘Madem tu nikarî hemû kesî bikî dostê xwe, wê demê tu jî bi dijminên xwe re fêrî vejiyînê bibe.’
**(Alexis de Tocqueville)**

* ‘Bi rêya rastgobûnê, hevalên we pirr zêde nabin.
Belam, dê herdem hevalên we hebin.’
**(John Lennon)**

* ‘Kesên ku bi tiştekî nizanibin, ew nezan in.
Lê kesên ku dizanin û nabêjin jî, ew bêehlaq in.’
**(Bertolf Brecht)**

* ‘Dewlet, şîdeta xwe bi navê hiqûqê bi nav dike û ji ya şexsan re jî, dibêje ku <sûc> e.’
**(Max Stirner)**

* ‘Çûkên ku di qefesan de têne dinyayê,
wisa difikirin ku firîn nexweşiyek e.’
**(Alejandro Jodorowsky)**

* ‘Mirovê ku di desta yekemîn de lêborîna xwe dixwaze, ew wêrek e. Mirovê ku efû dike, hêzdar e. Mirovê ku zû ji bîra dike jî, mirovê herî bextewar e.’
**(Osho)**

* ‘Ger we bedelê tişteke nedabe,
hûn nikarin baş jê bitehmijin.’
**(Eddi Anter)**

* ‘Ger niyeta te guherandina dinyayê be,
ji ya xwe dest pê bike.’
**(Eddi Anter)**

* ‘Dema ku hemû peyv diqedin,
destpêka têgihiştina mirovan dest pê dike.’
**(Jerzy Lec)**

* ‘Li welatekî dadwer, feqîrî şerm e.
Li welatekî bêdad jî, dewlemendî şerm e.’
**(Konfiçyûs)**

* ‘Tu kes nikare bibe xwediyê jiyanê û jiyanê di nav lepên xwe de bijdîne. Heke tu dixwazî ku ew bila bibe ya te, destên xwe veke.’
**(Osho)**

* ‘Nizanin wê çi bikin ji xwe, ji ber vê yekê li ser dîwarên xwe bextewariya mirovên din diresmînin û herdem pêdiviya vê yekê hîsdikin. Min bibexşînin dostên hêja, ez xwediyê wê wêrekiyê me ku li ser dîwarê xwe bextewariya xwe biresmînim.’
**(Friedrich Nietzsche)**

* ‘Ger tiştên ku tu wan dibînî ne li gor dilê te bin,
sûcê neynikê çi ye?’
**(Nikolai Vasilevich Gogol)**

* ‘Kesên ku xwediyê kêm tişta ne, koletiya wan jî kêm e. Her bijî feqîriya min a esîl.’
**(Friedrich Nietzsche)**

* ‘Tiştekî ku tu ji xwe re veşêrî, bi demê re wenda dibe. Heçku tiştên ku tu wan didî xelkê, ew herdem yên te ne.’
**(Axel Munthe)**

* ‘Dadgerekê ku ceza neke,
di dawiyê de dibe hevalê kûjeran.’
**(Goethe)**

* ‘Heke kurd, xwe bi xewn û xeyalên vala bixapînin û li zimanê xwe xwedî dernekevin û zimanê xwe, wekî rih û şanaziya hebûna xwe nebînin, siberojeke tarî li benda zimanê kurdî ye.’
**(Mehmed Uzun)**

* ‘Xwelî li serê wan mirovan be, ku gunehên wan gihêjtiye heta qirikê û ligel vê yekê, şîretan li xelkê dikin.’
**(Pavlus)**

* ‘Heta tu xweliya xwe berhewa nekî,
ne li benda alîkariya bayê be.’
**(Mêrxas)**

* ‘Mirov nikare zimanê xwe yê dayikê hilbijêre û ne xwediyê serbestiyeke bi vî rengî ye. Lê herdem, li hemberî zimanê xwe yê dayikê xwediyê berpirsiyariyekê ye.’
**(Mehmed Uzun)**

* ‘Tekane wateya dinyayê, mirov e û ji bilî vê yekê, wateya tiştekî din tune. Ger em bixwazin ku dilêrîna xwe ya jiyanê rizgar bikin, divê em mirovan rizgar bikin.’
**(Albert Camus)**

* ‘Yek tê û tu, dibî weke xwe û yek jî tê, tu dibî yeke din.’
**(Şemsê Tebrizî)**

* ‘Di dawiya şer de em têdigihêjine wateya wê.’
**(H. N. Brailsford)**

* ‘Hinek bi gunehên xwe û hinek jî,
bi meziyetên xwe bilind dibin.’
**(W. Shakespeare)**

* ‘Go, ji dijminê xwe hezbike û min jî, ji xwe hezkir.’
**(Xelîl Cibran|Khalil Gibran)**

* ‘Heke tu bixwazî ku bizanibî di rabirdûyê de tu kê yî, li rewşa xwe ya niha mêze bike. Û heke tu bixwazî ku bizanibî di siberojê de tu dê bibî çi, li kirinên xwe mêze bike.’
**(Gautama Buddha)**

* ‘Siûda mirov her tiştî bide mirov jî; ji bo ku mirov têbigihêje tehma wan, pêdivî bi rih heye. Lewra tiştê ku mirovan bextewar dike ne xwedîtiya tiştan, tehmgirtin/çêjgirtin e.’
**(Montaigne| Ceriban)**

* ‘Ne hedê te ye ku tu rêwitiya giyana mirovan bidarizînî. Serkeftin, yan jî têkçûnên mirovan te eleqeder nake. Tu hay ji xwe hebe û bizanibe ka tu kê yî.’
**(Neale Donald Walsch)**

* ‘Di jiyana xwe de, herdem rastiyan bibêje û biparêze.
Dibe ku tu kes malavahiyekî nede te, lê qet nebe dê wujdana te rihet be.’
**(Che Guevara)**

* ‘Heke neteweyek, çavên xwe ji tevgerên bênamûs, bêşeref û bêheysiyet yên desthilatdaran re bigre û ji diziyên wan re tiştekî nebêje, dê ew netewe erdema xwe wenda bike. Neteweyê ku erdema xwe wenda bike, dê welatê xwe jî wenda bike.’
**(Niccolò Machiavelli)**

* ‘Mey xelas dibe sakî dimîne,
Hemû reng diçilmisin xakî dimîne,
Îcazetname nezaniya meriv kêm bike jî,
Di haveyna meriv de kerîtî hebe, baqî dimîne.’
**(Fuzulî)**

* ‘Hinek caran divê mirov dûr bibe, ji bo ku bikaribe nêzîk bibe. Hinek caran divê mirov bîne bîra xwe, ji bo ku were bîra hinekan. Hinek caran divê mirov bigirî, ji bo bêhnfirehiyê. Hinek caran divê mirov hiş be, ji bo ku bikaribe seh bike.’
**(Şemsê Tebrîzî)**

* ‘Ji kok, şop û axa xwe veneqete. Ew di vê jiyana me ya xirab û bêçare de, çavkaniyên bextewariya me ne.’
**(Mehmed Uzun)**

* ‘Heta ji destê we were, ji mirovên ku xewn û xeyalên we biçûk dibînin, dûr bisekinin. Mirovên ku xwediyê ruhekê biçûk in, ew dixwazin ku we jî biçûk û kêm bikin.’
**(Mark Twain)**

* ‘Ji bo ku ez bikaribim li hemberî mirovan rûmet û rêzdariya xwe biparêzim û wenda nekim, ez ji wan dûr dimînim.’
**(Dostoyevskî)**

* ‘Baweriya xwe bi xewn û xeyalên xwe bînin,
siberoj ya we ye.’
**(Epiktetos)**

* ‘Nezanên sedsala 21ê, ne mirovên ku bi xwendin û nivîsandinê nizanin in. Yên ku fêr nabin, ji bîr nakin û nikarin carekê din ji nû ve fêr bibin, nezanên sedsala me bêguman ew in.’
**(Alvin Toffler)**

* ‘Dev jê berde guh nedê, afiraner heye. Zen neke ku wê, zilma zaliman ji wan re bimîne. Jana mezlûman, şahan ji text tîne xwar. Wextê her tiştî heye.’
**(Yunus Emre)**

* ‘Ji birînên xwe şerm nekin, bila kesasên we şerm bikin.’
**(Can Dundar)**

* ‘Ez carinan bivênevê ji xwe re wiha dibêjim; gelo vêga rojgera me, ne tîmarxaneya vê gerdûnê be?’
**(Goethe)**

* ‘Zarokatiya mirov, welatê mirov e.
Pirr dijwar e, bextewariya miroveke ku zarokatiya xwe têr ne jiya be. Wezifeya dê û bavan ya herî girîng ew e ku rê û pergaleke biafirînin, da ku zarokên wan zarokatiya xwe têr û tijê bijîn.’
**(Dogan Cuceloglu)**

* ‘Hêza xwe ne li dijî belengazan,
li dijî zaliman bikar bîne.’
**(Hacî Bektaşê Welî)**

* ‘Wujdan, Xwedayê di dilê mirov de ye.’
**(Victor Hugo)**

* ‘Zêhn, her tişt e. Hûn çi bifikirin, hûn ê bibin ew tişt.’
**(Siddhartha Gautama)**

* ‘Berê, em bi tiştên biçûk zû bextewar dibûn. Piştra, bi navê evînê tiştekî xistin serê me û me, nema xwe bi serhev ve da.’
**(Yilmaz Guney)**

* ‘Kena min, karkirên şixûlgiran in û êşa min vedişêrin.’
**(Charlie Chaplin)**

* ‘Bi hemû trênên ku te wan dît, silavên xwe ji min re bi rê bike. Çawa be, hemû trên yên min in.’
**(Ji filîmê Trênên Adem)**

* ‘Mirov dikare li ser êşên biçûk biaxive.
Lê, êşên giran, lal in.’
**(Seneca)**

* ‘Jiyan, ji tiştên biçûk pêk tê.
Ger tu ji wan hez bikî, mezin dibin.’
**(Osho)**

* ‘Kesên ku bixwazin bi rastî jî bibin mirov, beriya her tiştî divê devê kûçikê nefsa xwe dadin.’
**(Sadiyê Şirazî)**

* ‘Edebîyata bêfelsefe kê çi dibêje bila bibêje, hilbereke xirpanî ye û felsefeya bêedebîyat jî, ji bilî belovokeke pirzanatiyê ne ti tişt e.’
**(Afşar Tîmuçîn)**

* ‘Dîrok şahîd e, gel û neteweyên ku ne xwediyê kitêb û kitêbxaneya ne li paş dimînin û tênagihêjine demê.’
**(Mehmed Uzun)**

* ‘Tu xwe beradayî li quretiyê girê didî. Zayina te, dilopek av e û mirina te jî, ma ne mistek xwelî ye?’
**(Şemsê Tebrizî)**

* ‘Ez dikarim îşev helbesteke xembar binivîsînim.
Min ji wê hezkir û wê jî demekê ji min hez kiribû.’
**(Pablo Neruda)**

* ‘Mirovên baş, ew kes in ku em ji kena wan hezdikin.’
**(Dostoyevskî)**

* ‘Derdê min, di dilê min de ye. Dê, xelk ji kû bizanibin?’
**(Weyselê Evîndar)**

* ‘Ez li xwe geriyam.’
**(Herakleîtos)**

* ‘Heta ji te were biqîre, bang lê bike. Tu çi bikî bike, tu bi mirovekê ku bêdeng e nikarî.’
**(Fringe)**

* ‘Ez bi qurbana wan mirovan bibim,
ku dil û gotina wan yek e.’
**(Hafizê Şîrazî)**

* ‘Medeniyet bi awayekî bêna,
zêdebûna pêdiviyên beredayî ye.’
**(Mark Twain)**

* ‘Ji tu tiştan şaş nebe. Heqîqet û mirov, durû ne.’
**(Amin Maalouf)**

* ‘Roj, li ser serê hemû mirovan hiltê.
Belam, bêhna gul û ya mirariyan cihê ye.’
**(Mewlana Celaledînê Rumî)**

* ‘Çi ecêb e newsa? Serkeftin, têra mirovan nake.
Herdem dixwazin, ku têkçûnên mirovên din jî bibînin.’
**(Gore Vîdal)**

* ‘Ez her tiştî fam dikim û ev yek, dê min bikûje.’
**(Fyodor Dostoyevskî)**

* ‘Miroveke rastgo, herdem zarok dimîne.’
**(Sokrates)**

* ‘Mirovên xweperest heta ku êşê nekşînin,
fam nakin dosto.’
**(Mêrxas)**

* ‘Wekî serxwebûn û azadiyê, ti tişt ne biqîmet e.’
**(Yilmaz Guney)**

* ‘Ziman, ol, nîjad û rengê wan çi dibe bila bibe mirovên baş, baş in.’
**(Hacî Bektaşê Welî)**

* ‘Ez nikarim, tiştekî fêrî ti kesî bikim. Ez bi tenê, dikarim alîkariya wan ya fikirînê bikim.’
**(Sokrates)**

* ‘Perwerdehî, bi rêya çirûskeke vêxistina agir e. Nexwe, perwerdehî ne ew e ku mirov rabe û bîdoneke vala dagire.’
**(Sokrates)**

* ‘Ti caran ji bîr nekin! Demokrasî, karekî perwerdehiyê ye. Ger hûn bi girseyên neperwerdekirî re demokrasiyeke ava bikin, ev yek dibe olîgarşî. Di rewşeke wiha de, demagog hasil dibin û ji demagogan jî, zorker dertên.’
**(Platon| Eflatûn)**

* ‘Mirovên ku hûn ji wan hez bikin, divê ew tiştinên baş li jiyana we zêde bikin. Hezkirin, tevgereke baweriyê ye. Mirovên ku baweriya wan kêm e, hezkirina wan jî kêm e.’
**(Erich Fromm)**

* ‘Dema êş tê ne yeko yeko, bi kiş û mal tê.’
**(Shakespeare)**

* ‘Ger beyî ku tu rêya xwe biguherînî bimeşî,
girîngiya birêveçûna te ya hêdî tune ye.’
**(Konfiçyûs)**

* ‘Li gor baweriya ehmeqan mirov ji hêla nîjadî, zayendetî, netewî, temen, statû, reng, ol û ziman ve, heşt beş in. Heçkû, ev bûyer hewqas jî ne komplîke ye. Bi hêsanî mirov dikare bibêje ku mirov du beş in: Mirovên qenc û yên xirab.’
**(albert einstein)**

* ‘Mirovên bêdeng, xwediyê aqileke bideng in.’
**(Stephen Hawking)**

* ‘Şertê sereke û jêneger ê hezkirinê, têgihiştin e.’
**(Abraham Maslow)**

* ‘Vê yekê jî binivîsîne dadger beg.
Tu kes nikare hêviyan kelemçe bike.’
**(Yilmaz Guney)**

* ‘Mirovên ku kêm fam dikin û pirr bawer dikin,
ew mirovên herî xeternak in.’
**(Anton Çehov)**

* ‘Hemû rojên xwe, weke ku roja we ya dawînî be bijîn.
Rojekê, hûnê mafdar derkevin.’
**(Steve Jobs)**

* ‘Hezkirina dayikan, bêşert û merc e û parêzkar e, stargehek germ e. Ji ber ku bêşert û bêmerc e, nikare were venihêrtin û bidestxistin.’
**(Erich Fromm| Hunera Hezkirinê)**

* ‘Di cîhanê de bêehlaqiya herî mezin,
weke amûreke bikaranîna mirova ye.’
**(Osho)**

* ‘Aştiya rasteqîn û aramiya dil ya kûr,
bi tenê di tenêtiyê de ye.’
**(Arthur Schopenhauer)**

* ‘Yan divê mirov bêdeng be,
yan jî divê mirov gotineke ji bêdengiyê qîmettir bibêje.’
**(Pisagor)**

* ‘Li wê dera ku polês zahf in serbestî,
Li wê dera ku leşker zahf in aştî,
Li wê dera ku parêzer jî zahf in, edalet tune.’
**(Lin Yutang)**

* ‘Mirovên nefsbiçûk, xwediyê şanaziyeke mezin in.’
**(Voltaire)**

* ‘Yên ku bi fikran nikarin,
êrîşê mirovên ku difikirin dikin.’
**(Paul Valery)**

* ‘Li vê dinyayê, gelek mirovên ku ne layîqê dîtina tîrêjên rojê ne hene. Lê roj, dîsa jî her roj hiltê.’
**(Seneca)**

‘Gelo meriv dikare bi pereyan bextewariyê bikire?
- Erê. Mesela meriv dikare pirtûkan bikire.’
**(La Edri)**

* ‘Dilê dayikan, dibistana zaroka ye.’
**(Henri Ward)**

* ‘Hemû cîhan, yek heyîn e. Hemû tişt bi benikên nexwiyakirî ve, girêdayê hevdu ne. Gunehên kesekê, nêxe stûyê xwe û dilê mirovên ku ji te zeîftir in nehêle. Ji bîr neke, êşa miroveke jî dikare hemû cîhanê biêşîne û bextewariya mirovekê jî, dikare dilê hemû mirovan xweş bike.’
**(Şemsê Tebrizî)**

* ‘Erê rast e, ez di çavkaniya her gotineka li ser ehlaq û erdemê de, li sextekariyeke digerim.’
**(Friedrich Nietzsche)**

* ‘Çi bextewar in yên ku ti caran ne hatiye dinyayê.’
**(Omer Xeyam)**

* ‘Mirov dema ku weke berê êdî nikarin we bikar bînin, dibêjin hûn gelekî hatine guhertin.’
**(Sigmund Freud)**

* ‘Ger hûn hestên xwe yên neyînî îfade nekin jî, ew ji holê ranabin. Bi tenê, hûn wan di dilê xwe de heps dikin. Hestên hepiskirî jî, mirovan nexweş dikin û rihê mirovan birîndar dikin.’
**(Neale Donald Walsch)**

* ‘Tekane tiştê baş zanayî ye û tekane tiştê xirab jî, nezanî ye.’
**(Sokrates)**

* ‘Non Fuı, Fuı, Non Sum, Non Curo
Ez berê tunebûm, niha heme.
Wê ez ê rojekê tune bibim, lê ne xema min e.’
**(Nivîsa li ser tirba Epîkûros)**

* ‘Li dinyayê tekane tiştê ku nikare were teqlîdkirin, wêrekî ye.’
**(Napoleon Bonoparte)**

* ‘Heke li cem te hewa,
ronahî û dost mabin, xeman nexwe.’
**(Johann Wolfgang Von Goethe)**

* ‘Mirovên serhişk, herdem ji xwe ewle ne û mirovên ku ji her tiştan ewle ne jî, herdem mirovên serhişk in.’
**(H. L. Mencken)**

* ‘Xwedayo!
Maleka ku bi pirtûk û kûlîklan tije ye, bide min.’
**(Konfiçyûs| B.Z. 551-479)**

* ‘Mirov, bi qasî hezkirina xwe efû dike.’
**(La Rochefoucauld)**

* ‘Dema ku gotin diqedin,
wê demê mirov ji hevdu fam dikin.’
**(Jerzy Lec)**

* ‘Mirov wiha difikirin, ku tenê ew bi heqîqetê dizanin. Lewma jî, zilimkariyê dikin.’
**(Bertrand Russell)**

* ‘Miroveke nefsbiçûk û dilsaf ji bo ku xelk jê bihezidin,
li cem xwe herdem kemasiyeke dihêle.’
**(Benjamin Franklin)**

* ‘Xeyal û rasteqînî, di pêşbirkekê de ne. Xeyal herdem li pêş in, lê yên ku bi ser dikevin rasteqînî ne.’
**(Oscar Wilde)**

* ‘Pirraniya wan nikarin ji zincîrên xwe, xwe rizgar bikin. Ligel vê yekê, azadixwazên dostên xwe ne. Divê tu amade bî ku di agirê xwe de bişewitî. Beriya ku tu bibî xwelî, ma tu çawa dikarî xwe nû bikî?’
**(Nietzsche | Zerdeşt Wiha Ferman da)**

* ‘Felsefe, bi meraqa jiyanê dest pê dike. Mirovên ku herî zêde jiyanê meraq dikin jî, zarok in.’
**(Arîstoteles)**

* ‘Zêdebûna zagonan, tê wateya kêmbûna edaletê.’
**(Cicero)**

* ‘Nexwe, werin em dinyayeke wiha biafirînin ku têde ti ferq û cudakeriyên olî, zimanî û neteweyî tunebin.’
**(Charlie Chaplin)**

* ‘Acizî û bêzariya mirovan ya ji hemû tiştan, nexweşiyeke nûjen e. Berê, ti kesan bi vê yekê nizanibû.’
**(Peter Petroviç Pietuh | Gogol)**

* ‘Û jiyan ma ne bi tenê ba, bi tenê asîman, bi tenê pelên daran û bi tenê tuneyî ye?’
**(Cesare Pavese)**

* ‘Ez ji mirovên ku belengaziya mirovên din dibînin û ji ber ku ew ne di wê rewşê de ne şikur dikin, nefretê dikim.’
**(Dostoyevskî)**

* ‘Ji bo ku bikaribin bigihêjin hezkarên xwe, baskan bide wan. Heke sebebên wan yên mayînê hebin, dê ew ê vegerin kokên xwe.’
**(Dalai Lama)**

* ‘Dil, miftekirî ne û mifteya wan, cihê ye. Tu zor bidiyê jî, tu nikarî bi nifteyeke çewt dileke rast vekî.’
**(Mewlana | Mesnewî)**

* ‘Ferman, fermana te ye. Lê, jiyîna xweşik jî li cem me ye.
Em hêjî, li ser hişê xwe ne ligel vî halê xwe yê serxweş.
Tu xwîna mirovan vedixwî, em ava tirî.
Hinekî însaf siltanê min, ka bibêje kîjan ji me xirab e?’
**(Omer Xeyam)**

* ‘Ez dikarim sozê bidime te, ku dê ez ê ji dil û can bim.
Belam, tu caran ez nikarim sozê alînegiriyê bidime te.’
**(Konfiçyûs)**

* ‘Ti tişt, wekî hêza we ya xeyalê ne azad e.’
**(Davîd Hume)**

* ‘Hêza berxwedanê ya mirovên ku azadiyê diparêzin,
ji zilimkaran zêdetir e.’
**(Malcolm X)**

* ‘Min fam nakin û bi min dikenin.
Ez ne ew devê li gor guhên we me.’
**(Friedrich Nietzsche)**

* ‘Ger hûn bixwazin ku aştiyê bînin cîhanê, wê demê siyasetvanan ji holê rakin bes e. Gelên cîhanê, dê li hev werin.’
**(Bernard Shaw)**

* ‘Mirov pirr zahf in, lê mirovahî pirr kêm e.’
**(Robert Zend)**

* ‘Şîreta herî baş ew e,
ku meriv bi xwe bibe mînakeke baş.’
**(Malcolm X)**

* ‘Çi bextewar in,
yên ku jiyana xwe emanetê tu kesî nakin.’
**(Fernando Pessoa)**

* ‘Gotina ‘Kurdistan ya kurda ye, welatê kurda ye’ wekî ku mirov bibêje derya warê masiya ye rast e, xwezayi ye û bêpirsgirêk e.’
**(Oya Baydar | Civaknas û Nivîskar)**

* ‘Nezanî, di destê çîna serwer ya xwedîimtîyaz de çekek e û ev çek, bi hostayî tê bikaranîn.’
**(Karl Marks)**

* ‘Heke hûn felsefeya şelandinê ji holê rakin,
wê demê dê felsefeya şer jî ji holê rabe.’
**(Fidel Castro)**

* ‘Hûn çiqasî kêm bizanibin,
hûn ê hewqasî bi tundî biparêzin.’
**(Bertrand Russell)**

* ‘Mirovên aqilmend, hevdu temam dikin. Mirovên ehmeq jî, hevdu xelas dikin. Axaftin, bi rêya ziman hunera bikaranîna aqilê mirovî ye.’
**(Seneca| Ethîca)**

* ‘Mirov yan ji tiştên ku xweziya xwe bi wan tînin, yan ji tiştên ku wan dihezidin û ji wan ditirsin, nefretê dikin.’
**(Machiavellî)**

* ‘Zarok, weke giya û temenmezin jî, weke bayê ne.
Ba ji kîjan aliyî rabe, giya jî xwe bi wî alî ve ditewîne.’
**(Konfiçyûs)**

* ‘Hemû tişt spehî ne, lê hemû kes wan nabînin.’
**(Konfiçyûs)**

* ‘Xatirxwestin, ji bo mirovên ku bi çavên xwe hezdikin e. Çimku mirovên ku bi dilê xwe hezdikin, ji hev xatir naxwazin.’
**(Mewlana Celaledînê Rumî)**

* ‘Mirovên xirab, ji tirsa xwe serî ditewînin. Belam mirovên baş jî, bi tenê ji bo ku hezdikin serî ditewînin.’
**(Arîstoteles)**

* ‘Di dilê mirovan de cihê ku hezkirin lê nema ye,
dojeh e.’
**(Dostoyevskî)**

* ‘Mirov dikarin ji her tiştî birevin,
lê nikarin ji dilê xwe birevin.’
**(Paulo Coelho)**

* ‘Çavkaniya malhebûnên mezin, sûcên mezin in.’
**(Honorê De Balzac)**

* ‘Di nav jinan de yên ku herî delal xwiya dikin,
jinên bextewar in.’
**(Audrey Hepburn)**

* ‘Ji bo dîtina poşmaniya te, ez ê li benda te bim.
Nexwe, ne ku ji bo vegera te.’
**(Bob Marley)**

* ‘Fikirîn, hêsan e. Tevgerîn, zor e.
Tevgerîna li gor fikrên xwe, ya herî zor e.’
**(Johann Wolfgang von Goethe)**

* ‘Mirovbûn û mirovmayîn, her diçe zehmettir dibe.’
**(Arthur Schopenhauer)**

* ‘Tu bi dîrokê nizanibî, nexwe tu nû hatiyî dinyayê. Heke tu nû hatibî dinyayê, çi çîrokên bixwazî dê rêveber ji te re bibêjin.’
**(Howard Zinn)**

* ‘Mirovê ku guh dide gotinan, seh nake.’
**(Nietzsche)**

* ‘Mirovek dema ku ne xwediyê wêrekiya vegotina ramanên xwe be, wê demê ditirse.’
**(Malcom X)**

* ‘Wateya tevgeran,
ji hevokan zêdetir e û bêtir dipeyîvin.’
**(Oscar Wilde)**

* ‘Ey stêrka geş û gewre! Yên ku tu wan rohnî diki tunebûna, wê demê tu ê çawa bextewar bibûyayî?’
**(Nietzsche)**

* ‘Hemû kes, bi kurdbûna min jî hesiyan. Lê ez ji vê yekê jî, şanaz im. Ji vê yekê xweştir jî tiştek tune.’
**(M. Alî Bîrand)**

* ‘Hinek dikarin rabin û ji te re bibêjin, ku tu xirab î. Qet guh nede wan. Ji min re jî digotin kêmaqil. Ez jî rabûm û min atomê perçe kir.’
**(Albert Einsteîn)**

* ‘Heke armanca we, zerer û ziyan be, pêdiviya we bi hêzê heye. Ji hemû tiştên mayî re jî, hezkirin bes e.’
**(Charlie Chaplin)**

* ‘Jiyan, sê beş e. Di beşa yekemîn de, em wiha difikirin ku wê em ê bikaribin cîhanê biguherînin. Di beşa duyemîn de, em têdigihêjinê ku em nikarin cîhanê biguherînin. Di beşa sêyemîn de jî, em êdî jê ewle ne ku dê cîhan me biguherîne.’
**(Jean Paul Sartre)**

* ‘Mirovên têgihiştî bextewar in, çimku di lêgerînê de ne. Lê yên ehmeq jî bextewar in, çimku haya wan ji tiştekî tune.’
**(Alexander Pope)**

* ‘Jiyan, zincîra kirûyên guhêrbar ya xwezayî ye.’
**(Lao Tzu)**

* ‘Heta ku bextewariyek birîndar nebe,
nikare li hemberî têkçûnan li ber xwe bide.’
**(Seneca | Nameyên Rewiştî)**

* ‘Rastgotî diyariyeke giranbiha ye,
mirovên erzan wî nadine we.’
**(Warren Buffett)**

* ‘Ger te ruhê xwe wenda kiribe,
tu bibî xwediyê cîhanê jî beradayî ye.’
**(Vîctor Hugo)**

* ‘Gotinên wekî <neteweperestiyeke baş tune, her cure neteweperestî xirab e, em li dijî hemû neteweperestiya ne, em li dijî neteweperestiya etnîkî ne, ne peywist e ku her koma etnîkî dewleteke xwe hebe,> ji bo xapandin û rêlibergitina tevgera kurdan hatine îcadkirin.’
**(Civaknas Dr. Îsmail Beşikçî)**

* ‘Weke jiyana malbatê, tu tişt ne xweşik e.’
**(Oscar Wilde)**

* ‘Xebat û hewldanên ji bo zarokan,
pîvanên ehlaqî yên civakê ne.’
**(Dietrich Bonhoeffer)**

* ‘Evîn, encax bi evînê û pêbawerî jî, encax bi pêbaweriyê dikare were pevguherandin.’
**(Karl Marks)**

* ‘Kurdistan, êdî ne Kurdistana berê ye. Lêkolînên derbarê dîrok û avahiya civakî ya Kurdistanê de, her roj zêdetir dibin. Ziman û çanda kurdan, çêtir tê têgihiştin. Di vê rewşa pêşveçûna zanistî de, gotinên <xayînên welêt hene, dixwazin ku Tirkiyeyê dabeş bikin, ev tişt, lêyîstokên dijminên ji derve ne...> û hwd. rewşeke pêkenînê ye. Çimku, a ku hatiye perçekirin û perçe bûye, Kurdistan e. Siyaseta perçe bike û bi rêve bibe, li ser neteweyê kurd hatiye sepandin. Hevkarên herî destbixwîn yên emperyalîzmê jî, kemalîst in.’
**(Civaknas Dr. Îsmail Beşikçî)**

* ‘Heke rêveberiya dewletan bi destê bênamûs û bêşerman ve were berdan, dê ew ê bibin bela serê mirovên qenc û dê xirabiyan bikin.’
**(Platon| Eflatûn)**

* ‘Zilamekî rûmetyar,
ti caran keviran navêje binê bîra ku avê jê vedixwe.’
**(Amin Maalof)**

* ‘Bi awayekî çavkor pêbaweriya desthilatdariyê,
dijminê herî mezin e.’
**(Albert Einstein)**

* ‘Mirove nezan beriya her tiştî, dijminê xwe ye.
Ew ê çawa bibe dostê xelkê gelo?’
**(Sokrates)**

* ‘Divê yek rabe û aştiyê bide destpêkandin,
wekî ku şerekî bide destpêkandin.’
**(Stefan Zweig)**

* ‘Di dawiyê de, dê hevokên dijminên me jî neyên bîra me. Em ê bi tenê, mirovên ku xwedêgiravî dostên me bûn bînin bîra xwe.’
**(Martin Luther King)**

* ‘Erê tu bersivên xwe jiber dikî,
lê jiyan heman pirsê dubare nake.’
**(Osho)**

* ‘Ger ramanên te bi rêkûpêk bin,
bêguman dê jiyana te jî wiha be.’
**(Lao Tzu)**

* ‘Ger tu ji dil yekê hembez bikî, tu afirandar î. Bi hezkirin, li mêzekirina yekê. Bi tenê, awireka bi hezkirin jî dikare jiyana mirovan biguherîne.’
**(Osho)**

* ‘Dema ku mesele prensîbên te bin, weke zinaran raweste. Lê heke mesele zewq bin, biherike û xwe pêve berde.’
**(Thomas Jefferson)**

* ‘Dema ku bayê guherînê radibe, ehmeq dîwaran lê dikin. Belam, aqilmend jî aşeka bayê ava dikin.’
**(Gotineke Çîniyan)**

* ‘Dema mirov li dijî zordest û xiraban dernekeve,
zêdetir har dibin.’
**(Lev Tolstoy)**

* ‘Siberoj ne dahatuya mirovên bêzar û bêxîret e,
ya mirovên bixîret û şervan e.’
**(Cicero – Zagon)**

* ‘Azadî, ne ew e ku mirov her tiştî bikaribe bike.
Azadî ew e ku mirov, xwe ji bêgavîtiyê rizgar bike û tiştên ku naxwaze jî neke.’
**(Rousseau)**

* ‘Binesaziya perwerdehiyê ya a niha, karê me bi me nade hezkirin. Bêtir, hezkirina serkeftinê fêrî me dike. Dawiya tevgerê, ji tevgerê girîngtir bûye.’
**(Jiddu Krishnamurti)**

* ‘Wiha li min mêze meke zaroko,
Ez dibêjim ku min bihuştê dît, dibêjin tu dîn î.’
**(Ahmet Tellî)**

* ‘Li vê dinyayê herî zêde ez baş dizanim têk herim.
Li hemberî dostan, dijminan û eşqê.’
**(Turgut Uyar)**

* ‘Tiştê herî dijwar ew e ku mirov xwe nexapîne.’
**(Ludwig Wittgenstein)**

* ‘Divê herkes, carekê dojeha xwe bijî.’
**(Cesare Pavese)**

* ‘Ruhê mirov çiqasî vala be, parastina hevsengiya wê jî hewqas dijwar e û di bin zordestiya yekemîn de, gelekî zû dipelçiqe.’
**(Montaigne)**

* ‘Dilê mirov çiqasî pakij be,
mirov ji xelkê hewqas hindik tiştan dixwaze.’
**(Schopenhauer)**

* ‘Bila jiyaneke te ya sade hebe,
da ku yên mayî jî bikaribin bijîn.’
**(Mahatma Gandhî)**

* ‘Şerê ku di navbera çînên civakî de diqewime,
dîrok bi xwe ye.’
**(Karl Marks)**

* ‘Mirovekê ku bi tenê ye, her derê weke çolekê dibîne.’
**(Anton Pavlovic Çehov)**

* ‘Wekhevî ne qelsî ye, zanyarî ye.
Ji başbûnê, hevqas jî netirsin.’
**(Şukru Erbaş)**

* ‘De ka hebekî hiş be!
Ger tu hema wisa bênaver bipeyîvî, tu tişteke nabihisî.’
**(Gotineke Çermesoran)**

* ‘Di temamiya jiyana xwe de, tu dikarî bibî her tişt.
Lê ya girîng, di jiyanê de mirovmayîn e.’
**(Şemsê Tebrîzî)**

* ‘Piştî ku min mirovan naskir,
min ji heywanan bêtir hezkir.’
**(Arthur Schopenhauer)**

* ‘Ji bo şivanan bûyera herî seyr û nexweş, quretiya kûçikên wî yên ku li ber pez in. Kûçikên ku ji bo parastina pez hatine perwerdekirin, dema ku ji ber birçîtî yan jî, ji mişwereke xirab xirabiyê bi berxikan re bikin, ew êdî ne kûçikên keriyê pez in, ew zêdetir dişibine guran.’
**(Platon| Dewlet)**

* ‘Her serê sibehan, bi qêrînî we hebûnatiya kurdan diyariya tirkan kir.’
**(Mehmed Uzun)**

* ‘Dema ez ji te hezdikim, ji hemû dinyayê hezdikim.’
**(Franz Kafka)**

* ‘Kurdistana Tirkiyeyê heye. Kurdistana Îranê heye.
Kurdistana Îraqê heye. Kurdistana Sûrî heye.
Çima Kurdistanek a Kurdan tune?’
**(Civaknas Dr. Îsmail Beşikçî)**

* ‘Hevgirtina dewletê û nedabeşbûna wê ya bi netewe û welatê xwe re, bi tenê dirûşmeyek e. Ev dirûşme, rasteqîniyan venabêje, beravajiya vê yekê wan reş û xira dike. Ev dirûşmeyeke wiha ye, ku rasteqîniyan serobino dike. Armanca vê dirûşmeyê ew e, ku rasteqîniyên kurd û Kurdistanê biveşêre. Heçku, Kurdistan welatek e. Kurd, netewe ne û welatê neteweya kurd, ji aliyê polîtîkayên emperyalîst û dagirker ve, hatiye perçekirin.’
**(Civaknas Dr. Îsmail Beşikçî)**

* ‘Ez dixwazim ku di rojên pêş de, li hemû saziyên kurdan peykerê Îsmaîl Beşikçî were danîn.’
**(Musa Anter| 1920-1992)**

* ‘Civak, alikariya mirovan dike da ku ew bikaribin jiyana xwe berdewam bikin. Lê ev yek, wiha dike ku mirov îxanetê li navajoyên xwe dikin. Hesta tawanbariyê, encameke vê lihevhatinê ye.’
**(Sigmund Freud)**

* ‘Heke mirov derkeve rêwîtiyek a ku dawiya wê hebe, baş e. Lê tiştê girîng, rêwîtî bi xwe ye.’
**(Lao Tzu | Tao Te Ching)**

* ‘Ferq û cihêtiyekê mezin, di navbera cihê ku em lê ne û cihê ku em dixwazin xwe bigihînin ê de heye. Lewma jî, em êş û azarê dikşînin û di tengasiyê de ne.’
**(Nietzsche)**

* ‘Mirovbûn, ne hêsan e. Bi taybetî jî, dema ku pergalekê civakî a ku mirovî bikaribe weke <mirov> têde bijî tunebe.’
**(John Steinbeck)**

* ‘Mirov çuqasî kûr bifikire,
dilnerehetiya mirov jî hewqasî zêdetir dibe.’
**(Albert Camus)**

* ‘Tu têkiliya elewîtiyê, bi îslamê re tune.’
**(Civaknas Dr. Îsmail Beşikçî)**

* ‘Li Tirkiyeyê dema ku kurd li dijî sepandinên nîjadperest, dagirker û paşvêrû derdikevin û nerazîbûnên xwe li dijî komkujiyan tînin zimên û xwedî li mafên mirovan, azadî û demokrasiyê derdikevin û koletiyê qebûl nakin, bi neteweperestî û şovenîzmê têne sûcdarkirin. Ev yek, şermeke mezin e. Heçku mesele, meseleya hebûna neteweyê kurd e.’
**(Civaknas Dr. Îsmail Beşikçî)**

* ‘Fikirîna li ser gotinan, ji poşmaniyê çêtir e.’
**(Sadiyê Şîrazî)**

* ‘Tu çi dikî, çawa dikî, tu bi qîma xwe yî.
Lê ji bo ku tu bikaribî bikenî, ti kesî negirîne û ji bo berjewendiyên xwe jî, ti kesî nefroşe.’
**(Balzac)**

* ‘Heke hûn bixwazin bextewar bijîn, divê armanceka jiyana we hebe û divê ku hûn, dilsozê armanca xwe bin. Ji bilî vê rastiyê, xwe bi ti tiştî ve girê nedin.’
**(Albert Einstein)**

* ‘Ma tu li aramiyê digerî? Kêm tişt, kêm mirov.’
**(Kafka)**

* ‘Ranezên, bi razanê re tiştek safî nabe.
Rabin, divê em biaxivin.’
**(Nietzsche)**

* ‘Ez çewtiyên xwe naparêzim û girseyan, nadim dû xwe. Ez ê rastiyan bibêjim û jiber vê yekê ez bi tenê jî bimînim, ne xem e.’
**(Mahatma Gandhî)**

* ‘Hay ji gotinên xwe hebin. Mirov sûretan ji bîr dikin, lê gotinan weha zû bi zû ji bîra nakin.’
**(Louis Aragon)**

* ‘Heke evîn cihêrengiyê qebûl neke,
wê demê li dinyayê çima dê cihêrengî hebin?’
**(R. Tagore)**

* ‘Mirovên ku ji bo ti tiştî ne xwedîwêrek in,
bila ji bo ti tiştî hêviyê jî nekin.’
**(Friedrich Schiller)**

* ‘Hinek mirov, carinan mirov in.’
**(G. Bernard Shaw)**

* ‘Kurd û Kurdistan ne girêdayê xwestek û îradeya me ne, objektîf û rasteqîn in. Bi biryarên dadgeh û dadgeran, nikarin werin tunekirin yan jî afirandin.’
**(Civaknas Dr. Îsmail Beşikçî)**

* ‘Dema ez rûyê mirovan ê dinê dibînim,
rûyê wan ê berê êdî nayên bîra min.’
**(Paul Auster)**

* ‘Ez naxwazim ku bawer bikim,
dixwazim bizanibim.’
**(Carl Sagan| Stêrnas)**

* ‘Li Geliyê Zîlan (1930), li Dêrsimê (1937-1938), li Geliyê Sefo (1943), jenosîdên mezin pêk hatine. Çapameniya Kemalîst jî dibêje ku ‘Geliyê Zîlan, bi cendekên mirovan dagirtî bû. (Rojnameya Cumhuriyetê, 16 Temûz 1930)
Ligel vê yekê kurd, bi Geliyê Zîlan, bi Jenosîda Dêrsimê û bi Komkujiya Geliyê Sefo nizanin. Belam, haya wan bi temamî ji terora Îsraîl ya li Sebra û Şatîlayê pêk tîne, heye. Sebebê nêzanîna kurdan ya bi jenosîdên ku li ser civaka wan hatiye kirin û xemsariya wan, kêmasiya **‘**hestên netewî**’** ye.’
**(Civaknas Dr. Îsmail Beşikçî)**

* ‘Axaftin, pêdiviyek e. Belam, dengnekirin huner e.’
**(Konfiçyûs)**

* ‘Dem, nivîskarekê herî baş e.
Herdem, dawiyeke bêhempa dinivîsîne.’
**(Charlie Chaplîn)**

* ‘Armanca me, gihêjtina yên qedexe ye. Felsefeya min jî, bi vê şîarê rojekê dê bi ser bikeve. Çimku weke rêzikekê, heta a niha bi tenê rastiyan qedexe kirine.’
**(Nietzsche)**

* ‘Hewl nede da ku bikaribî bibî zilamê rojaneyî, bibe zilamê heqîqetê. Çimku roj diguhere, lê heqîqet neguhêrbar e.’
**(Mewlana Celaledînê Rûmî | Mesnewî)**

* ‘Xizmeta nemerdan neke,
weke mêşan xwe li ser çapeliyan daneyne.
Du rojan careke, hema nanekî bixwe, ma wê çi bibe?
Xwîna dilê xwe vexwe, lê serî netewîne.’
**(Omer Xeyam)**

* ‘Dema ku we xwest bizanibin ka kê desthilatdar e û hikumranê we ye, wê demê bi tenê lêbigerin ka hûn nikarin kê rexne bikin?’
**(Voltaire)**

* ‘Hezkirin, çi hevokeke dirêj e.’
**(Cemal Sureya)**

* ‘Ez bibêjim, bêfeyde ye. Ez nebêjim jî, dilê min diêşî.’
**(Fuzûlî)**

* ‘Li wê dera ku hezkirin tunebe, li aqil jî negere.’
**(Dostoyevskî)**

* ‘Beriya ku tu biaxivî li ser axaftina xwe bifikire,
da ku piştî axaftinê tu li ser nefikirî.’
**(Shakespeare)**

* ‘Civaka ku ji aliyê zanyaran ve neyê rohnîkirin, bêguman ji aliyê sextekaran ve tê xapandin.’
**(Marquis de Condorcet)**

* ‘Yê ku hûn lê mêze dikin, ez im.
Lê tiştê ku hûn dibînin, hûn in.’
**(Jacques Rigaut)**

* ‘Bawerî û ola herî baş, xweşdîtin e.’
**(Victor Hugo)**

* ‘Li hemberî dijminekê çeka herî baş, dîsa dijminek e.’
**(Nietzsche)**

* ‘Tiştên ku tu dicivînî na,
lê tiştên ku tu parve dikî yên te ne.’
**(Yunus Emre)**

* ‘Bila dilê mirov paqij û pak be, bila mirov ne tekûz be.’
**(H. Jackson Brown)**

* ‘Bi navê aştiyê tiştek heye, di rih û dilê me de.’
**(Sharon Stone)**

* ‘Heta ku em ji şiyan/qudretê bêpar in, em azadiyê dixwazin. Dema em xwedîşiyan in jî, wê demê jî em raseriyê dixwazin. Lê dema ku em bi ser nakevin, wê demê jî em edaletê dixwazin.’
**(Friedrich Nietzsche)**

* ‘Ez rê û fersendê nadim ti kesî, ku rabe bi piyên xwe yên kirêt di mejiyê min de bigere.’
**(Mahatma Gandhî)**

* ‘Bi belavkirina gotinên rast, ramanên rast zêdetir dibin.’
**(George Orwell)**

* ‘Ger hûn nikaribin zarokên xwe baş xwedî bikin û ji bo wan derfetên perwerdehiyê pêkbînin, nexwe zarokan neynin dinyayê. Zarok, ne toximê zewqê ne.’
**(Sokrates| Apologîa)**

* ‘Stargeha herî dawî ya bêkêriyê, şidet e.’
**(Isaac Asimov)**

* ‘Ger bextewariya te di destê mirovekê din de be,
nexwe pirsgirêkeke te ya mezin heye.’
**(Aldous Huxley)**

* ‘Ji bo guhêrandina cîhanê,
çeka herî hêzdar perwerdehî ye.’
**(Nelson Mandela)**

* ‘Çapemeniya serbest, dibe ku xirab an jî baş be. Belam serbestî tunebe, bêguman dê ew ê xirab be.’
**(Albert Camus)**

* ‘Zêhn ne sîtileke ku were dagirtin,
ew agirek e û divê were vêxistin.’
**(Plutarkhos)**

* ‘Ger tu bixwazî ku xelk ji te re baş bin, tu jî ji wan re baş be û beriya wan tu baş tevbigere.’
**(David Hume)**

* ‘Bala xwe baş bide mirovan, bi taybetî jî yên ku nêzîkê te ne. Lewra tevgerên mirovan weke nexweşiyên têger in û zû belav dibin.’
**(Shakespeare)**

* ‘Xîret, bêhemta ye. Ez ne ji ber ku zîrek im, bi ser dikevim. Tenê, ez dest jê bernadim loma bi ser dikevim.’
**(Albert Einsteîn)**

* ‘Pirr zêde siberojê meraq neke, bi awayeke bêgav dê ew ê were. Lê li ser serboriyan baş bifikire, çimku ew dê ji aqilê te dernekevin.’
**(Balzac)**

* ‘Li dinyayê, esaleta herî kevin tenêtî ye.’
**(Friedrich Nietzsche)**

* ‘Em hê fêrî jiyana vê dinyayê nebûne,
em li jiyana rojgerên dinê dipirsin.’
**(Aldous Huxley)**

* ‘Raman, bi tahde û zordestiyan nayên tune kirin. Ger hûn bala xwe nedine wan û wan girîng nebînin, encax ew wê demê dikarin ji holê rabin.’
**(Ursula K. Leguin)**

* ‘Dikarin îşkenceyê li min bikin, yeko yeko hestuyên min bişkînin û heta dikarin min bikujin jî. Ez ê serî netewînim û ew ancax dikarin bibin xwediyê cendekê min.’
**(Mahatma Gandhî)**

* ‘Mirov her tiştî bi çav û ramaneke cihê dibînin.
Sedemê cihêrengiya fikran, bêguman ev yek e.’
**(Montaîgne)**

* ‘Dema ku hema wisa ez ji nişkave bi ser xwe ve hatim û min li hawirdorê xwe nihêrt, ez têgihiştimê ku ji bilî demê ti kes li cem min tune.’
**(Irvin D. Yalom | Dema Girîna Nietzsche)**

* ‘Ger li welatekî hemû kes bişibine hevdu,
ev yek tê wê maneyê ku li wî welatî ti kes tune.’
**(Michel Foucault)**

* ‘Te herdem li ber xwe da, lê tu têk çûyî. Bila be, dîsa li ber xwe bide. Dîsa têk biçe, baştir têk biçe.’
**(Samuel Beckett)**

* ‘Heta ku mirov biaqil nebe, ne rastgo û birehm be, mirov nikare bextewar bijî. Lê heta ku mirov bextewar jî nebe, nikare weke mirovekê biaqil, rastgo û birehm bijî.’
**(Epikuros)**

* ‘Zêhn, her tişt e. Hûn çi bifikirin, hûnê bibin ew.’
**(Gautama Buddha)**

* ‘Mirovên ku sûcekî dibexşînin, ew esîl in. Lê esîltirîn mirov, ew in ku lêborîna xwe dixwazin.’
**(Alphonse Daudet)**

* ‘Li gorî baweriya min, pirsgirêka bingehîn serbestî ye. Serbestî, ne serbestiya ji tiştekê ye, ger wiha be ew bi tenê bertekek e. Serbestî, ji vê yekê bi temamî cihêreng e. Ger, ez ji ber tirsê serbest bim, ev tişteke din e. Serbestiya ji ber tirsê, bi tenê bertekek e û meriv dikare bibêje ku nîşaneka wêrekiyê ye. Lê ez behsa serbestiyekê wiha dikim, ku ne bertek û ne jî girêdayê tiştekê ye an ji tiştekê ye. Ji bo vê yekê jî, bêguman têgihiştineke kûr divê.’
**(Krishnamurtî)**

* ‘Jar, herdem edalet û wekheviyê dixwazin.
Heçku, yên hêzdar ti caran bala xwe nadine vê yekê.’
**(Arîstoteles)**

* ‘Ez li dijî şîdetê me. Lewre, qenciyên ku bi xêra şîdetê têne bidestxistin berdemî ne. Lê xirabiyên ku şîdet wan bi xwe re tîne, mayende ne.’
**(Mahatma Gandhî)**

* ‘Girtîgeha herî mezin, mejiyê miroveke nezan e.’
**(Michel de Montaîgne)**

* ‘Baskên ramanan hene, kes nikare rê li ber wan bigire.’
**(Îbnî Ruşd)**

‘Û pirî caran xwe li ber çavên te şîrîn dikin, lê bizanibe ku ev yek ji berê ve xasûkiya tirsoneka ye.
Belê, tirsonek xasûk in.’
**(Nietzsche)**

* ‘Herî zêde, em ji mirovên ku dişibine me hezdikin.’
**(Moliere)**

* ‘Sê celeb arîstokrasî hene; ya yekemîn temen û qidem e, ya duyemîn serwet e û ya sêyemîn jî aqil û zanayî ye. Lêbelê, ya herî rûmetdar a dawînî ye.’
**(Arthur Schopenhauer | Aforîzma)**

* ‘Li wê dera ku hiqûq bêhêz dibe,
hiqûqa hêzdaran dest pê dike.’
**(Maurice Duverger)**

* ‘Dengê bêdengiyê jî heye,
lê bo sehkirina bêdengiyê dil divê.’
**(Şemsê Tebrizî)**

* ‘Kurd û Xwedê dişibin hev. Herdu jî bêşirîk û bêkes in.’
**(Şêrko Bêkes)**

* ‘Di gerdûnê de hemû tişt, xwedîarmanc in. Ti tişt û ti kes, seyr nîn in û ne pîşadî ne. Bi tenê, tiştên ku em tênagihêjine wan hene.’
**(Marlo Morgan)**

* ‘Civak her ku qerebalix dibe, rezilî jî lê zêde dibe.’
**(Arthur Schopenhauer)**

* ‘Mirovekê namerd, zikreş û heta yekê dîn jî dikare bibe qral. Belam, yên ku bi rastî jî dikarin bibin mirov, gelekî kêm in.’
**(Jean-Jacques Rousseau)**

* ‘Perwerdehiya rasteqîn, fêrbûna fikirînê ye.’
**(Krishnamurtî)**

* ‘Sebebên bextewariya malbatê:
Evîn, daxwaz, hurmet, dilsozî û sebr in.’
**(Mewlana Celaledînê Rumî)**

* ‘Di evîndariyê de spasdarî, xwîngermî û yekîtî heye.
Heke tu wan sê hestan hîs bikî, wê demê tu hezkar î.’
**(Osho)**

* ‘Li dinyayê, herî zêde bi gotina ehmeqan dikin. Jiber vê yekê jî, ne hewce ye ku tu xwe xemgîn bikî û bibêjî ku 'min fêhm nakin.’
**(Oscar Wilde)**

* ‘Hemû tişt, bi sebebekî pêk tên.
Heke pêk neyên, ev yek jî jiber sebebekî ye.’
**(Arnon Grunberg)**

* ‘Mirovên ku li ber xwe didin, dibe ku bi ser nekevin. Lê yên ku li ber xwe nadin, ew di serî de têk çûne.’
**(Bertolt Brecht)**

* ‘Kesên ku ramanên xwe neguherînin,
ew nikarin ti tiştan biguherînin.’
**(Bernard Shaw)**

* ‘Heke dil kor be, çav bi kêrî tiştekî nayê.’
**(Hz. Elî)**

* ‘Lewnê mirinê yê herî xirab, mirina dil e.’
**(Oscar Wilde)**

* ‘Li kawîşa me, kalemêrekî kurd hebû. Li ser milê wî, nivîseke kurdî hatibû nivîsandin. Haya ti kesî, hê ji vê nivîsê tunebû. Lê wî dixwest ku bixiroş, xwe ji vê nivîsê xilas bike. Çareyekî dîtibû. Bi gîzanê çermê xwe şekitand, di xwînê de ma û wê nivîsê jêbir. Dema ku ez wiha çav pê ketim, ez lerizîm. Ez li ser kûrahiyên êş û tirsê, gelekî ponijîm. Kalemêrê kurd ku berê kaçaxiyê kiriye, merivekî bêtirs î çavsor bû û ji bo debara xwe, gelekî li serê çiyayên bitepink maye û gelek caran ji mirinê filitî ye. Lê a niha zimanê wî yê dayikê, ji bo vî mirovî bibû çavkaniya herî mezin ya tirsê.’
**(Mehmed Uzun| Bîranînên Girtîgehê)**

* ‘Dojeh, ne ew der e ku em li wir êşê dikşînin. Dohej ew der e, ku ti kes bi êşa me nahise.’
**(Mensûrê Xellac | Mensûrê Hallacvan)**

* ‘Ji bo kedxwarinê, bêrawest behsa asîmanan dikin.’
**(Maximilien Robespierre)**

* ‘Ji ber sedemên nîjadî û rengê bedenê, tu kes raser nabin. Lêbelê, mirovên ku dilê wan pajij e û aqilmend in, ew raser in. Mirovên raser, alikariya yên jar dikin û wiha jî raser dibin.’
**(Robert Ingersoll)**

* ‘Dema deriyekî dilşadiyê tê girtin, deriyekî nû vedibe. Lê ji ber ku çavê me bi deriyê kevin ve zeliqî dimîne, em nema deriyê nû dibînin.’
**(Helen Keller)**

* ‘Felsefe ew e ku mirov, her dem li ser rê be û bicîh nebe. Çimku, ew serpêhatieyeke bêrawest e. Felsefe, bêcih û bêwarbûn e. Felsefe, koçertiyeke xedar e, ti carî nikare xwe bigihîne mala xwe. Felsefe, lêgerîn e û tiştê ku lê digere nebîne jî, ti car ranaweste. Felsefe, nikare xwe bigihîne heqîqetê û dê, herdem di vê rewşê de be.’
**(Karl Jaspers)**

* ‘Heke feylesof neyên ser kar yan jî bi felsefeyê nizanibin, derd û êşên me ti caran xilas nabin.’
**(Platon| Dewlet)**

* ‘Ez naxwazim, ku wekî tu kesî bijîm û bifikirim. Jiyaneke bi vî rengî, min aciz dike. Divê ez bibim wekî xwe bim. Û xwe, ji têgeh û tevgerên ku ji layê mejiyên demîngirtî ve hatine hilberandin rizgar bikim.’
**(Michelangelo Buonarrotî)**

* ‘Di gerdûnê de xwepêşandana herî mezin,
venasîna aqil e.’
**(Sigmund Freud)**

* ‘Dudilî, aciziya herî mezin e.’
**(Alaîn)**

* ‘Çima ez ê li vê dinyaya bêmane,
resmên bimane biresmînim?’
**(Pablo Picasso)**

* ‘Ti mifte, derge û zirze,
nikarin rê li ber azadiya aqilê min bigirin.’
**(Virginia Woolf)**

* ‘Zimanê min! Tu hem serweta min î û hem jî, bobelata min. Tu hem dilşadiya min î û hem jî belayê serê min î.’
**(Mewlana Celaledînê Rumî| Mesnewî IV)**

* ‘Karekî dijwar e ku mirov bikaribe ji hiş, xwe xilas bike. Lê ew ne mebestek e, têgihiştin û bîrbiriyeke kûr e.’
**(Osho)**

* ‘Armanca desthilatdariyê ya pêşîn,
afirandina laşên stûxwar e.’
**(Michel Foucault)**

* ‘Ger hûn ji bêgaviyê bixwazin ku mirovekê ji bîra bikin, nelezînin. Çimku yên ku aqil wan bêwext dikuje, ew di dilê mirovî de şopên kûr dihêlin.’
**(Paul Auster)**

* ‘Bêhêvî nebe, roja xwe bijî û ji rabirdûyê ders werbigire. Tiştê girîng, pirsyarîkirin e, ne rawestin e.’
**(Albert Einstein)**

* ‘Heke li derekî agirek vêketibe û mirovek rabe banga îbadetê li te bike, bizanine ev bang ya miroveke xaîn e.’
**(Alî Şerîatî)**

* ‘Ger zivistanê bigota ku <bihar, di dilê min de ye.> kê jê bawer dikir?’
**(Xelîl Cibran)**

* ‘Kevir hêşîn nayê, nûbihar derbas bibe jî. Ka bibe ax, tu ê wê demê bibînî ku gul çawa dibişkivin. Tu berê kevir bûyî û te dilê gelekan hişt. Bibe ax, da ku gulên xweşik li ser te bibişkivin.’
**(Mewlana Celaleddînê Rumî)**

* ‘Jiyana xwe wiha bijî, ku di dawiya jiyana xwe de tu bikaribî ji bo xwe li çepikan bixî.’
**(Sokrates| Dîalogue)**

* ‘Hinek dikarin rabin û ji were bibêjin ku wiha tevbigerin. Lê ti kes, nikare ji we re bibêje ku wiha bifikirin.’
**(Sokrat| Sokrates)**

* ‘Zarok û stemkar, divê di heman gerdûnê de nejîn. Yan divê stemkar bimirin, yan jî divê zarok neyên dinyayê.’
**(Che Guevara)**

* ‘Mirovên herî aqilmend ew mirov in,
ku dizanin bi çi nizanin.’
**(Sokrates)**

* ‘Rastgo bin! Bila peyvên we, weke tîrêjên rojê rasterast xwe berdin dilê we.’
**(Eşîra Chiricahua | Cochise)**

* ‘Mirov jî, dişibine daran. Ew çuqasî bixwazin ber bi ronahiyê ve bilind bibin, hewqasî jî rehê xwe berdidine axê; ber bi jêr ve, ber bi şevereşan, ber bi kûrahî û xirabiyê.’
**(Friedrich Nietzsche)**

* ‘Di jiyanê de gelek tiştên hêja hene, ku mirov dikare ji bo wan bijî. Çend tiştên ku mirov dikare ji bo wan bimire jî hene. Belam, tiştekî ku hêjayî kuştinê ye, tune.’
**(Tom Robbins)**

* ‘Ger tu ne amede bî, ma kê dikare te bextewar bike?’
**(Nietzsche)**

* ‘Xanîyekî biçûk ê li gorî dilê te û hevjînekê xisletdar, hêjayî hemû zêr û inciyên li dinyayê ne.’
**(Goethe)**

* ‘Erdem herçuqasî neyê têgihiştin jî, veşartî namîne. Beravajiya vê yekê, elametên xwe li hawirdor belav dike. Hemû kesên ku şayanê erdemê ne, dê ji şopên wê ew binasin.’
**(Seneca)**

* ‘Mirovên ku dilsafiya zarokatiya xwe ti caran wenda nakin, ew mirovên gewre ne.’
**(Mencius)**

* ‘Ji bo dîtina stêrkan, pêdivî bi tariyê heye.’
**(Osho)**

* ‘Mirovahî ne pênaseyeke fizikî ye, armancek giyanî ye. Lewma jî ti kes wê nade we, divê ku hûn ew bidest bixin.’
**(Richard Bach | Aforîzma)**

* ‘Heqîqet bi serê xwe tenê, ne pîroziyek e.
Tiştê pîroz, lêgerîna heqîqetê ye.’
**(Friedrich Nietzsche)**

* ‘Di zimanê sohbetê de nêr û mê tune,
Hemû tiştên ku Xweda afirandî ye li cihê xwe ne,
Di nezera me de ferqa mêr û jinan tune,
Di nêrîna te de ye xeletî û kêmasî.’
**(Hacî Bektaşê Welî)**

* ‘Bîrdoziya fermî îşlikeke dîna ye,
ku li Tirkiyeyê kirine.’
**(Mehmed Uzun)**

* ‘Dem, zarokek e û li peravê, bi kevirokan dileyîze.’
**(Herakleîtos)**

* ‘Mirovên ku ditirsin li şewqa rojê binihêrin, bi awayekî bêgav dê ew ê li ber siyê bimînin û dê wiha bizanibin ku sî, şewq e.’
**(Şemsê Tebrizî)**

* ‘Dibe ku hûn nexwazin wan bibînin, lê rasteqînî dê herdem hebûnatiya xwe bidomînin.’
**(Huxley)**

* ‘Dewletên ku xirabiyê li hemwelatiyên xwe dikin û mafên gelê xwe naparêzin, bi demê re ji holê radibin.’
**(Platon| Dewlet)**

* ‘Tirs, koletî ye.’
**(Platon| Dewlet)**

* ‘Ewilî, stranan gulebaran kirin. Dûre, tîqetîq û çivîkan.’
**(Adnan Yucel)**

* ‘Dil dikim ku dilê te biramisim,
ji ber ku tu ji min hez dikî.’
**(Hozan Neçarî)**

* ‘Di evînê de, ji dil û di dostaniyê de jî, mirov ji piştа xwe derbeyan dixwe. Êşa dil baş dibe, lê mirov her wisa piştxûz dimîne.’
**(Mevlana Celaledînê Rumî)**

* ‘Kesên ku dixwazin bibin her tişt,
ew nikarin bibin ti tişt.’
**(Schopenhauer| Aforîzma)**

* ‘Erê, ez fêrî dîtinê dibim. Rast e, min nû dest pê kiriye û ez, zêde jî ne serkevtî me. Lê tiştê ku ji destê min were, dê ez ê texsîr nekim.’
**(Rainer Maria Rilke)**

* ‘Ma tu dibêjî ku Xwedê ji qaliteya rengê çav,
ol û zimanan diziye?’
**(Saian Sakulta Salkim)**

* ‘Divê ez dîsa berê xwe bidim tariyê, roj bêhna min teng dike. Bêhêvî bûm, wekî heywanekî ku riya xwe şaş kiriye; ez bi hemû hêza xwe beziyam û di hişê min de herdem heman raman: 'Xwezî, min kariba ew jî bi xwe re bibira!' û dijraman: 'Dera ku ew lêye, ma ew der tarî ye?' Tu ji min dipirsî, ka ez çawa dijîm: Jiyana min, bi vî rengî ye niha.’
**(Franz Kafka, Nameyên Ji Milenayê re
Prag, 14 îlona 1920)**

* ‘Dema ku mirov tişteke pirr dixwaze,
zêde derewan dike.’
**(Jodi Picoult)**

* ‘Beriya ku ez herim, ez ê şîretekî bidime te dîno: li dereka ku tu êdî nikarî hez bikî li wir nemînî, ji wir here.’
**(Nietzsche | Zerdeşt Wiha Ferman da)**

* ‘Parastina ziman, ol û kultureke ku di bin tehdîdê de ye, deynekî mirovahiyê ye.’
**(Mehmed Uzun)**

* ‘Ji ber ku dinya ne bêhempa ye, huner heye.’
**(Andrey Tarkovskî)**

* ‘Mirov ji bo ku bifikire,
bawer bike û hez bike, hatiye dinyayê.’
**(Montaîgne)**

* ‘Ev dinya, çiyayek e û tiştên ku em dikin jî, deng e. Deng, olan dide û dîsa xwe digihîne me.’
**(Mewlana Celaledînê Rumî | Mesnewî)**

* ‘Çi tiştên ku ez li wan geriyam, dijberên wan xwe gihandine min. Ez li rastiyê geriyam, min çewtiyê dît. Ez li dostê xwe geriyam, min dijminê xwe dît.
Dema ku min dest ji lêgerînê berda, ji rastî û çewtiyan wêdetir; min temamiya dîmenê dît. Ne rastî hebû, ne jî çewtî. Ne xirab hebû û ne jî qencî. Hemû tişt, li cihê xwe û weke xwe bûn.’
**(Virgina Woolf)**

* ‘Bihevşabûnek têr û xweşik, weke serhildaneke bû.’
**(George Orwell | 1984)**

* ‘Ji bilî mirovên hov,
hemû mirov di bin hikmê kitêban de ne.’
**(Voltaîre)**

* ‘Perwerdekirina mirovan,
girîng e û siberoja welateke jî, girêdayî vê yekê ye.’
**(Albert Einsteîn)**

* ‘Neteweyên ku zêhna nifşên xwe yên nû bi pirtûkan xwedî nekin, bi awayekî bêgav dê ji holê rabin.’
**(Ovîdîus)**

* ‘Mirovên ku ti caran nakevin gumanê, ew nikarin xwe bigihînin heqîqetê.’
**(Îmamê Xezalî)**

* ‘Mirovên bindest, heta hetayê bindest namînin û di dilê wan de, rojekê xwesteka azadiyê hêşin dibe.’
**(Martin Luther King)**

* ‘Heta em nekujin, wûjdana me dadgerekê rastgo ye.’
**(Balzac)**

* ‘Dema ku mirov fêrî jiyînê dibe, wê demê ya mirov dihezidin, dîn û har dibin. Lê dema ku mirov nizane ka dê çawa bijî, wê demê jî biçûk dibînin.’
**(Maksim Gorkî)**

* ‘Di mijarên tolhildan û evînê de jin, ji mêran hovtir in.’
**(Friedrich Nietzsche)**

* ‘Ji bo ku tu hatiyî dawiyekî negirî,
lê jiber ku tu jiyayî bikene.’
**(Gabriel Garcia Marquez | 1927-2014)**

* ‘Her hunermend, evîneke bextreş e û mirovên bextreş jî, dixwazin ku çîrokên xwe bibêjin.’
**(P. A. Loxias)**

* ‘Mirovên ku qenciyê bi xelkê re dikin,
ew mirovên herî gewre ne.’
**(Sophokles)**

* ‘Kesên ku bi aqilê xwe xwe dipesinînin, ew dişibin wan mehkûmên ku bi firehiya hucreya xwe pesnê xwe didin.’
**(Albert Eînsteîn)**

* ‘Ger tu bikaribî xwendinê bi mirovekê bidî hezkirin û çend pirtûkên ku bala wî bikşînin bidiyê, bêguman dê ew bibe mirovekê bextewar.’
**(Sir John Herschell)**

* ‘Ez hezar salan jî bixwînim, ez bi hedê xwe dizanim.’
**(Mevlana Celaledînê Rumî)**

* ‘Dema mirov tiştekî ku pê bawer e dike, qet naweste.’
**(Goethe)**

* ‘Wujdana sûcdaran, teqez dê heyfa bêgunehan hilîne.’
**(Jean Jacques Rousseau)**

* ‘Fîlozofên herî wêrek, zarok in. Fîlozofên wêrek jî, ji bêgaviyê her zarok dimînin û weke zarokan, bênavber pirsan dikin.’
**(Nicholas Berdyaev)**

* ‘Berê, ji bo heqîqetê mirov dimiriyan.
Lê niha, heqîqet di destê mirovan de dimre.’
**(Manly P. Hall**

* ‘Sê rêyên zanyariyê hene: Riya yekemîn fikirîn e, ku mirov dikare bibêje ya herî baş e. Ya duyemîn, zanîna sînorên xwe ye. Ya sêyemîn û ya herî êşdar jî, azmayîş e.’
**(Konfiçyûs)**

* ‘Dilovanî, mirovan baş dike. Çimku çavkaniya nexweşiyên mirovan, tunebûna hezkirinê ye.’
**(Osho)**

* ‘Ez dixwazim ku herdem weke xwe bim. Cirnexweş bim jî, divê ez wekî xwe bim. Keyfxweşiyê jî bide min, naxwazim bibim yekî din.’
**(Aldous Huxley)**

* ‘Ji bo bextewariyê, ti caran li benda dema amizger nemînin. Çimku bextewarî rêwîtiyek e, ne rawestgehek e ku mirovî xwe bigihîne.’
**(Konfiçyûs)**

* ‘Dema vala, diltengiya nezana ye.’
**(Arîstotales)**

* ‘Bi axaftinêrê re, tu zanînên xwe dubare dikî. Belam ger tu guhdar bî, tu ê tiştên nû fêr bibî.’
**(Dalaî Lama)**

* ‘Hemû olên ku li dinyayê hatine dîtin; ji bo nezanan bêhempa, ji bo siyasetmedaran kêrdar û ji bo fîlozofan jî, pêkenî ne.’
**(Lucretîus)**

* ‘Kralgeha min, qasî gerdûnê mezin û bêsînor e û xwestekên min jî, bêhed in. Ez her bi pêş ve diçim û beyî tirs, dilovanî, hezkirin û Xwedê, ez giyanan azad dikim û cîhanê dinirxînim. Navê min, zanist e.’
**(Gustave Flaubert)**

* ‘Kulîlkê, bersivand: Tu çuqasî ehmeq î, ma ji bo dîtinê ez dibişkivim? Na, ez ji bo xwe û zewqa xwe dibişkivim.’
**(Arthur Schopenhauer)**

* ‘Xweza, ji bo ciwanan hêz û ji bo pîran jî, hikmet e.’
**(Arîstoteles | Arîsto)**

* ‘Heke mirov bikaribe bibîne, dilê hemû tiştan heye.
Dilê çiya, zinar û robaran.’
**(Murathan Mungan)**

* ‘Em hemû, dîn têne dinyayê û hinekên me,
wiha dimînin.’
**(Samuel Beckett)**

* ‘Me biryara xwe dabû, ku dermanan bişeynin Efrîqayê. Belam, li ser wan wiha dinivîsand: divê ku bi zikê têr werin vexwarin.’
**(Charles Bukowskî)**

* ‘Serkeftîn rêwitiyek e, ne hedefek. Bextewarî, li ser riya te ye, ne li dawiyê rê. Ger li dawiya rê bûya bi xwegihandinê re, dê dem derbas bibûya û rê jî, dê biqediya. Heçku dema bextewariyê îro ye, ne sibê ye.’
**(Mewlana Celaledînê Rumî)**

* ‘Heqîqeta pîroz ya zanistê ev e: heqîqetek pîroz tune.’
**(Carl Sagan)**

* ‘Yekemîn zagona xwezayê, xweşdîtin e. Ger aqilê te bi hêrsa te nikaribe, ma tu jî mirov î?’
**(Voltaîre)**

* ‘Bi xeyala şewqê, kes nagihêje ronahiyê. Tiştê ku mirovan rohnî dike, têgihiştina tariyê ye.’
**(Carl Jung)**

* ‘Evîn anarşîst e, ji azadiyê hez dike.’
**(Romain Gary | Emile Ajar)**

* ‘Mirovên şanaz ew mirov in ku herdem bi hedê xwe dizanin, bi hûrbijarî pirsan ji xwe dikin, xwe biçûk dibînin û nefsbiçûk in.’
**(Dostoyevskî)**

* ‘Mîna kerê ne di bin bar de me,
Ne siwarê hêştirê me mîna begzadeyan,
Ne efendî me û ne jî kole.
Ji bo tiştekî ku tunebe xem jî naxwim.
Bêhna min rihet e, her nefes mîna imrekî ye.’
**(Şêx Sadiyê Şîrazî)**

* ‘Civak diguhere, mirov diguherin, dinya diguhere; belam ramanên qalibgirtî nayên guherîn.’
**(Ali Şerîatî)**

* ‘Heta ku edalet pêk neyê, dê nîzam jî tune be.’
**(Albert Camus)**

* ‘Nezanî, di destê çîna serwer de mîna çekekî ye û ji layê heman çînê ve, bi hosteyî tê bikaranîn.’
**(Karl Marx)**

* ‘Em bi awayekî pîsadî, ji perçe û piçikên stêrkan çêbûne, ku berê ew jî madeyên stêrka bûn û sar bibûn.’
**(Arthur Eddington)**

* ‘Beriya zimanê xwe, dilê xwe terbiye bike.
Peyv, ji dil tên û bi ziman der diçin.’
**(Mewlana Celaledînê Rumî)**

* ‘Destpêka felsefeyê, şaşwazî ye.’
**(Sokrates)**

* ‘Berzkirina dirûşmeya bijî Tirkiyeya Serbixwe dibe şoreşgerî. Lê gotina Kurdistana Serbixwe dibe neteweperestî! Heçkû wateya gotina dirûşmeya Tirkiyeya Serbixwe, pejirandin û piştgiriya, têkoşîna dabeşkar ya emperyalîst e, ku li ser Kurdistanê hatiye sepandin.’
**(Civaknas Dr. Îsmaîl Beşikçî)**

* ‘Tu carî dev ji fikrê Kurdistana yekgirtî û serbixwe bernedin. Çimku sînorên ku ji aliyê emperyalîstan ve hatine destnîşankirin, niha ji holê radibin û encama vê yekê jî, ne diyar e.’
**(Noam Chomsky | Zimanzan û Feylesof)**

* ‘Selahaddinî Eyyubî, îslamiyetê ji xaçperestan parast. Lê, li Îraqê, kurd hatin enfal kirin. Li Rojavayê, gotin ku jinên wan helal in û li Tirkiyeyê jî, gotin ku zerdeştî ne û ji civakê hatin qewirandin newsa?’
**(Nesrin Arikan)**

* ‘Heta niha, feylesofan dinyayê li gor mêran şirove kirine. Lê, divê dinya ji bo mirovahiyê careke din were guhêrandin û bi awayeke jinane, ji nû ve were şirovekirin.’
**(Irmtraud Morgner)**

* ‘Fikirîn û tevgerîna serbest wezîfeya lêkolîner nîne, wesfa wî/wê ya sereke ye.’
**(Civaknas Dr. Îsmail Beşikçî)**

* ‘Li welatên îslamî, ji bilî Xwedê ti nirxeke wan ê hevpar tune. Lewma jî, bêrawest şer dikin.’
**(Naokî Inose | Şaredarê Bajarê Tokyoyê)**

* ‘Kesên ku bêdengiya te fam nekin,
dibe ku gotinên te jî fam nekin.’
**(Ts. Eliot)**

* ‘Aqilê zilamekî çuqasî kêm be, quretiya wî jî hewqasî zêde ye. Zilamek çuqasî nezan be, hewqas jî xwe zêde dinepixîne.’
**(FriedrichNietzsche)**

* ‘Dema tu çavê xwe vekî, tu ê spehitiya gerdûnê bibînî.
Dema tu zêhna xwe vekî, tu ê têbigihêjî wateya gerdûnê.
Dema tu dilê xwe vekî û wê demê gerdûn a te ye êdî.’
**(Gautama Buddha)**

* ‘Ti kes dê min nebe şahiya meqesokan.
Çivîka ku xeyela firînê dikir, niha li ber mirinê ye.’
**(Furug Ferruhzad)**

* ‘Zanist û zanyarî, rihê mirovan raserî xwezayê dikin.’
**(S. Eriugena)**

* ‘Êdî wextê mirovan tune, ku bikaribin tişteke fêr bibin.
Çimku hemû tiştan, ji firoşkaran hazir dikirin.
Lê ji ber ku firoşkareke dostan difroşe tune, dostên mirovan jî tune nin.’
**(Mîrzayê Biçûk)**

* ‘Bi dost û nasên xwe re, siyasetê nekin. Çimku, siyaset dostaniyê dilewitîne. Siyasetmedar, dev ji riya xwe bernadin û dostaniya we jî, têk diçe.’
**(Arîstoteles)**

* ‘Bi awayekî çalak organîzebûna nezaniyê,
rewşa herî xeternak ya dinyayê ye.’
**(Goethe)**

* ‘Kîsoyî go: Em hêdî hêdî, dimirin.
Perperokê go: Erê, tu mafdar î. Çi rojekê dirêj e.’
**(Gotineke Gelêrî)**

* ‘Heta tu ji gotina xwe ne ewle bî,
hema qet devê xwe veneke û nebêje.’
**(Platon | Eflatûn)**

* ‘Dema tu perperokekê biêşînî,
dotira rojê tu nikarî lêborîna xwe jê bixwazî.’
**(Gotineke Gelêrî)**

* ‘Hûn rastiyê, haş bikin û bêxin binê erde jî,
dê ew mezin bibe.’
**(Emile François Zola)**

* ‘Bextewariya jiyanê, girêdayî aramiya hiş e.’
**(Marcus Tullius Cicero)**

* ‘Heke em dema niha, mîna siberojê bibînin û wisa bifikirin, ew hê pêk nehatiye.  Lê wextê ku em, dema niha mîna ya ku heye jî bifikirin; ew ji zû ve derbas bûye.’
**(Henri Bergson)**

* ‘Ol, efyona gel e.’
**(Karl Marks)**

* ‘Di zanistê de, nisogerî/vebirî tune.’
**(Karl Popper)**

* ‘Tênegihiştînî, ji bo fîlozofeke lidijderketineke lewaz e.’
**(Friedrich Schelling | 1775-1854)**

* ‘Zanayiya zanistî ji bo mirovahiyê,
zanayiya herî ewledar û feydedar e.’
**(Albert Einstein)**

* ‘Herikana robarê herçuqas ji bêgaviyê li gor hêla herkê be jî, ji avroya robarê cihêreng e.’
**(Henri Bergson| 1859-1941)**

* ‘Rasteqînî, herikaneke bêrawest e.’
**(Henri Bergson| 1859-1941)**

* ‘Vajbawerî, agir berdidine dinyayê.
Tiştê ku dê wî agirî bitemirîne, felsefe ye.’
**(Voltaîre)**

* ‘Danîna zagonan, ne karê felsefeyê ye. Karê felsefeyê, xwegihandina darazên taybet yên aqilê hevpar e.’
**(Immanuel Kant)**

* ‘Kesê ku li derveyê jiyana xwe li jiyaneka baş digere, ew ne di lêgerîna jiyaneka baş de ye.’
**(Plotînos)**

* ‘Tiştên ku felsefe ji me dixwaze ne bawerî yan serîtewandinek e, pêrazîbûneke aqilane ye.’
**(Prof. Bryan Magee)**

* ‘Ev dinya, ji bo mirovên ku difikirin komedya û ji bo yên ku hîs dikin jî, tragedyayek e. Ji ber vê yekê ye, ku Demokrîtos keniyaye û Heraleîtos jî, giriyaye.’
**(Horace Walpole)**

* ‘Di matematîkê de ne tenê heqîqet, spehîtî jî heye. Mîna spehîtiya peykerekî, sar û sade.’
**(Bertrand Russel)**

* ‘Di destpêkê de, di dilê mirovan de xirabî tune.’
**(Jean-Jaqques Rousseau|1712-1778)**

* ‘Armanca rasteqîn ya dewletê, serbestî ye.’
**(Benedictus Spinoza)**

* ‘Aqil, koleyê dildariya ye.’
**(David Hume)**

* ‘Jana wujdana mirovî, şermnekirin e.’
**(Friedrich Nietzsche)**

* ‘Mirov, perçeyekê xwezayê ye û ji ber vê yekê jî afirandêriya mirov jî, ji afirandêriya xwezayê perçeyek e. Xweza, di lewnê mirovî de digihêje hişê xwe.’
**(Friedrich von Schelling| 1775-1854)**

* ‘Xweza, xwezayê diafirîne.| Natura naturans’
**(Spînoza)**

* ‘Avahîsazî, mûzîka qerisandî ye.’
**(Friedrich von Schelling|1775-1854)**

* ‘Hişmendî, bi tenê nesneya zanayiyê ya rasterast e û zêhn, tenê di hunerê de dikare têbigihêje xwebûna xwe.’
**(Friedrich von Schelling |1775-1854)**

* ‘Spehîtiya tiştan, di aqilê temaşevanan de ye.’
**(David Hume)**

* ‘Wateya peyva azadiyê tune.’
**(Denis Diderot| 1713-1784)**

* ‘Serkeftin, tovê nefretê diçîne.
Çimku kesên ku têne vegirtin, ne dilşad in.’
**(Gautama Buda)**

* ‘Ji bo felsefeyê gava yekemîn, bawernekirin e.’
**(Denis Diderot| 1713-1784)**

* ‘Hinek mirov cihê ku diçinê bextewar dikin,
hinek jî cihê ku diteriqînin.’
**(Oscar Wilde)**

* ‘Heke tu ji fikirînê şerm nekî, ji gotina xwe jî şerm neke. Heke pêwîst be bipeyîve, nexwe tu ê tune bibî.’
**(Montaigne)**

* ‘Lêgerîna zanayiyê û daxwaza erdemîtiyê,
heman tişt in.’
**(Sokrates| B.Z.470-399)**

* ‘Matematîk û fîzîk,
di têgihiştina cîhana xwezayî de du kilîdên sereke ne.’
**(Platon| B.Z.427-347)**

* ‘Şiîr bêtir felsefî ye û divê ku meriv,
ji dîrokê zêdetir bala xwe bidê şiîrê.’
**(Arîstoteles)**

* ‘Çawa ku Platonê zanyar jî eşkere kiriye, tiştên ku tu dixwînî û tevgerên te, divê amizgerê hev bin.’
**(Geoffrey Chaucer)**

* ‘Ferqa rasteqîn ya ku di navbera nezanî û dahîtiyê de heye, hûn dizanin ku çi ye? Sînorên dahîtiyê hene, lê tu sînor ji nezaniyê re tune nin.’
**(Whoopi Goldberg)**

* ‘Xwîn û hestû, di laşê hemû mirovan de hene.
Lê a girîng, dil û niyet e.’
**(Marlo Morgan)**

* ‘Heke rêveberên dinyayê dayik, helbestvan û mamoste bûna, kesî gazinan nedikir.’
**(Charlie Chaplin)**

* ‘Carinan em wiha difikirin, ku dawiya her tiştî hatiye.
Heçku ew dem, destpêk e.’
**(Louıs L'amour)**

* ‘Şev, ji bo dîtina xewna ye.
Roj jî, ji bo têgihiştina nerasteqîniya wan.’
**(Gotineke Çermesoran)**

* ‘Kurê min; li dinyayê du celeb mirov hene, mirovên baş û yên xirab. Di navbera mirovan de, ferqekê din jî tune.’
**(Navê Min Khan e / My name is Khan)**

* ‘Pêdiviya tenêtiyê bi ti tiştî nîne.
Ew hemû tiştî, fêrî mirovan dike.’
**(Enid Bagnold)**

* ‘Zarokekê bê xweh û bira, ti caran ne mîna zaroka ye.’
**(Enid Bagnold)**

* ‘Carinan agir bi dilê mirov dikeve,
tiştê ku jê re dibêjin jiyan ev e.’
**(Simone de Beauvoir)**

* ‘Çîrok divê ne bêhempa bin,
çimku rastiya jiyanê ti caran ne wusa ye.’
**(A.L. Kennedy)**

* ‘Başiya yekta ew e ku mirov,
li gor wujdana xwe tevbigere.’
**(Simone de Beauvoir)**

* ‘Postmodernîzm, li dijî aqil êrîşek e û çavkaniya vê ramanê jî, Nietzsche ye.’
**(Habermas)**

* ‘Hemû tiştên ku pêktên, di dawiyê de hildiweşin û mirina mirovan jî, ji zayînê ve dest pê dike.’
**(Simone de Beauvoir)**

* ‘Ji bo bextewariyê, pêdiviya te bi serbestiyê û ji bo serbestiye jî, pêdiviya te bi wêrekiye heye.’
**(Perikles)**

* ‘Dema du mirov ji hev hezdikin,
bi evîna xwe rih û laşê hev bilewn dikin.’
**(Simone de Beauvoir)**

* ‘Dîrok, rasthatiniyek e û ji bilî vê yekê, ne ti tişt e.’
**(Nietzsche)**

* ‘Kesê ku bixwaze azad bibe, ber bi rojê ve dimeşe.’
**(Simone de Beauvoir)**

* ‘Xemgînî, ji bo mijûlahiyê û demên vala rêbazek e. Bi taybetî jî, heke mirov bêmecal be.’
**(A.L. Kennedy)**

* ‘Raperîneke biçûk be jî, serhildanek ne xirab e. Di her serhildanekî de, gel bêtir digihêje hişmendiya hêzdariya xwe û desthilatdar, zêdetir ji gel dûr dibin.’
**(Simone de Beauvoir)**

* ‘Postmodernîst, êrîşê teoriyên modernîzmê yên azadîxwaz û nirxên wê dikin.’
**(Habermas)**

* ‘Heke em dev ji kirdeya bandordar berdin, ev yek tê wê wateyê ku em dev ji nesneya ku di bin bandora kirdeyê de dimîne jî berdidin.’
**(Nietzsche)**

* ‘Ji ber ku naxwazin çewtiyan bikin, hemû kes dixwazin ku mirovekê rastgo binasin. Lê ti caran hewl nadin, ku ew bi xwe mirovekê rastgo bin.’
**(Sîgmund Freud)**

* ‘Tu tiştekê ku mirovî ye, ne hêjayî hewldanek mezin e.’
**(Platon)**

* ‘Mirovên ku rexneyê li xwe digrin,
ji bo dîtina rastî û delaliyê siûda wan zêdetir e.’
**(Konfiçyûs)**

* ‘Bi rexneyên Nietzsche û bi nirxandina wî ya vê mijarê re, hincet û sedemên wan yên ku pêşkêşdikin, ji guherîneke mezin derbas bûne. Di destpêkê de aqil, ji bo ku wekî dîn bigihêje hêza xwe a pêkanîna yekîtiyê û li ser bingeha hêza xwe bikaribe rê li perçebûna modernizmê bigire; wekî zanayiyeka resen ya lihevhêner, piştra jî wekî taybetmendiyeke azadîxwaz û ya dawî jî wekî bîrhatinek telafîkirinê hate pêşnûmakirin. Ev destpêdana ku dixwest têgeha aqil li bernameya ronîbûnê bîne, ku mirov dikare bibêje bernameya ronîbûnê di nav xwe de bernameyeke diyalektik e; sê caran bi ser neket.
Di rewşeka wiha de rêyek tenê li pêşiya Nietzsche hebû; yan wê wî aqilê ku navenda wê kirde ye bi awayekî derûnî ji nû ve rexne bikira, an jî wê ji bernameya xwe bi temamî derxista. Nietzsche biryara xwe ji aliyê hêla duyemîn ve da: Têgeha aqil ji nû ve revize nekir û xatirê xwe ji Diyalektika Ronîbûnê xwest.’
**(Jurgen Habermas,**
**Profesorê felsefeyê, civaknas û siyasetnasê alman)**

* ‘Bila bimrin, hemû hipotezên ku baweriya xwe bi dinyayek rasteqîn tînin.’
**(Nietzsche)**

* ‘Bextewarî xewnek e, lê êş jî rasteqîn e.’
**(Voltaire)**

* ‘Hemû tiştên ku ne xwezayî ne, kêm in.’
**(Napolyon)**

* ‘Ez ji bo yên ku dibêjin bi tenê kirû hene, wiha dibêjim: Na, rasterast kirû tune nin, bi tenê rave hene. Hemû tiştên ku em têdigihêjine wan, xwiyakirineke dawînî/nîhaî ne, encamek in û nikarin bibin sebebên tu tiştan.’
**(Nietzsche)**

* ‘Heke mirov ji hêleka hindûrîn lê mêze bike, obje/nesne bi xwe jî; kirde ye û tu sebebên ku hebûna cîhaneke rasteqîn piştrast dikin, nemane.’
**Nietzsche**

* ‘Her bawerî û her angaşteka rasteqiniyê, çewtiyeke bivênevê ye. Çimku, dinyayeka rasteqîn ti caran pêk nehatiye.’
**(Nietzsche)**

* ‘Ger tiştekê madî tunebe, wê demê tiştekê dermanewî jî, tune. Di rewşeka wiha de jî, têgeh tu tiştî naguncîne.’
**(Nietzsche)**

* ‘Rast e, erê em mirov in. Lê carinan, bi qasî ajalan jî em jiyanê fam nakin. Çi tiştekê hezîn e, newsa?’
**(Panaît Îstratî)**

* ‘Tiştekî ku rasteqîn be tune, tiştên ku ji wan re rasteqîn tê gotin jî, ew illîzyon in: Ne rih, ne aqil, ne raman, ne hiş û ne jî îrade rasteqîn in. Ev hemû jî, ew fiksiyon in ku nayên bikaranîn.’
**(Nietzsche)**

* ‘Ka em wisa bifikirin ku we jiyanê mîna rastekên logarîtmayê, sererast kir. Hemû kes, dizanin ku dê li kû û çawa bijîn û çi bikin. Tu xeteriya jiyane nema. Û we insanan, ji tirsa muxlaqiyê rizgar kir. Ê baş e, ji nav we yek rabe û bibêje ku <bêhna min teng bû.> wê demê hûn ê çi bikin camêrino?’
**(Dostoyevskî)**

* ‘Nav û navdarî, xwedakirina xweperistiyê ne.’
**(Honoré de Balzac)**

* ‘Di felsefe, siyaset, edebiyat û hunerê de mirovên ku bi ser dikevin û behremend in, mirovên melankolîk in.’
**(Arîstotales)**

* ‘Heke tu bixwazî ku bibî serwerê xelkê,
divê tu jî ewilî serweriya aqil qebûl bikî.’
**(Seneca)**

* ‘Mirovên zana, li navdariyê nagerin.’
**(Tacitus)**

* ‘Divê mirov xwe bi ti kesê re muqayese neke û bi destkeftinên xwe bextewar be. Mirovên ku bextewariya xelkê dihezidin û wan aciz dikin, ti caran dê bextewar nebin.’
**(Seneca)**

* ‘Dilê rêveberê dewletekî, divê di mejiyê wî de be.’
**(Napolyon Bonapart)**

* ‘Bi saya bextreşiyê,
mirov dostên xwe yên rasteqîn dinase.’
**(Aristotales - Etîka Eudemian, Kitêb VII)**

* ‘Her dema ku em dijîn, heqê xwe ji me dixwaze.’
**(Goethe)**

* ‘Gotina felsefeyê rast e, ku dibêje jiyan ber bi rabirdûyê ve tê têgihiştin. Lê di vir de, em hevokekê jibîr dikin: Divê ber bi pêş ve were jiyîn.’
**(Soren Kierkegaard)**

* ‘Tenahî li dijî bêhişbêjiya civakê,
xwediyê wesfekî serhildanê ye.’
**(Jean Paul Sartre)**

* ‘Heta ku meriv nebe xwediyê têgihiştineke baş ya hezkirinê, aqil û mantiq bêqîmet in.’
**(Platon / Eflatûn)**

* ‘Felsefeya min, baweriya min ya ji azadiyê ye. Kenîn, çeka min e. Dengê dilê min jî, zimanê min.’
**(Charlie Chaplin)**

* ‘Heke paceya te ya ku berê wê li derve ye qirêj be,
helbet tu ê kulîlkên min di nav heriyê de bibînî.’
**(Mewlana Celaledînê Rumî)**

* ‘Ji bo pêhesîna birînan, pêdivî bi nasandina wan tune.’
**(Amin Maalouf)**

* ‘Antîsemîtizm,
hesta mirovên ku ji civaka xwe hatine qewirandin e.’
**(Friedrich Wilhelm Nietzsche| 1844-1900)**

* ‘Mirovên jar,
xurê mirovên hêzdar in û ev yek qedera wan e.’
**(Otto von Bismarck)**

* ‘Çi dema ku dîn/ol lepên xwe sist dikin,
wê demê huner serê xwe radike.’
**(Friedrich Wilhelm Nietzsche| 1844-1900)**

* ‘Heqîqet, ew tişt in ku mirov baweriya xwe bi wan tînin.
Lê heqîqet, nikare baweriya me bi tiştekê bîne.’
**(Osamu Dazai)**

* ‘Dema xeber didin hemû mêr mîna hev in; belam bi demê re mirov bêtir têdigihêje ferqa wan.’
**(Moliere)**

* ‘Di têkiliyekê de pêbawerî tunebe, li wir hezkirinek rast û dirist jî tune. Lewre, pêbawerî ji hezkirinê nuwazeke mestir e.’
**(Erich Fromm)**

* ‘Mirov, divê zilamê unîformaya xwe be.’
**(Napolyon Bonapart)**

‘Eşq, vedîtineke mirovî ye û di xwezayê de jî tune.’
**(Montaigne)**

* ‘Têgihiştina cîhana rasteqîn ya mirovan, ji têgihiştina cîhana stêrkan jî dijwartir e.’
**(Marcel Proust)**

* ‘Mirove ku welatê xwe rizgar dike,
tu yasayan binpê nake.’
**(Napolyon Bonapart)**

* ‘Her serê sibehê ne tenê dinyayek bi milyonan dinya hişyar dibin, bi qasî çav û zêhna mirovan.’
**(Marcel Proust)**

* ‘Mirove ku bi serê xwe ye û azad e, herdem têk diçe.’
**(George Orwell)**

* ‘Şikir ji Xwedê re ku ez hêjî xwedênenas im.’
**(Luis Bunuel)**

* ‘Çi dema ku mirov ji xelkê dûr dibe û bi mejiyê xwe cihêtiya xwe eşkere dike, bêoxirî dev ji mirov bernade.’
**(Oscar Wilde)**

* ‘Heke tu dixwazî ku li ser sozê xwe bî, soz nede.’
**(Napolyon Bonapart)**

* ‘Li pêşiya ramanên serdema xwe bimeşin, dê we bişopînin û piştgiriya we bikin. Li pey wan bimeşin, dê we bi xwe re bibin. Êrîşî ser wan bikin, dê we biqewirînin.’
**(Napolyon Bonapart)**

* ‘Toreyên civakî, durûtiyên neteweyan in.’
**(Balzac)**

* ‘Eşq û tirs, weke cam û kevir in.’
**(Şêx Sadiyê Şîrazî)**

* ‘Em materyalîstên xwedênenas in
û bi rasteqîniyan jî, şanaz in.’
**(Mikhail Bakunin)**

* ‘Hemû mirovên ku difikirin, xwedênenas in.’
**(Ernest Hemingway)**

* ‘Hiqûq, qehpika desthilatiyê ye.’
**(Mikhail Bakunin)**

* ‘Di Mizgîniya/Incîla ateîzmê de,
ji bilî peyva <bifikire> peyveke din tune.’
**(Emmett F. Fields)**

* ‘Dînê serdemekê, kêf û şahiya serdema dahatuyê ye.’
**(Ralph Waldo Emerson)**

* ‘Di vê sedsalê de, xwedênenasî dê bibe awayê tevgerîna hevpar ya mirovên medenî.’
**(Joseph Mc Cabe)**

* ‘Çawa ku ez ji çîroka <Qaza Dayik> ê bawer nakim, wisa ji Xwedê jî bawer nakim.’
**(Clarence Darrow)**

* ‘Di dema lêkolînên xwe yên li ser dîrokê de, ez têgihiştim wê qeneetê ku mirovên bêbawerî, qasî bawermendan zerer û ziyanê nadine dinyayê.
Mejiyê mirovên bêbawerî bi galegalên şerên hov, seferên xaçparêzan û stûxwarkirinê şêlû nebûye. Di dewsa wan galegalan de ji bo zanayî, delalî, maqulî, edalet, xweşdîtin û bextewariyê, tiştên ku ji destê wan hatiye texsîr nekirine. Xwiya ye ku di hunera berfirehkirina warên aşt de, bala xwe baş didin dengê dilê xwe û di vî warî de jî, ji bawermandan ne kêmtir in.’
**(Carl van Doren)**

* ‘Xwedênenasî, yek ji wan nasnavên herî mezin e. Xwedênenasî, remza erdemê ya lehengên dinyayê ye: Copernicus, Spinoza, Voltaire, Paine, Presley.’
**(Annie Wood Besant)**

* ‘Ji bo aramkirina gel, dîn alaveke bêhempa ye.’
**(Napolyon)**

* ‘Xirabiyên ku mirov bi riya baweriya dînî dikin, bi ti awayan din nikarin bikin. Dema ku dikin jî, vê yekê bi dilgeşî û bêkêmayî dikin.’
**(Blaise Pascal)**

* ‘Ev dinya dikaribû bibe dinyayek baştir,
helbet ku tê de dîn/ol tunebûya.’
**(John Adams)**

* ‘Heke mirovek jiber têgihiştinên xwe yên çewt di rewşeke êşdar de be, ev yek dînîtî ye. Lêbelê heke gelek mirov ji ber têgihiştinên çewt di rewşeke êşdar de bin, ev yek jî dîn/ol e.’
**(Robert M. Pirsig)**

* ‘Oldarên ji cimeetên cihê mîna ecûzeyên ku ji şewqa rojê ditirsin, ji pêşveçûna zanistê ditirsin û bi awirên tûj li wê dawiya bêgav ya mizgîndêr ku dê pergala wan ya xapînok hilweşîne dinihêrin.’
**(Thomas Jefferson)**

* ‘Ev dêlindêzên dînî/olî yên tewşikî ku pêdiviya wan bi dem, hewldan, êş û razdariyê heye, ji bo psîkologekî peresanê/ewrîmê nîşanên bikêrnehatina dîn bi xwe ne.’
**(Mark Kohen)**

* ‘Bi awayekî wêrek, hebûn yan tunebûna Xwedê jî bipirse. Lewre heke Xwedê hebe, dê ji tirseka çavkor zêdetir rûmetê bide aqil.’
**(Christopher Hitchens)**

* ‘Nêrîna, <bawermendek ji septîkekê bêtir dilşad e>, qasî nêrîna <serxweşek ji hişyarekê bêtir dilşad e>,
çespandineke ne rast e.’
**George Bernard Shaw**

* ‘Rasteqîniya di meseleyên dînî de,
ji bilî ramaneke bêbingeh ne ti tişt e.’
**(Oscar Wilde)**

* ‘Heke mirov bi tenê jiber sebebê tirs yan jî xelatê xêrxwaz û çakbîn bin, wateya vê yekê ew e ku em di rewşeke belengaz de ne.’
**(Albert Einstein)**

* ‘Sebebê xwîna ku li ser rûyê dinyayê tê rijandin, pêvçûnên olî ne. Çavkaniya êşên mirovî ya herî mezin, ol e. Ol ne tenê afyona girsaye ye, siyanura wan e jî. Ol, mirovan perçe/cihê dike, zilmê li wan dike û hemû tiştên ku xwedayî ne, wan înkar dike. Herweha, ol fetisandina rihê mirovî ye jî. Hemû tawanên ku li ser navê Xwedê yan welatekî têne kirin, ji layê bîrûraya giştî ve, bi hêsanî têne efûkirin. Rih/giyan, germ e û xwediyê giraniyekê ye. Tîn jî, sar e û cihê ye. Giyan, girêdayê avê û dinyayê ye. Tîn jî, girêdayê ezmên û elementên ezmanî ye. Ji elemantan, êgir der diçe. Ango, hêza êgir.
Mirov dibîne ku sedemên hemû siyasetan, şer e. Ol, dema ku kirasekî siyasî li xwe dike, mirov dikare bibêje ku çalakiyên wê di dawiyê de dibin sedemê şer. <Şer, dojeh e.> Lewma jî, baweriya olî rasterast mirovan dişeyne dojehê. Guman têde nîne û dîrok vê nêrînê, dipeyîtîne. Her oleke nûjen/modern, dibêje ku Xwedê aligir û piştevanê me ye û bi vê angaştê, xwe dipesinîne. Bawermendên oldar jî, amade ne ku li ser navê ol xwe bidin kuştin yan jî, xelkê bikûjin. Dojeh, tirsa ji her tiştî ye û bihûşt jî, redda tirsê ye.
Ol, ew mîstîsîzm e ku xwe bi sazî kiriye. Rastiya vê yekê jî ev e: Mîstîsîzm nikare xwe bi sazî bike û ji bo vê yekê, ne guncan e. Helwesteke bi vî rengî, resenî/naveroka wê ji holê radike. Nexwe, mirov dikare bibêje ku ol mîstîsîzmê

ji holê radike, yan jî bandûra wê gelekî kêm dike. Oleka ku xwe birêxistî kiriye, ji bilî fikrên duyemînî rê nade fikrên din û mirovan, dike mehkûmê jiyaneka duyemînî/talî. Ev yek, di polîtîkayên tatalîter yên olî de, xaleka hevpar e. Elmanyaya Naziyan, Stalînîzm, Xaçperest û hwd. Hinek kes, weke rastiyan têne dîtin û dema ku mirov rê didine tiştên bi vî rengî, ev bûyer rû didin. Hemû mirovên ku derheqê başî û xirabiyê de, xwediyê nêrîn/awireke ji rêza/standart in û wan di qalibekî de dibînin, xeternak in. Wekî dînekî ku demançeyek di destê wî de be, xeternak e. Herweha, mirovên ku tiştekî wiha diparêzin, ew dîn bi xwe ne jî.
Ti mirov, asta wî/wê ya nîjadî, olî û şexsî, çi dibe bila bibe; bi hebûn yan jî tunebûna dinyaya din, nizane. Ji xwe civak jî, bi vê vegotinê têne qontrolkirin. Ger mirov bawer bikin ku dê di dawiyê de, ew ê herin gundekî betlaneyê ya hewizdar; dê serî ranekin û wiha herdem, sitûxwar bimînin. Ji bilî vê yekê, bawermendên oldar jî; li ser xwestekên hiqumetan; amade ne ku jiyana xwe jidest bidin. Têgeha dinyaya din, rê li rêveberiya girseyan vedike û hêza serdestan jî, zêdetir dike. Serokek, heke wisa bawer bike ku dinyaya me beredayî ye û bi tenê ji bo dinya din, ezmûnek e; bêguman dê di dema biryardayîna komkujiyeka nukleer de, ti caran dudil nebe. Balkişandina dinyaya din, redda/înkara jiyanê ye. Mijulahiya bi bihuştê re jî, afirandina dojehê ye. Perwerdehiya olî ya di dema zarokatiyê de jî, îstîsmara zaroka ye.'

**(Tom Robbins)**

* ‘Siyasetê bi hezaran mirovên êsîr kuştiye,
dîn/olê jî bi deh hezaran.’
**(Sean O'Casey)**

* ‘Dîn, ber bi jêr ve daxistina gewretiya mirovî ye. Dîn hebe jî tunebe jî, herdem dê mirovan baş û xirab hebin. Lê ji bo ku mirovên baş bi xirabî tevbigerin, pêdiviya wan bi dînê heye.’
**(Steven Weinberg)**

* ‘Beyî ku tu ji milyaketê li quncikê bexçê xwe bawer bikî, ma tu nikarî spehîtiya bexçeyê xwe bibînî?’
**(Douglas Adams)**

* ‘Alfred Hitchcockê hostayê filîmên tirsdêr, li Swîsreyê li ser riya xwe li dîmenekî rast tê û hema wê kêliyê wiha dibêje: <Heta niha jî, min dîmeneke wiha tirsdêr nedîtiye.> Keşeyekî, destê xwe avêtiyê ser milê zarokek î biçûk û pêre diaxife. Hitchcock dema ku çav bi wan dikeve, hema di cih de wiha diqîre: <Lawiko bireve, lawo bireve! Bireve, da ku tu bikaribî jiyana xwe bijî.>’
**(Richard Dawkins)**

* ‘Pirraniya mêrên ku xwediyê jîrekiyeke raser in, ji dîn/ol bawer nakin. Lê vê rastiyê, ji civakê re eşkere nakin û vedişêrin. Çimku ji wendakirina berjewendiyên xwe ditirsin.’
**(Bertrand Russell)**

* ‘Di dilê çanda me de xirabiya herî mezin a ku mirov ji xwe naxwaze bilêv jî bike, yekxwedayetî (monoteîzm) e. Ji nivîsarek hovane ya beriya Serdema Tûncê, sê olên dijberê mirovahiyê der çûne. Cihûtî, Filehtî û Misilmantî. Ev sê dîn, dînên asîmanî û monoteîst in û seranser, bavkanî/patrîarkal in. Xwedê, bavê herî hêzdar e û serwerê hemû tişta ye. Lewma jî li wan deverên ku ketine bin bandûra wan olên asîmanî û nobedarên wan yên mêr, ev du hezar sal in ku li dijî jinan nefretek peyda bûye.’
**(Gore Vidal)**

* ‘Behsa heyînên nedîtbar, behsa ji tunehiyê ye. Dema tê gotin ku rihê mirovî, milyaket û Xwedê, heyînên nedîtbar/razber in, wateya vê gotinê ew e ku ew tune nin. Heta ku ez xwe bernedim kûrahiya xewn û xeyalan, ez nikarim ji wan gotinan encameke din a cihêreng bi dest bixim. Ji xwe heyînên ku hene, têra xwe min mijûl dikin û têra xwe tetmînkar in. Bi rastî jî dibe ku ew heyînên nedîtbar hebin jî, lê ez dîsa jî naxwazim mejiyê xwe bi tiştinên wilo ku nikarin werin peyîtandin mijûl bikim û dê ez ê xwe nêxim bin êşa wê îşkenceyê.’
**(Thomas Jefferson)**

* ‘Gelê kurd hêjî, ji mafê xwe ê perwerdehiya bi zimanê xwe bêpar e. Siyaseta înkar û qedexekirinê ku li Tirkiyeyê ji bo gelê kurd û zimanê kurdî têne bikaranîn, yekser dişibine wan sepandinên nîjadperest ku li Afrîkaya Başûr hatine serê me jî.’
**(Nelson Mandela)**

* ‘Dîn. Di naveroka/navenda xwe de hinek ramanan dihewîne û em jî wan bi pîroziyê bi nav dikin, yan jî bi têgehên bi wî rengî. Maneya vê yekê ev e: têgeh yan jî ramanek qedexe, ku hûn nikarin li ser bipeyîvin. Qedexe! Baş e çima em nikarin? Lew re qedexe ye!
Heke yek raya/dengê xwe nede partiya we, mafê we heye ku hûn pêre mineqeşe bikin. Herkes dê ramana xwe bibêje û dê ev yek, kesî aciz jî neke. Heke yek rabe û bixwaze ku li welêt bila bac girantir bibe, hûn dikarin têbiniya xwe ragihînin. Lê heke yek rabe û bibêje ku <roja septê/şemiyê, lembeyên mala/odeyên xwe venekin.> wê demê jî hûn wiha dibêjin: <rêz digrim.>
Çima piştgirî û xwedîlêderketina partiya kevneperest, demokrat yan lîberalan yan jî parastina modelên cuda yên ekonomîk û hilbijartin/piştevaniya Windows yan jî Macintoschê rewa/meşrû ye, lê çima derheqê afirandina cîhanê de, derbirîna ramanan qedexe ye? Gelo ma ji ber ku ew pîroz in? Heke em bi awayekî mantiqî li mijarê hûr bibin, dê em ê bibînin ku sebebeke mantiqî ya vê yekê tune. Helbet, heke me bi yekdengî biryara qedexekirina vê yekê nedabe?’
**(Douglas Adams)**

* ‘Gel wiha difikire ku dîn dengê rastiyê ye, ramangir dibêjin ku nexêr derew e û rêveber jî dibêjin, alaveke sûdmend e.’
**(Seneca)**

* ‘Siyaseta herî baş, rastî û duristî ye.’
**(Zadie Smith)**

* ‘Serwer û desthilatdarên civakê,
olê weke alaveke zordestiyê bikar tînin.’
**(Richard Dawkins)**

* ‘Xwedê, îradeyek azad daye min. Ji ber ku ez wê îradeya xwe ya azad bikar tînim, çima wê demê min dişeyne dojehê?’
**(Ricky Gervais)**

* ‘Ji bo feylesofeke tiştê herî girîng, meraq e. Çimku ji bilî vê yekê, destpêkeka felsefeyê tune.’
**(Platon, BZ.427-347)**

* ‘Ez ne li bendê bûm ku hemû kes ji min hezbikin, lê min dixwest ku min fam bikin.’
**(Albert Einstein)**

* ‘Dema li herêmekê yan di nav civatekê de zor li guft-û-go û mentiqê badide û dibe serperesht, îmkana charserkirina kêsheyan bi aramî û ashtî jî di bin stema zorê de dihêt kujtin.’
**(Shahin Sorekli)**

* ‘Sê hêmayên aqil hene:
fikirîna baş, gotina baş, kirina baş.’
**(Demokrîtos)**

* ‘Eşq, welatê herî hêzdar ê hemû zemana ye.’
**(Albert Camus)**

* ‘Meriv dikare rê li ber artêşan bigre û wan bide sekinandin, lê ne pêkan e ku meriv bikaribe rê li ber fikran bigre û wan rawestîne.’
**(Vîctor Hugo)**

* ‘Çavkaniya spehîtiya gerdûnê, hişmeta rûyê Xwedê ye.’
**(Marsilio Ficino / 1433-1499)**

* ‘Dapîra min go kurdî zimanê dil e, tirkî muzîk e. Rewnak, şîrîn û nerm e; weke cobareke şerabê diherike. Û bû qêrina wê, go zimanê me jî zimanê êşê ye. Mirin her bûye para me; li ser zimanê me jî barê nefret û êşê heye.’
**(W. Saroyan)**

*(W. Saroyan lawê malbatek ermen e û bi eslê xwe ji Bidlîsê ye. Di sala 1908an de li Amerikayê hatiye dinyayê. Wêjekarekî navdar e û di sala 1964an de, çûye Bidlîsê.)*

* ‘Kesên ku jibîr dikin, baş dibin.’
**(Friedrich Nietzsche)**

* ‘Heywanê herî zalim, mirov e.’
**(Friedrich Nietzsche)**

* ‘Heke meriv herdem weke xwendekaran bimîne, wê demê dê niheqiyê li mamosteyê xwe bike.’
**(Friedrich Nietzsche)**

* ‘Sebebê sûc û çewtiyên herî mezin, çavbirçîtî ye.’
**(Arîstotales| B.Z.384-322)**

* ‘Mirovên nezan, ne ew kes in ku nizanin. Nezan ew kes in, ku naxwazin bizanibin.’
**(Platon)**

* ‘Dema ku aqilê bazirganan têrê nake, dor tê leşkeran.’
**(Bertolt Brecht)**

* ‘Jin dikare bibe yar, xwedawend, ecûze yan jî ramanek kûr. Lê tu caran, nikare bibe weke xwe.’
**(Simone de Beauvoir)**

* ‘Wekî dînan, min ji jinan hezkir.
Lêbelê ji bo min a girîng, azadiya min bû.’
**(Giacomo Casanova)**

* ‘Jiyan, heta hetayê berdewan nake, mirî tu carî ji gorê ranabin. Û robarên herî bêhez jî, rojekê xwe digihînin deryayê.’
**(Algernon Charles Swinburne)**

* ‘Dilşadiyên mezin, bi hêviyên biçûk dest pê dikin.’
**(Paulo Coelho)**

* ‘Jiyan, dişibe ajotina bisîklêtê. Ji bo ku meriv bikaribe hevsengiya xwe biparêze, divê meriv berdewam bike.’
**(Albert Einstein)**

* ‘Hêza herî mezin, a herî nefsbiçûk e.’
**(Holderlin)**

* ‘Dewletên ku Kurdistanê wekî mêtingehek hevpar bikaranîne, bi rêya dirûşmeya ‘Biratiya Olî’ xwestine ku rê li ber berfirehbûna hest û tevgerên kurdan yên neteweyî bigrin.’
**(Civaknas Dr. Îsmail Beşikçî)**

* ‘Heta ku azadî tunebe, eşq jî nikare hebe.’
**(Albert Jacquard)**

* ‘Mirovên rastgo dema ku derdikevin ber rojê, siya xwe jî li cem xwe dibin.’
**(Adelbert von Chamisso)**

* ‘Zanist,
encax li dorhêla  azadiya ramanî dikare bi pêş bikeve.’
**(Civaknas Dr. Îsmaîl Beşikçî)**

* ‘Geremoleke gerdûnî berbelav e,
çimku herkes ji xwe direve.’
**(Nietzsche)**

* ‘Bi qarewar û qirewîrê,
tu nikarî kesekê bêdeng têk bibî.’
**(Fringe)**

* ‘Bûyerên ehlaqî tune nin,
bi tenê rave û şiroveyên ehlaqî yên bûyeran hene.’
**(Nietzsche)**

* ‘Dema meriv difikire ku bersivan bi dest xistiye,
wê demê jî pirs diguherin.’
**(Paulo Coelho)**

* ‘Bi tenê mirovên ku xwediyê kultureke ne ji fêrbûnê hezdikin, nezan jî dixwazin ku ders bidin xelkê.’
**(Edouard Le Berquier)**

* ‘Heke di jiyanê de bi tenê dilxweşî û keyfxweşî hebûna, em wêrekî û sebrê fêr nedibûn.’
**(Helen Keller)**

* ‘Çi dema ku tevgera kurdan hêzdar dibe, ji aliyê dewlet û rewşenbîrên tirk ve nêrînek tê îcadkirin û li gor vê nêrînê, tê gotin ku ji hemû komên etnîkî re dewlet ne pêwîst e. Nabêjin ka ji kê re pêwîst e yan ji kê re ne pêwîst e, lê biryara xwe dan ku dewlet ji kurdan re ne sûdewer e û ne pêwîst e. Li dinyayê, qasî 10 hezaran komên etnikî hene. Ji rewşenbîrên tirk beşeke mezin, baş dizanin îro 40 dewletên ku hene, nifusa wan ji mîlyoneke jî kêmtir e. Ligel vê yekê derheqê kurdan de, ku li Rojhilata Navîn nifusa wan ji 40 mîlyonan jî zêdetir e; tiştekî nabêjin û çawa ku meseleyeke wuha qet tunebe tevdigerin.’
**(Civaknas Dr. Îsmaîl Beşikçî)**

* ‘Dar, bi mêweya xwe tê nasîn.’
**(Hans Habe)**

* ‘Zilamên gewre, evîndarê rastiyê ne.’
(**Virginia Woolf)**

* ‘Heta ku pesnê te bidin,
bizanibe ku tu ne di riya xwe de diçî.’
**(Friedrich Nietzsche)**

* ‘Celeba wan çi dibe bila be, hemû tiştên bêhempa bi awayekî jixweber klasîk in.’
**(Goethe)**

* ‘Zagona gelên hoveber, zagona tolhildanê ye.’
**(Alexandre Dumas)**

* ‘Di dîwana qralan de, ji felsefeyê re cih tune.’
**(Thomas More)**

* ‘Ji tunehiya başiyê, xirabî çêdibe.’
**(Xoşewîst Augustinus)**

* ‘Xerez û nefreta giregiran,
dibe sebebê nekamraniya gelan.’
**(Xoşewîst Augustinus)**

* ‘Jiyan, beyî lêgerîna mentiqê jî xweş û spehî ye.’
**(Sophokles)**

* ‘Helbest, beriya her tiştî hesta delaliyê ye.’
**(Ahmed Arif)**

* ‘Li cem her jinekê damareke Kleopatrayê heye û li cem her mêrekî jî, ehmeqiya Sezar.’
**(Friedrich Nietzsche)**

* ‘Tiştekî ku tu dixwazî bila dijminên te sehnekin, ji dostên xwe re nebêje.’
**(Schopenhauer)**

* ‘Heke Xwedê tunebûya, divabû bihata afirandin.’
**(Dostoyevskî)**

* ‘Kesên ku ji heywanan re xirab in, ne mirovên baş in.’
**(Schopenhauer)**

* ‘Li dinyayê tenê yek hilbijatinek heye: meriv yan tenahiyê hildibijêre yan jî geremoliyê.
Çimku meriv ji mirovên din çuqasî dûr bimîne û nekeve tu danûstandinan, dê rewşa meriv jî hewqasî baştir be.
**(Schopenhauer)**

* ‘Tiştê ku jiber rasteqîniyan
dê rê li ber mirina me bigre, huner e.’
**(Friedrich Nietzsche)**

* ‘Erdem, hişmendiya heyînê ye.’
**(Friedrich Hegel)**

* ‘Erdem, keysa bêhêza ye.’
**(Kallikles)**

* ‘Erdem,
tevgerîna li gor aqil û bikaranîna hêza xwe ya meriv e.’
**(Spinoza)**

* ‘Erdem, tevgerîna li gor wesfên xwezayî yên heyîna ye.’
**(Samuel Clark)**

* ‘Erdem, di bidestxistina zewqê de xwedîpîvanîtî ye.’
**(Aristippos)**

* ‘Erdem, xwedarezandin e.’
**(Joseph Butler)**

* ‘Erdem ne şuxlekî navajoyê ye, şuxlekî aqil e.’
**(Immanuel Kant)**

* ‘Erdem ew raman e,
ku ji aliyê ruhê mitleq ve tê nîşandan.’
**(Berkeley)**

* ‘Erdem, hewldan û xebata mirovî ya daxwaza xwegihandina raseriya mirovî ye.’
**(Friedrich Nietzsche)**

* ‘Erdem, xwe neecibandin û xwekêmdîtin e.’
**(Plautus)**

* ‘Erdem di bikaranîna yên baş de,
biryara me a ku em didin e.’
**(Descartes)**

* ‘Gerdûn, heta dawiyê hevqewirandina afirandin û tunebûnê ye. Hemû tişt jî, ji şerê dijberan der diçin.’
**(Herakleîtos)**

* ‘Misogeriya tekane, di zanayiya erdemê de heye. Meriv dikare erdemê fêr bibe. Mirov, ji ber nezaniya xwe xirab in. Erdem yek e, kit e û dabeş nabe. Erdem, xwenasîn û xwezanîna mirov e.’
**(Sokrates)**

* ‘Di warê xwe xirabnîşandinê de, nîjada mirovî gelek serkeftî ye. Nêçîra ku me daye dû; ku bi rêya aletan em dixwazin wê bikûjin, em bi xwe ne. Ji bo kuştina mirovan jî, em li meydanên berfireh û ronak digerin.’
**(Montaigne)**

* ‘Roj, her roj nû ye.’
**(Herakleîtos)**

* ‘Nivîskar ne tu tişt e, lê berhem her tişt.’
**(Gustave Flaubert)**

* ‘Xisleta meriv, qedera meriv e.’
**(Herakleîtos)**

* ‘Di jiyana me de hinek tiştên wuha hene ku bi rêya fikirînê, em nikarin wan fêr bibin. Lewma jî rêya tekane ya fêrbûna wan, jiyîn e.’
**(Michael Ende)**

* ‘Ez ê li gor dilê we xeber nedim û nejîm. Lêbelê ez ê li gor dilê xwe xeber bidim û heke pêwîst be, ji bo vê yekê ez ê bimirim jî.’
**(Sokrates)**

* ‘Di serdema me de, xetera herî mezin hêzdariya îdeologên nezan e, ku bi rêbazên jakobenîst û zordest, rê û rêbazan li ser xelkê ferzdikin. Tekane tiştê ku dê rê li ber vê zordestiyê bigre jî, ramana azad e, azadiya ramanê ye. Li warên ku azadiya ramanê lê hebe, ji îdeologên famkor re cih tune, rexne û serbestî lê heye.’
**(Ali Gurdilî)**

* ‘Zêrger pirr dikolin, lê kêm dibînin.’
**(Herakleîtos)**

* ‘Kesên ku ji bo berjewendiyên fermandaran têne perwerdekirin, ew tiredînên dilxwaz yên koletiyê ne.’
**(Friedrich Nietzsche)**

* ‘Ji roja ku ez ziman û dilê xwe, ji bo kesên ku fam nakin û ne hêja ne nawestînim, ji we rojê ve ez bextewer im.’
**(Kurt Vonnegut)**

* ‘Mirovên bedbîn, herdem dawiyeke bedbîn xeyal dikin. Lewma, tu carî xewn û xelayên wan têk naçin.’
**(Ali Gurdilî)**

* ‘Her ramana neguhêrbar, ji bo xwediyê xwe zîndan e.’
**(Friedrich Nietzsche)**

* ‘Tiştên ku em bi wan dizanin zanist e û yên ku em bi wan nizanin jî, felsefe ye.’
**(Bertrand Russell)**

* ‘Dîn xwe dispêrê tirsê, rastiya meseleyê ev e. Tirsa li himberî a nenasbar, tirsa têkçûnê, tirsa mirinê. Tirs, diya hemû stemkariya ye û ji ber vê yekê, divê em ji hemahengiya dîn û stemkariyê tu carî şaş nebin.’
**(Bertrand Russell)**

* ‘Bawerî, dijminên heqîqetê ne û ji derewan zêdetir metirsîdar in.’
**(Friedrich Nietzsche)**

* ‘Di navbera fêrbûna kurdan ya zimanê îngîlizî, almanî, rusî û tirkî de, ferqên mezin hene. Kurdeke ku zimanê wî/wê ê dayê kurdî ye dema ku îngîlizî fêr bibe, li ser zimanê xwe ê dayê, zimanekî din zêde dike. Wê demê zimanê îngilîzî, li kurdiya xwe zêde dike. Îngîlizî, almanî jî dîsa wusa. Lêbelê, encameke gelek cihêreng ya fêrbûna zimanê tirkî heye. Çimku a ku tirkî fêr dike, dewlet e. Bi armanca ku kurd dê kurdî jibîrbikin, tirkî fêrî wan dikin. Siyaseta bingehîn ya fêrkirina tirkî, ev yek e. Kurdê ku tirkî fêr dibe, zimanekî din li zimanê xwe ê dayê zêde nake, kurdiya xwe jibîr dike. Di lîteraturên akademîk yên mafê ziman û perwerdehiya zimanê dayê de, ji vê yekê re ‘zimanê kêmker, rêgir, astengker’ tê gotin.’
**(Civaknas Dr. Îsmaîl Beşîkçî)**

* ‘Ceza mirovan terbiye nake, bi tenê kedî dike.’
**(Friedrich Nietzsche)**

* ‘Xapa dijmin ya herî mezin, dostanî ye.’
**(Sadiyê Şîrazî)**

* ‘Tu dibe çi bibe, lêbelê ewilî mamostetiyê li nefsa xwe bike û bibe şagirtê wujdanê xwe.’
**(Platon)**

* ‘Perwerdehî, ne fêrkirin û nîşandana rastiya ye. Ji bo fikirînê, hevotina aqil e.’
**(Albert Einstein)**

‘Zanîniyeke misoger tune, belav nekin.’
**(Protagoras)**

**Çavkaniyên Giştî**

1- SEMÎNER 4. Pirtûka vekolanên perwerde, felsefe, civaknasî, psîkolojî û Antropolojiyê. Weşanên Z. Egeyê. Çapxana Şefeq Îzmîr.
2- Budîzm û Felsefe: Rahul Sankrityayan. Weger: Sibel Ozbudun. Weşanên Veguhêrîna Civakî. 1988 Stenbol.
3- Semîner 2/3. Pirtûka vekolanên felsefe, perwerde, psîkolojî, civaknasî û Antropolojiyê. Weşanên Zaningeha Egeyê. Berfenbar 1983- Çileyapaşîn 1984. Çapxaneya Tîcaretê/Îzmîr.
4- Silk, J. Kurtedîroka Gerdûnê. Weşanên TUBİTAK 1997.
5- Kaufmann, W. J. Peresana Gerdûnê û Çêbûna Stêrkan. Weşanên Arkadaş. 1979.
6- Hoagland, M.B., Kokên Jiyanê. Weşanên TUBİTAK. 2003.
7- Kovara Zanist û Pêşeroj. Hejmar: 50 Sal: 2008.
8- Alex Calinias. Ji Postmodernîzmê Re Na.
9- Nietzsche. Daxwaza Hêzê.
10- Felsefeya Postmodern. weş. Zanist û Hunerê.
11- Raman, Pîrozî Û Ol. Gotar. Ali Gurdilî. Netkurd.com
12- Louis Massignon. Yên vedig: Prof. Dr. Niyazi Öktem.
13- Dar- ı Mansur: Rûpel 09- 12 Weşanên Ant.
14- Erdoğan Aydın- Kovara Dersim. Sal 3. hejmar 3.
15- Yaşar Nuri Ozturk. Hallacê Mansûr û berhema wî: Şehîdê eşq û heqê.Weşanên Yeni Boyut. Çapa çaremîn. Stenbol 1997
16- İsmet Zeki Eyuboglu. Elewîtî- Sûnnîtî û ramana Îslamê.
Weşanên Der- 1989

17- Erdoğan Aydın. Peywendiya Elewîtî û Îslamiyetê. Kovara Dersim. Hejmar 5 Sal 3.
18- Mukrimin Halil Yinanç. Yên vediguhêzîne: Turgut Akpınar: Di dîroka Tirkan de Îslamiyet. Weşanên iletişim. No: 218
19- Dengê felsefeyê. Ali Gurdilî. Weşanên Dozê. 2006.
20- Încîl. (Mizgînî) Kitabı Mukaddes Şirketi- Adar 1998. Kurmanji dialect. 21- Rêwîtiyeke Zanistî. Ali Gurdilî. Weş. Doz. Sala 1997 an.
22- Destpêka Felsefeyê. John Herman & Justus Buchler. Çapxaneya. Zaningeha Egeyê. Sala 1982 an. NO: 1
23- Şerîet û Jin. İlhan Arsel. Weşanên Tumda. Sala 1990 an.
24- Dîrok Ji Sumeriyan Dest Pê Dike. S.N. Kramer. Weş. Saziya Dîroka Tirkan. Çapa sêyemîn. Sala 1998 an.
25- Semîner. Hejmar 4. Weş. Zaningeha EGEYÊ. Sala 1985 an.
26- Destana Gilgamêş. Danny P. Jackson. Weş. Arkadaş. Sala 1997 an.
27- Şaristaniya Antik Yewnanî. Andre Bonnard. Weş. Evrensel.
28- Civak û Perwerdehî. Prof. Dr. Ercan Tatlidil.
Zaningeha Egeyê. No: 71
29- Semîner. Hejmar 1. Sala 1982 an. Weş. Zaningeha Egeyê.
30- Kovara Sosyolojiyê. H. 1. 1987. Weş. Zaningeha Egeyê.
31- Dilêrîna G. Civakî. Anty B. Smith. 1988. Weş. Z. Egeyê.
32- Semîner. Hejmar 5. Sala 1987 an. Weş. Zaningeha Egeyê.
33- Semîner. Hejmar 2/3. Sala 1984 an. Weş. Zaningeha Egeyê.
34- Erdoğan Çinar. Hezar salên Wenda Yên Elewîtiyê.
Weşanên Çiviyazilari.
35- Dewlet. Eflatun. Weş. Akvaryum. Sala 2007 an.
36- Sîstemên Siyasî Yên Hemdem. Gencay Şaylan. TODAİE.
37- Domanên Ramana Sosyolojîk.Prof. Dr. Raymond Aron. Weş. İş Bank. 38- Arîstoteles. Polîtîka. Mete Tunçay. Weş. Pirt. Remzî.
39- Semîner. Hejmara 1 ê ya sala 1982 an. Weş. Zaningeha Egeyê.
40- Semîner. Hejmara 5 an ya sala 1987 an. Weş. Zaningeha Egeyê.
41- Semîner. Hejmara 4 an ya sala 1985 an. Weş. Zaningeha Egeyê.
42- Şerxa Varîdatê. S. Muhammed Nur. Sala 1994 an. Stenbol.
43- Dîroka Filehtiya Rojhilatê. Weş. Dozê. Aziz S. Atiya. Sala 2005 an.
44- Zayîna Felsefeya Zanistî. Hans Reichenbach. Weş. Pirt. Remzi.
45- Dîroka Felsefeyê. Prof. Macit Gökberk. Weş. Pirt. Remzi. 1985.
46- Ferhenga Ekonomiyê. Orhan Hançerlioğlu. Weş. Pirt. Remzi.
47- Çand û Mirov. Bozkurt Guvenç. Weş. Pirt. Remzi. Sala 1979 an.

48- Kovara Dersim. Sal 3. Sala 2004 an. Hejmar 5.
49- Kovara Dersim. Sal 3. Sala 2oo4 an.Hejmar 4.
50- Kovara Tîrojê. Sal 4. Hejmar 24. Xweza û Dîn. Ali Gurdilî.
51- Erol Sever. Êzdayetî û Çavkaniyên Êzdayetiyê. Weş. Berfin.
52- Dîroka Ramana Sosyolojîk. Prof. Dr. Ulgen Oskay. Weş. Z. Egeyê.
53- Ferhenga Mîtolojiyê. Azra Erhat. Çap. Remzî. Sala 2006.
54- Destpêka Sosyolojiyê. Prof. Dr. Onal Sayın. Weş. Zaningeha Egeyê.
55- Sosyolojî. Ozge Koroglu. Weş. Serhat. Sala 2009 an.
56- Mantık. Weş. Fil. Gulşen Oz. Sala 2008 an.
57- http://www.felsefevan.org/
58- http://www.rewanbej.com/
59- Kovara Nûdemê. Hejmar 01-20
60- Ferhenga Zanıstên Civakî / Dictionary Of Social Science.
Doç. Dr. Abdullah Kiran. Weşanên Nûbihar. Sala 2014 an.
61- Dîroka Felsefeyê. Ahmet Cevizcî. Weşanên Say. Stenbol. 2009.
62- Bi Riya 32 Jêgirtinan Dîroka Felsefeyê. Mathias Leboeuf.
Werger: Alev Er. Weşanên NTV
63- Dîroka Felsefeyê. Cild 2. Afirandina Cîhana Modern. Jacqueline Russ, François Ribes, Alain de Libera, Denis Kambouchner, France Farago, Anne Cheng, François Chenet, Claude Cals, Anne Baudart. Îlona sala 2013 an. Weş. Îletîşîm.
64- Dîroka Felsefeyê. Cild 1. Ramanên Damezraner. Weş. Îletîşîm. 2012. Jacqueline Russ, François Jullien, Christian Jambet, Pierre Hadot, France Farago, Jean-Paul Dumont, François Chenet, Anne Baudart.
65- Dîroka Felsefeyê. Nils Gilje/Gunnar Skirbekk. Weş. Kesît. Sala 2011.
66- Felsefeya Serdema 2o an. Christian Delacampagne. Weş. Îşbank.
67- Copleston. Nihîlîzm û Materyalîzm. Weş. Îdea. Çapa duyem.
68- Frederick Copleston. Feydexwazî û Pragmatîzm.
Felsefeya Modern. Weşanên îDEA. Çapa duyem.
69- Copleston. Ronîbûn. Weş. Îdea. Çapa sêyemîn.
70- Dîroka Ramanan. Peter Watson. Weş. YKY.
71- Dîroka Ramanê Ya SERDEMA Pêşîn. Faruk Yilmaz. Weş. Berikan.
72- Felsefeya Antîk. Weş. Dost. Jean Paul Dumont.
73- Rasyonalîzm. John Cottingham. 2013. Weş. Doruk.
74- Destpêka Felsefeyê. Ali İhsan Candoğan. Weş. Dem.
75- Nîqaşên Felsefî. Kovar. Hejmar 40. Weş. <Zaningeha Bogaziçiyê>
76- Dîroka Felsefeya Ronîbûnê. Ahmet Cevizcî. 2008. Weş. Asa.

77- Dîroka Felsefeya Serdema Navîn. Ahmet Cevizcî. 1999. Weş. Asa.
78- Di Serdema Navîn de Felsefe. B. Çotukkesen / S. Babur. Kabalci.
79- Dîroka Felsefeya Serdema Pêşîn. Ahmet Arslan. Weş. Z. Bilgiyê.
80- Dîroka Felsefeya Grek. Eduard Zeller. Weş. Say.
81- Gorgîas. Platon. Weş. Say. Sala 2011 an.
82- Dîroka Felsefeya Serdema Navîn. Alain de Libera. Werger: Işık Ergüden. Weşanên Dost. Sala 2013 an.
83- Felsefeya Serdema Pêşîn Çi ye? / Pierre Hadot. Werger: Muna Cedden. Weşanên Dost. Sala 2011 an.
84- Wittgenstein û Sînorên Ziman. Weşanên <Dogu-Batı> Sala 2009 an. Werger: Murat Erşen.
85- Ji Bo Jiyanê Felsefe. Pierre Hadot. Werger: Kagan Kahveci. Pinhan.
86- 50 Fikrên Felsefî Yên Ku Divê Werin Zanîn. Weş. Domingo. 2014
87- Rexneya Ramana Postmodern. Stuart Sim. Werger: Ali Utku | Mukadder Erkan. Weşanên Ebabil.
88- Dîroka Felsefeya Rojava 1. W. T. Jones. Werger: Hakkı Hunler. Weşanên Paradîgma. Ramana Klasîk. Sala 2006 an.
89- Dîroka Felsefeya Rojava 2. W. T. Jones. Werger: Hakkı Hunler. Weşanên Paradîgma. Ramana Serdema Navîn. Sala 2006 an.
90- Kovara Nûdemê. Hejmarên 01 - 20. Weşanên Nûdem.
91- Dîroka Felsefeya 17 an. Ahmet Cevizcî. Sala 2013. Weşanên Say.
92- Destpêka Felsefeyê. Ahmet Cevizcî. Weş. Sentez. Sala 2007 an.
93- Felsefeya Exlaqê. Etîk. Ahmet Cevizcî. Weş. Say. Sala 2014 an.
94- Felsefeya Perwerdehiyê. Ahmet Cevizcî. Sala 2011. Weşanên Say.
95- Platon. Ahmet Cevizcî. Sala 2014. Weşanên Say.
96- Kovara Felsefevan. Hejmar 01-02-03. sala 2015an.
97- Destpêka Felsefeyê. Alî Gurdilî. Weşanên Soran. 2015
98- Antolojiya Feylesofan. Alî Gurdilî. Weşanên Soran. 2015